**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ**
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**

# Binyata "Struktûra"bûyerê di Romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî de

**NAWSHIRWAN TAWFEEQ RAOF**

**14950001069**

**ŞÊWIRMEND**

**ALK.DOÇ. Dr. NESÎM SONMEZ**

**WAN- 2016**

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ**
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Yüksek Lisans Tezi**

# Bextiyar Elî'nin Êvara Perwaneyê Romanın da Olayın Kaynağı

**NAWSHIRWAN TAWFEEQ RAOF**

**14950001069**

**Danışman**

**Yrd.Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**VAN 2016**

**ETÍK BEYAN SAYFASI**

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında ( Binyata “Struktûra” bûyerê di Romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî de ) :

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevsinde elde ettiğimi.

- Tüm bilgi belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygum olarak sunduğumumu.

- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi.

- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı.

- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak hayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

**Nawshirwan Tawfeeq Raof**

**VAN - 2016**

## Naverok

Naverok……………………………………………………………………......I
Pêşîgotin ……………………………………………………………..… V
Kurte ……………………………………………………………………………………VI
Özet ……………………………………………………………..…VII
Abstract …………………………………………………………………………………… VIII

## Beşa yekê

Birrê Yekem: …………………………………………………….……..1
1.1 Têgeh û tarîfeke kurt a romanê ……………………………......…….5
1.2 Romana Bildungs (Bildungsroman) ……………………………….....5
1.3 Romana Civakî ……………………………………....……………..5
1.4 Romana Dîrokî ……………………………………………………5
1.5 Romana Navçeyî ………………………………………………5
1.6 Bûyer ……………………………………….…………………......6
1.6.1 Têgeh û Tarîfa Bûyerê ………………………….………..…..…6
1.6.2 Girîngiya Bûyerê …………………………………….………11
1.7 Birrê Duyem: …………………………………………….………..13
1.7.1 Nasandina Têgeha Pêşketinê…………………………….………13
1.7.2 Cureyên Pêşketina Bûyerê …………………………...…………18
1.8. Birrê Sêyem: …………………………………..……….…...…21
1.8.1 Hunera bûyerê di binyata teksta romanê de ……………………....21
1.8.2Bûyer di navbera teksta romanê û teksta dîrokê de ...........................29
1.8.3 Bûyer û Romana Dîrokî ..........................................................33

هەواڵنامەی کتێب

## Beşa Duduyan

2. Pêwendiya bûyerê bi regezên din (cih, dem û kesayetiyê) re ......................39

2.1 Yekem: Cih/Mekan ....................................................................... 39

2.1.1 Bajar .....................................................................................41

2.1.2 Daristan ................................................................................43

2.1.3 Kurdistan ...............................................................................45

2.1.4 Mala metê: ..............................................................................47

2.1.5 Dibistana xwîşkên tobekar .......................................................48

2.1.6 Ew gundê ku Perwane û Mîdyaya Xemgîn tê dehatin kuştin .................49

2.2 Duyem: Dem ...............................................................................50

2.2.1Têgeh û Tarîfa Demê ......................................................................50

2.3 Sêyem: Kesayetî / Karakter .........................................................54

2.3.1 Karakterên sereke ........................................................................56

2.3.2 Karakterên nesereke .....................................................................56

2.3.3 Xendana Biçûçik ..........................................................................56

2.3.4 Perwane ....................................................................................58

2.3.5 Nesredînê Bêhnxweş ......................................................................60

2.3.6 Govendê Peykersaz .......................................................................61

2.3.7 Ferîdunê Melek ...........................................................................62

2.3.8 Mesûm ......................................................................................62

2.3.9 Mîdyaya Xemgîn ..........................................................................63

## Beşa Sisêyan

3. Têgeha Binyatê ...........................................................................65

3.1 Binyata Şûnketin ...........................................................................68

3.2 Binyata Têhelkêş (Têkilîkirin) .........................................................70

هەولێرنامەی کتێب

3.3 Binyata Hevseng ..........................................................................................74

3.4 Binyata Bazineyî ..........................................................................................76

Destpêkek derbarê fezaya giştî ya romanê ..........................................................87

Nasandineke kurt a jiyana edebî ya Bextiyar Elî ..................................................88

Berhemên Bextiyar Elî ..........................................................................................89

Berhemên Şîrê ........................................................................................................89

Roman ......................................................................................................................89

Berhemên Hizrî ........................................................................................................89

Encam ......................................................................................................................90

Çavkanî ....................................................................................................................92

کتێبی هەولێرنامە

## Pêşgotin

Di serdema niha de yek ji wan babetên ku cihê girîngîdaneke mezin a lêkolînvan û rexnegirên edebiyatê ye, lêkolîn û vekolîna li ser janra romanê ye, tevî berfirehbûna vê janrê di warê vehewandina aliyên fikrî û hunerî de, bi awayekî ku romana nû dikare taybetmendiyên hemû janrên din lixwe bigire.

Hokara hilbijartina lêkolîna me girêdayî girîngiya vê babetê di edebiyata kurdî de ye. Çimkî roman di edebiyata me de tevî nûbûna wê li gor janrên din, gihîştiye astekê ku li gor siruşta edebiyata kurdî temamiya binema û taybetmendiyên wê tê de tên dîtin.

Lê kesên ku şiyana xwe terxan kirine ji bo lêkolînkirin û vekolandina alî û regezên vê janrê, ji çend hewldanan derbas nakin. Bi taybetî karkirina li ser "regeza bûyerê di romana kurdî de."

Bûyer wek tuxmekî pêkhêner di binyata romanê de girîngî û taybetmendiya xwe heye. Çimkî roleke mezin dilîze di dirustkirina hevrikî û çawaniya darişţina kesayetiya karakteran de, tew wek beşekî ji pêkhateya tekstê, bi wê rola radibe ku em çawa bikarin romanekê di aliyê binyatê de ji romaneke din cuda bikin. Herwiha têkiliya bûyerê bi hemû tuxmên sereke yên romanê re heye, wek (karakter, cih û demê.)Ev tuxm jî di nav romanekê de bi hev re kar dikin û ji hev nayên cudakirin. Ji ber vê yekê me ev lêkolîna xwe terxan kiriye ji bo şîrovekirin û nîşandana binyata hunerî ya bûyerê di romana (Êvara Perwaneyê) ya romannivîsê Kurd (Bextiyar Elî) de ku babet û mijara sereke ya lêkolîna me ye.

Diyarkirina berhemeke nûser û romannivîs (Bextiyar Elî) ku romana (Êvara Perwaneyê) ye, girêdayî wê yekê ye ku ev nûser navekî pir diyar e di dinyaya nivîsandina romana kurdî de, ku niha li Bakurê Kurdistanê û temamiya Kurdistanê berhemên vî romannivîsî hatine wergerandin ji bo zaravayên zimanê kurdî yên her çar parçeyên Kurdistanê. Herwiha berhema (Êvara Perwaneyê) ji bo çend zimanên cîhanî jî hatiye wergerandin.

Tevî ku ev lêkolîna me ne yekem lêkolîn e derbarê binyata bûyerê di romana kurdî de, lê lêkolînên beriya ya me tenê wek regezeke pêkhênera roman û çîrokê li ser bûyerê kar kirine. Lê bi baweriya me, bûyer ne tenê regezeke romanê ye, lê em dikarin bêjin roman û bûyer weke hev girîng in.Yanî hemû regezên din yên romanê bi rêya bûyerê tên avakirin û binyatkirin û nîşandan.

Cudahiya lêkolîna me ji lêkolînên beriya me, ew e ku lêkolîneke serbixwe ye derbarê binyata bûyerê, û praktîzekirina wê di romaneke Bextiyar Elî de jî, girêdayî wê yekê ye ku em bikarin bi kûrî û hûrbînî derbasî mijara xwe bibin. Çimkî eger me hemû roman werbigirtana, dê sînorê lêkolîna me pir berfireh bibûya û wê çaxê jî em ê neçar bibûna bi awayekî lezgîn û ne hûrbîn li ser mijaran bisekinin.

Bi armanca avakirina heykelê lêkolîna xwe li ser bingeheke zanistî, me pişta xwe girêda bi praktîzekirina wê dabeşkirina zanistî ku (Formalîstên Rûs – Rêbaza Formalîzmê) derbarê regeza bûyerê di romanê de kirine.Yanî karê me dîtin û

destnîşankirina cureya wan neseqan e (tevn) ku bûyerên romanên kurdî li ser wan tên binyatkirin. Lê tenê me rêyeke pesinker neda ber xwe, lê me rêbazeke şîrovekarî û heta hedekî rexnegir meşand û di dawî de jî me behsa wan rolan kir ku binyatên cuda yên bûyeran di berhemanîna rabêja tekstan de bi wan radibin.

**Kurte**

Lêkolîn ji sê beşên sereke pêk tê: Beşekî teorîk û du beşên praktîk. Beşê yekem ku beşekî teorîk e, me ew terxan kir ji bo zelalkirin û berçavkirina tarîf û bîr û baweriyên herî diyar yên lêkolînvan û rexnegiran derbarê regeza bûyerê. Me ev beş li ser sê tewer an birran dabeş kir.

Di birrê yekem de ku birrekî teorîk e, me bi kurtî têgeh û tarîf û nasandineke kurt a romanê berçav kir. Herwiha me tarîfên herî diyar ên regeza bûyerê di tekstên vegotinbend de nîşan da. Herwiha me girîngiya bûyerê anî zimên.Di birrê duyem de, me nasandina têgeh û zaraweyên pêşketin û cureyên zaraweya pêşketina bûyerê berçav kirin. Di birrê sêyem de jî, me behsa hunera bûyerê di binyata teksta romanê de û herwiha me bi berfirehî behsa bûyerê di navbera teksta romanê û teksta dîrokê de kir.

Beşê duyem ku beşekî praktîkî ye, me behsa têkiliya bûyerê bi regezên din re kir wek (cih, dem û karakteran.)Li gor pêwistiyê û bi awayekî zanistî jî, me mînakên praktîkî ji romana Êvara Perwaneyê rêz kirine.

Di beşê sêyem de ku ew jî wek beşê duyem beşekî praktîkî ye, heta radeyekê navnîşana lêkolînê hilgirtiye û tê de binyatên herî girîng ên bûyerê hatine destnîşankirin ku çar binyat in (bazineyî, şûnketin, têkilîhev –têhelkêş- û hevseng), dûre ev binyat hemû di romanê de wek mînak hatine destnîşankirin.

**Girîngiya Lêkolînê**

Hokarê sereke girêdayî wê yekê ye ku janra bûyerê di romanê de hemû janrên din ên romanê di xwe de kom dike. Ne mumkin e bêyî hebûna bûyerê roman bê avakirin û binyatkirin.

Herwiha hokareke din ji ber diyariya navê nûser û romannivîs (Bextiyar Elî) di dinyaya niha ya nûsîna romana kurdî de, çimkî heta radeyekê zehmet e behsa romana kurdî bê kirin bêyî anîna navê vî romannivîsî yan berhemeke wî.

Herwiha aliyekî dî yê girîng ê vê babetê girêdayî girîngî û navdariya vê romanê ye. Ev romana kurdî ji bo çend zimanên cîhanî hatiye wergerandin, wek (ingilîzî, almanî, erebî, farsî, fransî..hwd.) Bi baweriya me, me xwest em lêkolîneke bi vî rengî li Bakur pêk bînin.

Weşanxaneya Avesta romana “Êvara Perwaneyê” wergerand zaravaya Kurmanciya Jorîn ku beriya wergerandina “Êvara Perwaneyê” kêm kesan li Bakur û Tirkiyê Bextiyar Elî nas dikirin, ji ber sedemên ziman û zarava.

Piştî wergerandina Êvara Perwaneyê guhdaneke pir mezin pê hat kirin. Li gor şert û merc û rewşa zimanê kurdî li Bakur û Tirkiyê hejmareke baş jê hat firotin. Herwiha romana (Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir) duyem roman

û (Qesra Balindeyên Xemgîn) sêyem romana Bextiyar Elî bû ku ji bo zaravaya Kurmancî hatin wergerandin.Herwiha weşanxaneya “Dogan Kitap”ê mafê wergerandina “Êvara Perwaneyê” ji bo tirkî ji weşanxaneya Avesta wergirt û tê çaverêkirin di sala bê de bi zimanê tirkî derkeve. Herwiha vê dawiyê romana “Hinara Dawî ya Dinyayê” ya (Bextiyar Elî) ji bo zimanê almanî hat wergerandin û niha di pirtûkxaneyên wî welatî de tê firotin.

Nebûna jêder û çavkaniyên pêwist bi zaravaya Kurmancî û çavkaniyên internêtê yên pêwist li ser vê mijarê heta radeyekê bû astengî li pêşiya karê me.Bi hebûna van jêder û çavkaniyan dê lêkolîna me dewlemendtir bibûya.

هەواڵنامەی کتێب

**Nawshirwan Tawfeeq Raof**

**VAN - 2016**

**Nawshirwantofiq1@gmail.com**

# Özet

Bu çalışma bir kuramsal iki pratik olmak üzere üç ana başlıktan oluşmaktadır:Kuramsal bir bölüm olan ilk bölümde olayla ile ilgili tanımlar;araştırmacı ve eleştirmenlerin başlıca görüşlerine yer verildi.Bu bölümü de üç alt başlık altında değerlendirdik.Kuramsal bir bölüm olan ilk alt bölümde roman ile ilgili terim,tanım ve kısa bir tanıtıma yer verildi.Ayrıca olay hakkındaki başlıca tanımlara açıklayıcı metinlerde yer verildi ve olayın önemi vurgulandı.

İkinci alt bölümde olaylar ile ilgili kavramlar ve bu türün gelişimini değerlendirdik.En son üçüncü alt bölümde romandaki edebi olayların önemini vurguladık ve ayrıca romandaki olay ile tarihsel metindeki olay arasındaki olay çeşidi üzerinde duruldu.

Pratiksel bir bölüm olan ikinci bölümde olay ile yer,zaman ve karakter gibi öğelerin ilişkisi üzerinde duruldu.

Üçüncü bölümde çalışmanın çerçevesi ele alınmış ve olayın en önemli dört unsuru (çerçeve,takipçi,asimilasyon,denge) belirtilmiş ki romanda bu dört unsur örneklerle verilmiş.

**Abstract**

First of all, the novel as a genre is one of the most significant subjects that researchers and literary critics are focused on. Further, genres of novels also include literary and critical thinking aspects. It can be stated all the other genres in literary works can be seen in novels in this era. Also, one of the main reasons to conduct this study is to have the more concern of this subject in Kurdish literature. More importantly, novel in Kurdish literature can be seen as a new literary work to the other genres but according to the nature of Kurdish literature, all basic rules can be found in it properly. However, it can be mentioned those who have the ability to work on and study in this genre are not quite enough especially study in "genre of events in Kurdish novels".

Moreover, it can be seen event as one of the most important components in written novels and it has a great role to shape and form the personality of the characters and making the struggles in the novels properly, even though, in written texts, event has a significant role to make a differentiation amongst the novels. On the other hand, event can have related to the other components of novels such as (character, time, place), those components can be included in a novel and cannot be separated. Furthermore, this study is conducted to analyze and show the literary events of the novel (Parwan's Evening) by Kurdish novelist Bakhtyar Ali.

This novel (Parwan's Evening) is one of the most popular novels by the well-known Kurdish novelist Bakhtyar Ali and nowadays he is a famous writer and novelist amongst the Kurdish novelists and writers. Further, his novels and other literary texts have been translated into different Kurdish dialects and published from the other four Kurdish parts especially in the north of Kurdistan. This novel (Parwan's Evening) has been translated into many international languages as well.

However, some other studies have been conducted about making events in Kurdish novels. The other studies have just concerned about events as one of the components of novels and stories but this study has found that novel is an event and it can be stated that all the other components can be found by making a series of events in a novel. Also, the difference between this study and the others is that this study is an independent topic about making events and practicing in Bakhtyar Ali's only novel in order to work on deeply and precisely. If this study has taken all the others novels of the author, it will not be a proper study and it will be time-consuming.

This study has been conducted scientifically based on practicing the Russian formalists' division for the components of events in novel. Moreover, the purpose of this study is to find out the forms of the events the Kurdish novels are based on. In this study, a critical and analyses rules have been carried out and finally the roles of making different events have been used in written texts.

This study consists of three chapters, a theory and two practical chapters. The first chapter is theory and the definitions, researchers' and critics viewpoints about genre of events are clarified. Also, this chapter is divided into three sub-sections. Further, the definitions and clarifying the concept of novel with the importance of genre of events are explained in the first section. However, in the second section, the concept of events and the development of this genre are presented. Finally, in the third section, the importance of literary events in a novel is reported and also presenting the genre of events between a novel and history texts are focused on.

The second chapter is practical. In this chapter, the connections of genre of events with the other components such as (place, time and character) are presented. Lastly, some practical examples scientifically for the novel "Parwan's Evening", are presented.

The third chapter is also a practical chapter. In this chapter, the title of the study with the importance of the components of genre of events such as (circle, follower, assimilation and balance) are reported. Finally, the four above components are clearly presented in the novel.

To begin with, the genre of events is one of the most crucial components in written novel because it collects all the other genres together in written literary texts. It is impossible to write a novel without creating a series of events. It is worth mentioning that Bakhtyar Ali is the well-known novelist amongst the Kurdish novelists. it can be stated that one cannot talk about Kurdish novel without mentioning his name or his literary works. Another important point is the popularity of his novel "Parwan's Evening" and it has been translated into many international languages such as (English, German, Arabic, Persian and French). It is crucial to have this study in the north of Kurdistan. Avesta printing and publishing house has translated "Parwan's Evening" into Kirmanji dialect. Bakhtyar Ali was not a popular name in the North of Kurdistan because of the language and different dialects but after translating this novel into Kirmanji and publishing his literary texts his name would be famous in Turkey and in the North of Kurdistan and his novel was the bestseller book as well. His second novel "My Uncle Jamshid Khan: Whom the Wind Was Always Taking " and his third novel "Mansion of the Sad Birds" have also been translated into Kirmanji. Dogan book printing and publishing house has taken permission from Avesta printing and publishing house to translate Parwan's Evening into Turkish and it will be expected to publish next year. In recent months his novel "The Last Pomegranate of the World" has been translated into German and published in the libraries.

هەولاممی کتێب

# Beşê yekem

هەواڵنامەی کتێب

## 1. Birrê Yekem:

### 1.1 Têgeh û tarîfeke kurt a romanê

Roman diyardeyeke zindî ya cîhana îro ye û yek e ji wan janrên ku karîbû beşdariyeke aktîf di geşkirin û pêşxistina edebiyatê de bike. Herwiha yek ji wan hunerên bilind e ku heta serdema îro jî ne tenê giraniya xwe ji dest nedaye, lê bûye yek ji sîma û taybetiyên herî diyar ên miletan. Çimkî firehiya teksta romanê di derbirîna kêşe û pirsgirêkên civakî, siyasî, psîkolojîû aborî de bi awayekî ye ku tu janreke din a edebî wek helbest û çîrokê nikarin bi vî rengî wan kêşe û pirsgirêkan derbibirin ku bi dirêjiya dîrokê civak ji ber wan dinalin. Ev jî vedigere rola romanê ku rasterast beşdariyê di berçavkirina wan kêşeyan de dike. Wek tekstekê jî rêyên hişyarî û agahî û vebûnê li ber pêşketin û geşbûnê vedike "Ev jî ne tercîhkirina romanê li ser janrên din ên edebiyatê ye. Berevajî wê, aktîfbûna wan janran vedigere romanê bi xwe û çawaniya wê yarîkirina karakterên romanê, ku dikare diyarde û karesatan derbibire û wan ber bi wan cihan jî bibe ku her takekesek dikare şûna piyê xwe di wan pêngavan de diyar bike ku dikare kevirekî deyne ser avahiyekê ku roman wek erk nîşan dide" [1]Lewra derbarê romanê hatiye gotin ku "Roman tûrikekî pifdayî ye, hertiştî li xwe digire" [2] Çimkî roman hemû diyarde û bûyerên curbicur di hembêza xwe de kom dike û behsa wan dike.

Em dikarin bêjin peyva romanê ji bo bêhtirî regezeke edebî hatiye bikaranîn û "Di sedsalên navîn de peyva Romanê di zimanê gelêrî de hevwateya peyva çîrokê bû" [3] Bingeha peyvê jî ji peyva Romance hatiye ku tê wateya berhemên çîrokvanî " [4] Lê belê eşkere ye ku peyva Romanc ji bo qonaxekê ji qonaxên edebiyatê dihat bikaranîn, ku dikeve beriya derketina romanê yan em zelaltir bêjin dikeve beriya derketina burjuaziyet û hizra takgeriyê. Dûre peyva romanê ji bo gelek berheman dihat bikaranîn ku bi temamî li dijî Romance bûn ku wek hevwateya "edebiyata romantîk dihat danîn." [5] Vê yekê jî wiha li (Diderot) kir di sala (1761) de bêje: "Ez dixwazim em navekî nû ji bo berhemanîna Richardson bibînin."[6]Li gor wî, berhemên (Richardson) nûnertiya karên baş kirine ûji bûyerên efsaneyî û derasayî dûr bûn. Ji bo janra romanê "Alman Roman û fransî Roman û îtalî jî Romanco bikar tînin."

---

1. Şukir Silêman Hemed, Qehreman di Romana Niha ya Kurdî de, Kovara Karwan, Hejmar (172), Nîsana 2003, r. 22.
2. Elî Lefte Seîd, Binemayên Pêkhateyên Romanê di navbera Nûgerî û Çavlêkirinê de, W: Mihemed Kesas, Kovara Raman, xula duyem, Hejmar (99), Tebaxa 2005, r. 124.
3. L.M,Abbeci. Vincent, Teoriya Cureyên Edebî, W: Dr. Hesnun, Dezgeha el Mearif – Iskenderiye – 1978, r. 11
4. F.F.Kuzînuf, Roman Dastana Serdema Nû, Dezgeha Nû ya Kitêbê, Çapa Yekem, Libnan, 2006, r. 37.
5. F.F.Kuzînuf, Roman Dastana Serdema Nû, r. 95.

6. Haskell Block – Herman Salinger, Dîtina Afirîner, W: Esed Helîm, Pirtûkxaneya Misrê, Misr 1966, r. 115.

[7]Ingilîz jî peyva Novel jibo romanê bikar tînin [8] "ev peyv jî bi zimanê ingilîzî tê wateya tiştekî nû."[9]

Boccaccio di "navnîşana duyem a çîroka xwe de bikar aniye" [10] Herwiha "Ingilîz û amerîkiyan peyva (Fiction) jî ji bo romanê bikar tînin" [11] ku tê wateya wehm, sawêran. Heman têgeh "bi wateya edebiyata ewhaman an xeyalan ji sedsala 18an ve heta navîna sedsala piştre li Ewropayê dihate bikaranîn." [12] Wek eşkere ye jî roman wek janreke edebî ya nû pêwendiyeke wê ya berçav bi xeyalê re heye û kêm roman hene ku xeyal di wan de nebe eger bi temamî romanên realîst bin jî.

Destpêka derketina romanê ji romana serkêşî pêk dihat, di sedsala 17an de derket ku romana (Pamela) ya nivîskarê ingilîz(Samuel Richardson) bû. [13] Roman dema derket holê, destpêkeke nû ya vegotin û rizgarbûnê bû, ji wan kevneşopiyên berfireh ên vegotinê ku xwe di qalibê dastan û hîkayetan de didîtin ku pirsgirêk, bûyer, xewn û xeyalên wê çaxê yên mirov nîşan nedidan û vecûtî bûn. Lewma roman bi derketina xwe re weke birûskê belav bû û bi germî hate pêşwazîkirin, çimkî roman weke teksteke vekirî hertim ji nûbûn û berfirehbûnê re amade ye.Ji wê çaxê û heta niha roman di pêşketinê de ye û bi hatina serdema niha ya teknolojiyayê re, girîngiya wê roj bi roj zêdetir dibe.Romanê niha amûrên gihandin û hunera sînema û şano û montajê û…hwd hemû kirine keresteyek ango malzemeyek ji malzemeyên pêkhateya xwe.Hinek caran roman bûye nasname û nîşandera rewşa sivîl û şaristanî ya miletan. Eger em bi hûrbînî berê xwe bidin Xelata Nobelê ya Edebiyatê ku her sal tê dayîn ji bo nivîskar û helbestvanan li hember temamiya berhemên wan ên edebî, li gor lîsta ku li ber dest e, di navbera salên (1901-1993) [14], ji tevahiya dabeşkirina (87) xelatan, (42) xelat gihîştine romannivîsan û tenê (42) xelat gihîştine helbestvanan. Ev girîngiya romanê di serdema me ya niha de nîşan dide.[15]

Bi rastî tarîfkirina romanê karekî pir zehmet û dijwar e, çimkî cudakirina sînorên romanê ji janrên din ên edebiyat û hunerê ewqasî dijwar e ku, cudakirina

---

7. R.M.Alberes, Dîroka Romana Nû, W: Coric Salim, Weşanên Behr Miteweset, Beyrût – Parîs, Çapa Duyem, 1982, r. 28.
8. Newzad Ehmed Eswed, Ferhenga Zaravayên Edebî û Rexneyî, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapa Yekem, 2011, r. 226.
9. Siyamend Hadî, Dîroka Derketina Romanê, Bê dezgeha çapê, Weşanxaneya Tîşk, Silêmanî, 2004, r. 69.
10. Edward Blishen, Roman û Pîşeya Nivîsandina Romanê, Ji erebî: Ejî Goran, Dezgeha Rewşenbîrî û Belavkirina Kurdî, Bexda, 1982, r. 9.
11. Rolan Bernof, Cîhana Romanê, W: Nîhad el Turkî, Çapa Duyem, Weşanxaneya Karûbarên Çandî ya Giştî, Iraq – Bexda, Çapa Yekem, 1991, r. 5.
12. Adil Mecîd Germiyanî, Realîzm di Romana Kurdî ya Hevçax de li Iraqê, Nameya Masterê, Koleja Perwerdê – Îbin Ruşd, Zanîngeha Bexdayê, 1996, r. 11.
13. Newzad Ehmed Eswed, Ferhenga Zaravayên Edebî û Rexneyî, r. 227.
14. Bakiz B. Trawpik, Dîroka Edebiyata Cîhanî, W: Heme Kerîm Arif, Çapxaneya Rojhelat – Hewlêr, Çapa Yekem, 2008, r. 391-392
15. Ebdulla Rehman, Binyata Vegotinê, Çend lêkolînên edebî derbarê çîrok û romana helbestvanî, Çapxaneya Mukiryanî, Hewlêr, 2014, r. 8.

romanê û danasîna wê bi çend xêzan heta radeyekê zehmet e. Çimkî roman wek teksteke vekirî û zindî hinavên xwe di nav gelek girêdanên marîfî, hizrî û estetîkde dibîne.Herdem huner û janrên din xwe bi dîtingeha romanê bêhtir û wêrektir bi xwîner didin naskirin, lewra sînorekî ku romanê destnîşan bike nîne.Wek H. G. Wells li ser romanê gotibû "Tûrikek e mirov dikare hertiştê ku pê qebûl e tê de bicih bike."[16] Lewra girêdana naveroka romanê bi hemû astên vegotinê û teknîkên dem, cih, bûyer, karakter, diyalog û monolog û…hwd, bi tarîfeke tenê ve, ne tenê ne kêrhatî ye, lê curek ji zulmê ye jî ku li romanê tê kirin, çimkî her yek ji van ast û teknîkan, tarîf û diyarkirin û sînorê xwe di qada romanê de heye. Lewra jî "Piraniya rexnegir û teorîsyenên edebiyatê amaje bi wê rastiyê kirine ku roman di warê teorî de, janreke ku xwe bi hêsanî radestî çarçoveya pênase ango tarîfeke destnîşankirî nake.Helbet vê xwe radest nekirinê di warê pratîkê de ji hemû curên şêwaz û pirdengiya binyatên hunerî û babetî yên tekstan çavkanî girtiye."[17]

Di nasîna romanê de babet cuda ne ji wan yasa û zagonên ku ji dastan û janrên din re hatine danîn û vê yekê hiştiye ku tarîfên zêde lixwe negirin li gor romanê. Eger tarîfên zêde ji bo wan hatibin kirin jî, tarîf zêde ji hev dûr naçin. Lê di romanê de, mijar bi temamî cuda ye.Ne tu qeyd û bendek heye û ne ji ber nivîsandina romanê li ser romannivîs tê ferzkirin ku divê wiha bike yan wiha binivîse.Em dikarin bêjin di nivîsandina romanê de azadiyeke berfireh heye.Vê azadiyê kiriye ku her nivîskarek di warê naverokû teşeyê de ji nivîskarên din cuda be. [18]

(MalcolmBradbury) dibêje: "Ev şêwaza nû bi nerît û kevneşopiyên kevin ên edebiyatê re di berberiyê de ye, yan bi kêmanî dixwaze wan bi şêweyeke binyatî (esasî) rast bike. Dibe ku ji ber vê jî be eger em bêjin têgeha romanê (Novel) tê wateya nû û taze, têgeheke kêrhatî ye." [19] Herwiha çimkî roman di guherînê de ye û pabendî tu yasayeke sabît nabe, di çarçoveya qalibekî tenê de jî nemaye, çimkî "Roman wek janreke edebî sîstemeke dirustkirî, hertim vekirî ye ji bo şîrovekirinê, em dikarin wê bişibînin deryayê, herçiqasî em kûrtir herin xwarê, em ewqasî zêdetir morîk û mercanên wê bidest dixin û sosretên wê dibînin."[20] Lewra eger em li her pênase û tarîfeke romanê binerin, em dibînin her yekî ji nerîngehekê mebestek ji mebestên wê yan armancek ji armancan an girêdanek ji girêdanên romanê xistine bin ronahiyê û şîrove kirine, alî û pêkhateyên vê hunera nû ya serdema xwe ron kirine, ango ronahî danîne ser beşekî ji beşên pêkhênerên wê. (Noam Chomsky) dibêje: "Bi

16. Edward Blishen, Roman û Pîşeya Nivîsandina Romanê, Ji erebî: Ejî Goran, Dezgeha Rewşenbîrî û Belavkirina Kurdî, Bexda, 1982, r. 9.
17. Fûad Reşîd, Hevpeyvîn, Kovara Raman, Hejmara (125) gera sêyem, Cotmeha 2007, r. 32.
18. Senger Qadir Mihemed Hacî, Binyata Vegotinê di Dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û romana (Şarî Mosîqare Spiyekan - Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de, Nameya Masterê, Koleja Selahedîn, Hewlêr 2009, r.25.
19. M. H. Abrams û yên din, Roman çi ye, W: Cewad Mistefa, Weşanxaneya Mukiryanî, Hewlêr, 2008, r. 89.
20. Ebdula Serac, Ber bi Istana Romanê û Nerîngehan, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, 2007, r.9.

rêya xwendina romanê em fêr dibin û ewqas zanyarî bi dest me dikevin derbarê kesayetiyan, çawa difikirin û….hestên wan dilivin û tevdigerin, ji wê yekê bêhtir ku derûnzanê siruştî me fêr dike."[21]

Roman ji vegotineke çîrokvanî ya dûrûdirêj pêk tê ku tê de çîrokbêjek wêneya jiyana karakteran di çend bûyer û di çend cih û demên berfireh de nîşan dide.Pir caran xeyal di dariştina bûyeran de bi rolekê radibe. Di romanê de çend regezên girîng kom dibin wek: Bûyer, kesayetî, cih, dem, çîrokbêj (yan vebêjer), vegotin, jê re vegotî, xeyal, wesf, diyalog û nerîngeh. Herwiha Ferhenga Oxfordê romanê bi vî awayî tarîf dike "Vegotineke pexşanê ya xeyalvanî yan çîrokeke ku dirêjiyeke wê ya destnîşankirî heye, tê de kesayetî û kirde tên bergewdekirin ku jiyana wan a rasteqîn a pêşîn an niha nîşan dide, di tevneke nîv himbiz de tê dariştin." [22] Di vê danasînê de, amaje bi regezên pêkhênerên romanê wek kesayetî, kirdar, bûyer û cih/mekan hatiye kirin. Herwiha John Hulburn behsa rola xeyalê di warê romannivîsiyê de dike û dibêje: "Divê roman me ji cîhana me rizgar bike û ber bi cîhaneke din rêya koçkirinê ji me re xweş bike." [23] (Hawthorn) di pêşgotina çîroka xwe (Xaniyek bi Heft Cemelonan), di sala (1851) de dibêje: "Bendewariya me ji wî qalibê bi navê romanêew e ku hûrgiliyên serpêhatiyan şîrove bike. Ango xwe tenê bi tiştên mumkin ve girê nede. Divê roman hewl bide komeke rêzkirî ya wan ezmûnan wêne bike ku pêkan e biqewimin an bi hêsanî bêne serê takekesan."[24]

Bi vî awayî, di van tarîfên ku me berçav kirin de, behsa gelek aliyên romanê wek janreke xwedî rûbereke berfireh hatiye kirin û roman ji gelek nerîngeh û aspektan ve hatiye lêkolînkirin. Diyar e ev yek ji xisletên herî zindî û sereke yên nemiriya romanê ye di nav dilê jiyanê de. Herçiqasî jiyan ber bi pêş ve here, pêwistiya wê bi roman û romannivîsan zêdetir dibe, çimkî roman xwe wek nûnereke rastgo ya jiyanê nîşan dide û heta jiyan berdewam be roman jî berdewam dibe.Ji ber vê yekê jî D.H.Lawrence payebilindî û heybeta romannivîs dişibîne pîroziya Papa û keşeyan.[25]Lewra roman janreke karvedan, guhertin û bêsînor a serdemê ye û çend tarîf û pênaseyên curbicur lixwe digire. Romannivîs (Ebdulla Serac) dibêje: "Em dikarin li gor romanên baş, romanê tarîf bikin." [26]

Em dikarin romanan dabeş (kategorîze) bikin. Herwiha pêkan e armancên romanan ên hunerî li gor cudahiyên wan ku di warê (babet) (Subject matter) û herwiha pêdagiriya wan li ser aliyekî ji berjewendiyên wan, bê dabeşkirin:

---

21. Jêderê Berê, r.10.
22. Jêderê Berê, r.10.
23. Adil Germiyanî, Çend Cudahiyên Navbera Romanê û Janrên din ên Edebiyatê de, Kovara Newşefeq, Hejmar (62), Mijdara 2008, r.12.

24.Adil Germiyanî, Çend Cudahiyên Navbera Romanê û Janrên din ên Edebiyatê de, Kovara Newşefeq, Hejmar (62), Mijdara 2008, r.13.
25. Ebdulla Serac, Ber bi Istana Roman û Nerîngehan, r.52.
26. Jêderê Berê, r.53.

### 1.2 Romana Bildungs (Bildungsroman)

Bildungs têgeheke almanî ye û tê wateya (geşbûnê) yan (perwerdeyî).Babeta (Subject) vê cureya romanê vedigere geşbûn û teşegirtina hizr û kesayetiya qehremanê çîrokê. Kesayetiya sereke ya vê cureya romanê serdema xwe tevî ezmûnên curbicur derbas dike û pir caran rastî qeyraneke ruhî tê, piştre digihe qonaxeke pêgihîştin û geşbûna zihnî û dûre nasname û reseniya kesayetiya xwe û rola xwe di cîhanê de fêm dike. Wek romana "Çiyayê Sihrî" ya "Thomas Mann" û "Şagirtiya Wilhelm Meister" a "Goethe."

### 1.3 Romana Civak

Ev cureya romanê tekeziyê li ser bandora kûr a rewşa civakî – aborî li ser kesayetî û bûyeran dike û bi gelemperî bi şêweya derbirînê ya rasterast an nerasterast şîretkariyê ji bo curekê ji reforma civakî dike. Wek romana "Daristan" a "Upton Sinclair" û "Wîşiyên Xezebê" ya "John Steinbeck."

### 1.4 Romana Dîrokî

Dem û cih û hinek kesayetî û bûyerên xwe ji dîrokê werdigire, lê ev nav bêhtir wê demê li romanekê tê kirin ku jîngeha civakî û bûyerên wê bêalî û bi hûrgilî û tevî hurdekariyên zêde hatibin nivîsandin û bi awayekî berfireh hatibin zelalkirin. Herwiha bûyer û jîngeha dîrokî ya romanê xwedî girîngiyeke sereke bin, mîna romana "Çîroka Du Bajaran" a "Charles Dickens."

### 1.5 Romana Navçeyî

Ev roman bêhtir tekeziyê li ser dem, cih, şêwaza axaftinê, edet û nerîtên navçeyeke taybet dike. Bêgumanev tekeziya li ser hûrgilî, dem û cihekî taybet, ne tenê berçavkirina realîteya çîrokê ye, lê wek hokareke girîng e ku bandorê li ser xislet û reftara kesayetiyan û cureya fikrîn, hest û karên wan dike.Wek navçeya "Wessex" di romanên "Thomas Hardy" de.[27]

Armanca nîşandana vê rêzbendiyê vedigere wê yekê ku nivîskar û romannivîs "Bextiyar Elî" di romaneke wek "Êvara Perwaneyê" de, hewl daye û ev cureyên romanê hemû di berhemeke wiha de civandine. Piştre di şîrovekirina romanê de di warê pratîkî de ev rêzbendî bi zelalî ji me re diyar dibe ku romannivîs bi şêweyeke hunerî ya bedew ew darîştine û di "Êvara Perwaneyê" de bi hev ve girêdane.

[27]. M. H. Abrams û yên din, Roman çi ye, W: Cewad Mistefa, Weşanxaneya Mukiryanî, Hewlêr, 2008, r. 2.

## 1.6Bûyer

### Pêşgotin

Da em bikarin pêkhateyên binyata romanekê fêm bikin, pêwist e em regezên romanê nas bikin. Ne şert e hemû xwînerên romanê van regezan nas bikin, lê ji bo lêkolîn û xwendina rexneyî ya her teksteke vegotinbend (ango teksteke ku vegotin tê de hebe) xala yekem e di lîsta şert û mercan de ji bo şîrove û gengeşekirina aliyên wan tekstan. "Bûyer" yek ji regezên herî girîng e ku teksta romanê li ser tê avakirin, lewra di şîrovekirina romanê ji aliyê rexnegir ve guhdan û girîngiyeke mezin bi bûyeran tê kirin. Çimkî em dikarin bi rêya bûyerên romanekê çawanî (mahiyeta) dîtin û nerîna romannivîs û helwestên wî li ser bûyeran û çawaniya girêdana wan bi wî re, nas bikin û binirxînin.

### Bûyer

### 1.6.1 Têgeh û Tarîfa Bûyerê

Behskirina bûyerê û nasandina wê di warê teorî û pratîkî de ne karekî hêsan e. Çimkî hevdem e bi behskirina çend aliyên din ên hevtêkelan girêdayî bûyerê ku, ew têkilî jî xwe bi awayekî rasterast di çarçoveyeke temamker de nîşan didin. Ew çarçoveya temamker jî tê wateya ku nebûna her regezekê ji wan regezan dibe sedema peydabûna kêmasiyekê di pêkhateya teksta romanê de. Lewra beriya hertiştî divê em bizanin bûyer çi ye û çawa ew pêwendî wê bi regezên din re girêdide.Em di jiyana xwe ya rojane de rastî bûyeran tên.Pêkan e em rastî bûyereke tenê yan çend bûyeran bên.Ango bûyer têkildarî jiyana mirov in û bi hev re kar dikin. Hinek caran bûyer bandorê li ser mirov dike û rêveçûna jiyana wî diguhere. "Şukrya Resûl" derbarê bûyerê dibêje ku bûyer ji: "wan rêza guhertinên ku tên ser rewşa kesayetiyan ûpêwendî û kartêkirina wan bi wan cihên ku tê de diçin û tên, pêk tê."[28] Tew hinek nivîskar danasîna çîrokê wek bûyerê hejmar dikin, çîroknivîs û romannivîs "Hisên Arif" dibêje: "Çîrok ji wê rêza bûyer û karesatan (ji hundir û derve ve) ku tên serê kesayetiyên çîrokê û derbas dibin u pêk tê." [29]

Bûyer yek ji regezên pêkhênerên romanê û proseya vegotinê ye û beşdariyê di rêjeya proseya vegotinê de dike, herwiha beşdariyê di destpêk û dawiya vê proseyê de dike.[30] Bûyer ji tevahiya wan rewş û diyardeyên ku di dem û cihekî de derdikevin holê pêk tê, yan "bûyer çend realîteyên rêkûpêk an belawela ne di çarçoveya demê de, bi şêweyeke diyarkirî taybetmendiyên xwe werdigirin." [31]Herwiha "Aristotle" di kitêba "Peotics" de derbarê bûyerê dibêje: "Bûyer kirdareke

---

28. Şukrya Resûl, Edebiyata Kurdî û Hunerên Edebiyatê, Çapxaneya Wezareta Xwendina Bilind, Çapa Yekem, Hewlêr, 1989, r. 151.

29. Hisên Arif, Çîroka Hunera Kurdî, Weşanxaneya el Huriye, Bexda, 1997, r.111.

30. David Pellauer, Hebûn, Dem û Vegotin (Fîlosofiya Paul Ricœur), W: Seîd el Xanimî, Navenda Çanda Erebî, Beyrût, Casablanca, 1999, r. 41.

31. Celal Enwer Seîd, Teknîka Vegotinê di Romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî de, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapxaneya Kemal, 2009, r.39.

ku destpêk, navend û dawiya wê heye." [32] Bi vî rengî bûyer di hevkêşe û pêkhateya tekstên vegotinbend de hem encam û hem jî hokar e. Ango bûyer encama çend helwest û rêveçûna kesekî yan çend kesan in, di dem û cihekî diyarkirî de û ji ber gihîştina armancekê yan redkirina wê yan her sedemeke din encam didin.

Ango pêwist e li pişt birêvebirina her bûyerekê karakterek amade be, da wêneya bi dû hev hatina bûyeran di çarçoveya wî cih û demê de derkeve. Bi vî rengî em dikarin pesinê zincîra hatina bûyeran kifş bikin. Lewra li gor vê nerînê em dikarin bêjin bûyer "Rêz an zincîrek rastiyên realîst in di warê organîk de bi hev ve pêwendîdar in û xwe bi rêya destpêk û dawiyê nîşan didin, herwekî li gor wê têgeha ku (RolandBarthes) jê re dariştiye: ji çend erkên kartêkirî ji aliyê hokarekê yan çend hokarên taybet ve pêk tê." [33]

Bi dirêjiya dîroka rexneya wêjeyî, ew lênerîn û lêkolînên ku di warê tekstên vegotinbend de, her ji efsane û dastan û çîrokên gelêrî yên heyamên berê ve heta digihe janrên nû yên çîrokê, bi form û naverok û cureyên wê yên nû û hemû cureyên romanê hatine berhemanîn, kok û hemfikr in li ser girîngî û pêwistiya hebûna (bûyerê), di wan tekstan de wek regezeke sereke û bi baweriya wan "bûyer movika piştê ya regezên hunerî yên din ên kesayetî, dem û cih e" [34] û "girîngtirîn regez e di binyata tekstên vegotinbend e." [35] Ango bûyer, çend (realîteyên) birêkûpêk an belawela ne di çarçoveya demê de, ev (realîte) jî dema li pey hev tên di çarçoveya demê de, bi awayekî diyarkirî, taybetmendiyên xwe werdigirin. [36]

Yekem kesê ku bi guhdan û girîngî bûyer lêkolîn kir û bîr û baweriyên xwe diyar kirin (Aristotle 384-322 b.z) e. Bîr û baweriyên rexneyî yên berî (Aristotle) hebûn, tenê çend bîr û baweriyên sade bûn an bi awayekî giştî piştgiriya wê teoriyê nekirine. Baweriyên (Plato) jî (ku wan ji Socrates re vedibêje) ne mumkin e bibin bingeh û binema, çimkî:

1. Trajedî red kiriye û wek berhemeke neheqîqî û ne exlaqî û dijî logos[37] û xapînok wesf kiriye "ji bilî sirûdên wê yên olî yên taybet bi pesindana xwedawendan." [38]

2. Nerînên wî ji nerîngeheke felsefî û li derveyî tekstan bûn û li gor binemayên felsefî bi huner û edebiyatê re tevgeriyaye."[39]

---

32. Aristotle, Hunera Şiîrê (Şiîrnasî), Wergerandina ji Ingilîzî û Pêşgotin: Ezîz Gerdî, Weşanxaneya Rênima, Çapxaneya Kemal, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r.33.
33. GeraldPrince, Têgeha Vegotinê (Ferhenga Têrman), W: Abid Xeznedar, Desteya Giştî ya Karûbarên Çapxaneyan, Qahîre, Çapa Yekem, 2005, r.33.
34. Amîne Yûsif, Teknîkên Vegotinê di Teorî û Pratîkê de, Weşanxaneya el Hîwar, Çapa Yekem, Sûriyê 1997, r. 27.
35. Ednan Xalid Ebdulah, El Neqd el Tetbîqî el Tehlîlî,Desteya Karûbarên Giştî, Çapa Yekem, Bexda, 1986, r. 82.
36. Ebdula Îbrahîm, Binyata Hunerî ya Romana Şer a Erebî li Iraqê, Weşanxaneya Karûbarên Çandî, Çapa Yekem, 1987, r.24.
37. GérardGenette, Derbasgehek bo Teksta Berfireh, W: Ebdilezîz Şibêl, Desteya Giştî ya Karûbarên Çapxaneyên Mîrî, Bexda, 1999, r.13.
38. Şukrî Ezîz el Madî, Derbarê Teoriya Edebiyatê, Weşanxaneya el Hedase, Libnan, Beyrût, 1985, r.38.

Aristotle di çarçoveya kitêba (Hunera Şiîrê) de, li tenişta çend alî û mijarên din ku li derveyî armanca me ne, bi hûrbînî behsa binyat û taybetmendiyên şiîra dramatîk û dastanî kiriye. Tê têbînîkirin ku ew giraniyeke berçav ji daxuyanî û şîroveyên xwe dide têgeha (bûyerê) ku berfirehtirîn rûbera lêkolînên wî dagîr dike. Aristotle dema regezên sereke yên trajediyayê destnîşan dike ku, xwe wek "çavlêkirina kirdareke cidî ya kemilî û xwedî dirêjiyeke diyarkirî" [40] tarîf dike, wan li ser regezan dabeş dike ku ji van pêk tên: "bûyer, kesayetî, dariştin, hizr, dîmen, stran, du ji wan amûrên pêşkêşkirina kirde ne û regezek jî ji şêwaza çavlêkirinê pêk tê" [41] Ango di warê erk û girîngiya wan de, wan rêzbend dike. Bi behskirina girîngiya regeza bûyerê û şîrovekirina statû û rola wê di trajediyayê de dest pê dike û di vî warî de dibêje: "Ji hemû regezan girîngtir bûyer e, çimkî bêguman trajedî ne çavlêkirina kesan e, lê çavlêkirina kirde û jiyan û bextewerî û bextreşiyê ye – bextewerî û bextreşiya mirov jî girêdayî kirdeyê ye, mebest ji (jiyanê) encamdana cure kirdeyeke diyarkirî ye neku xasiyetekê, kesayetî bi wan xasiyetên xwe kesayetiya wan derdikeve, lê bextewerî û bextreşiya wan di encama kirdeyên wan de bicih dibe." [42]

Bingeha romanê tenê li ser yek teknîk û yek binema û regezê dirust nabe, lê roman li ser çend regezan dirust dibe. (Şukrya Resûl) regezên romanê bi vî rengî diyar dike "1.Bûyer 2. Kesayetî 3.Vegotin (diyalog) 4.Dem û beşên wê 5.Cih (cur û xasiyeta wê) 6.Navnîşan." [43] Herwiha (Necm Xalid Elwenî) ligel regeza demê di romanê de bi vî rengî regezên din ên romanê diyar kirine "Kesayetî, bûyer, cih, diyalog, monolog, hîkayet û vegotin." [44] Herwiha (Mihemed Ehmed Hesen) bi vî awayî regezên wê diyar kiriye "ziman, karakter, bûyer, dem, cih…hwd." [45] Eger em bi hûrbînî berê xwe bidin hersê komên regezên romanê, ligel regezên (Aristotle) ku berê me behsa wan kir ew yek ji me re diyar dibe ku regeza bûyerê ji aliyê hemûyan ve hatiye destnîşankirin, ev jî tê wateya ku regeza bûyerê regezeke resen e û ne mumkin e di damezrandina teksta romanekê de bê piştguhkirin. Herwiha aktîfiya bûyerê di têkiliya bi karakteran re jî derdikeve, çimkî eşkere ye ku her bûyerek ji ber xwe ve rû nade, lê daku rû bide û geş bibe, pêwist e karakterek li pişt hebe û wê dirust bike. Ji ber vê tu kirdarek wek bûyereke hunerî nayê hejmartin eger ligel karakterekî bandorê li hevdu nekin. Her li vir jî têkiliya bûyerê bi karakter re dirust dibe, lê di romanê de, mebest ji bûyerê, ew rêzbûn e ku bûyer tê de derdikeve. Ango wêneya bi dû hev de hatina bûyeran di çarçoveya demê de.

---

39. Plato, Komar, W: Soran Umer Heme û Mehdî Hesen Çomanî û Rêbwar Qaremanî, Çapxaneya Wezareta Perwerdeyê, Çapa Yekem, Hewlêr, 2006, r.168.

40. Angram Bay Water, Kitêba Aristotle (Hunera Şiîrê), W: Îbrahîm Hemade, Çapxaneya Hela, Çapa Yekem, 1999, r.112.

41. Hunera Şiîrê (Şiîrnasî), r.28.

42. Jêderê Berê, r.29.

43. Ebdula Serac, Tewera Romanê, Kovara Karwanê, hejmar (108), 1997, r.86. Hêjayî gotinê ye ku Ebdula Serac bîr û baweriyên çend kesan derbarê romanê wergirtiye û yek ji beşdaran Dr. Şukrya Resûl e.

44. Necm Xalid Elwenî, Binyata Demê di sê Mînakên Romanên Kurdî de, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r.17.

45. Mihemed Ehmed Hesen, Bînaya Bûyerê di Çîrokê de, Kovara Raman, hejmara (115), 05.12.2006, r.110.

Tevî vê yekê jî ew destûr û pîvanên ku Aristotle ji trajedyayê re danîne di warê binyatkirin û bikarbirina regeza bûyerê, girêdayî dastanê jî heman tişt in, çimkî herdu jî di yek şêweya hunerê de hev digrin ku ew jî vegotinbend e. Ew bi xwe vê yekê teqez dike û dibêje: "Dastan jî bi heman şêweya trajedyayê vegotina kirdareke kamil e û tiştê ku dastanê ji trajedyayê cuda dike şêwaza vegotinê ye ku dastan pişta xwe bi vegotina rasterast an nerasterast girêdide, lê trajedya bi nimayîşê bûyeran pêşkêş dike, li tenişta regeza demê û çend taybetmendiyên din." [46] Ev destûrên Aristotles bûne bingeh û lêkolînvan û rexnegirên piştî wî ew bipêş xistin û li ser pêrewkirina berdewam bûn, "wek em li ba Horace dibînin, ku kar di pratîzekirina wan de kir." [47]An tenê di çend aliyekî taybet de guherîn di wan de kirin û bi awayekî wiha dariştin ku ligel taybetmendî û çêja serdemê biguncin. Wek mînak lêkolînvan û rexnegirên rêbaza klasîk ku di wê serdemê de yekemîn destpêkên janra romanê derketin û çend teksthatin berhemanîn, wek romana (Donkîşot) a (Cervantes 1547-1616) û (Robinson Cruiso) ya (Danial Defoe 1661-1731) [48] Di binyata tekstên vegotinbend de heman destûrên ku Aristotle danîbûn, pêrew dikirin.Yasayên taybet bi binyatkirin û rêkxistina regeza bûyerê di tekstan de û bi taybetî yekîtiya bûyerê.[49]

Nerîngeha romantîkan jî li ser vê babetê "ku di serdema wan de roman heta radeyekê vejiya û ji bo cara yekem çend curên romanê derketin holê wek: romana dîrokî, eşq, şexsî û derûnî." [50]Herwiha rêbaza realîzmê jî ku dîroka derketina wê hevdem e ligel dîroka jidayikbûna rasteqîn a janra romanê. [51]Romannivîsên wek (Standal 1783-1842) û (Balzac 1799-1850) û (Flaubert 1821-1880) û çend lêkolînvan û rexnegir, yekemîn damezrênerên vê rêbazê bûn, "daxwaz dikirin berhemên edebî rengpêderên realîteya jiyana asayî bin û dûr bin ji xemilandinê." [52] Ango bûyer rengpêderên realîteya derveyî jiyanê bin û bikerên wan ew kesên asayî bin ku di bin barê giran ê karesatên çax û dewranê de dinalin.

Lê diyartirîn kar ku li ser regeza bûyerê û derxistina pêgeh û girîngiya wê di tekstên vegotinbend de hatibe kirine piştî Aristotle, ew lêkolîn bûn ku (Formalîstên Rûs) li ser wan tekstan pêk anîn, çimkî wan di dema vekolîn û ravekirina tekst û metinên vegotinbend de, ew neseq/format eşkere kirin ku bûyer li ser wan hatine avakirin û ji bo cara yekem dabeşkirineke zanistî derbarê wan neseqan berçav kirin, bi pêrewkirina yasayên zimanî û miamelekirina ligel metinan wek yekîneyeke zimanî, çimkî bawer dikirin "edebiyat binyateke biçûk e di çarçoveya binyateke giştîtir de ku ew jî ziman e" [53] û "ew yasayên ku tekstên vegotinbend di binyatkirina

---

46. Angram Bay Water, Elkitab Aristo (Hunera Şiîrê), r. 237.
47. Horace, Hunera Şiîrê, W: Hemîd Ezîz, Çapxaneya Zeman, Çapa Yekem, Bexda, 1979, r.23.
48. Ferhad Pîrbal, Rêbazên Edebî, Wergera ji Fransî: Ferhad Pîrbal, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2004, r.42.
49. Elî Ebdilrezaq Mehmûd, Rexneya Edebî ya Nûjen, Bexda, 1991, r.98.
50. Ferhad Pîrbal, Rêbazên Edebî, r.65.
51. Ian Watt, Derketina Romana Ingilîzî, W: Reûf Bêgerd, Weşanxaneya Serdem, Çapa Duyem, Silêmanî, 2009, r.18.
52.Elî Ebdilrezaq Mehmûd, Rexneya Edebî ya Nûjen, Bexda, 1991, r.106.(Navê weşanxaneyê li ser nîne.)
53. Mîcan el Rulî – Seid el Baziî, Delîl el Naqid el Edebî, Navenda Çanda Erebî, Çapa Yekem, Bexda, 2004, r.37.

xwe de pêrew dikin, yasayên ravekirina deng û yasayên darîştinê ne"[54] Yekem kes ku di vî warî de hewla derxistina wan neseqan da (Vladimir Propp 1895-1970) bû, ku diyartirîn kesayetiya ekola formalîstên rûs bû, bi rêya pirtûka xwe "Morfolojiya hîkayetên efsaneyî yên rûsî – 1929) guherîneke mezin di warê lêkolîn kirina tekstên vegotinbend de pêk anî, bi rêya lêkolîn kirina hîkayetan li gor beşên pêkhênerên wan û pêwendiya wan beşan bi hev re û di dawî de bi hev re – bi kom".[55]

Di lêkolîneke xwe de bi navê (Sed çîrokên gelêrî yên rûsî), ku taybet kiribû bi vekolîn û behskirina regezên tekstên vegotinbend û rolû girîngiya wan regezan di binyata tekstan de. Girîngtirîn encamên ku formalîst di lêkolînên xwe gihîştibûn wan û berçav kirin di wê yekê de bû ku:

1. Li nava tekstan hatin berhemkirin, ango vekolîn an neseqa bûyeran, ew destûr danîbûn ku metin li ser wan hatibû avakirin.

2.Destpêkek damezrandin ji bo jinûve girîngîdanê bi regeza bûyer û yasayên bendkirina binyatê di tekst û metinên vegotinbend de. Ku beriya van heta radeyekê hatibû piştguhkirin, bi awayekî ku piştî nerînên Aristotles berhemek nayê dîtin, ku hewlên wê hatibin taybetkirin bi lêkolîn kirin û behskirina vê babetê li gor regez û binemayên hunerî yên din ên tekst û metinên vegotinbend, bi taybetî di janra romanê de tevî ku çend sedsalek ji temenê xwe derbas kiribû. Ev destpêka nû ya formalîstan bû xala destpêkirina serdemeke nû ya girîngîdana bi lêkolînên taybet bi regeza bûyerê di tekstên vegotinbend de bi giştî û romanê bi taybetî, di form û naverokeke nû de.

Di edebiyata kurdî de jî çend nivîskar û lêkolînvanektevî ku kêm jî bin, hewl dane nerînên xwe derbarê vê babetê berçav bikin li gor nerîngeha çend aliyekî taybet û li gor çend binemayên diyarkirî. Yekem nerînjî ku nêzîkatiya wê ji vê babetê hebenerînên (Şêx Nûrî Şêx Salih) e ku, di rojnameya (Jiyan) de belav kiriye. Şêx Nûrî di behskirina erk û peyama metinê edebî de şûnwara wê kartêkirina ku metin di derûna xwîner de bicî dihêle dike binema û dibêje: "Ew derbirîna ku ji gotineke bedew ji me re hasil dibe, ligel çavpêketina tabloyekê û bînayekî çak û bedew û guhdariya muzîkeke xweş heman derbirîn e" [56] di wê baweriyê de ye jî bandora (qise-bûyereke vegotî) di wan realîte û bûyerên trajedî û serpêhatiyên bibandor de ye ku wiha li dihêle hejîn û rahejandinekdi derûna xwîner de biafire.

Herwiha (Hisên Arif) û li gor ezmûna xwe ya taybet di warê nivîsandinê de, dema behsa regezên pêkhênerên çîrokê dike, teqez dike ku bûyer girîngtirîn regeza hunerên çîrokvanî ye û tew mumkin e çîrok bixwe wek bûyerê bê tarîfkirin û dibêje: "Çîrok ji wê rêza bûyer û karesatan (ên navxweyî û derveyî) ku têne serê kesên

---

54. Todorof, Neqd el Neqd (Riwayet Teelim), W: Samî Swêdan, Weşanxaneya Karûbarên Çandî ya Giştî, Çapa Duyem, Bexda, 1986, r.27.
55. Ehmed Talib, Sematîzm ji teoriya çavlêkirinê heta teoria formalîstî, (mamosteyê edebiyata nûjen û hevçax e, koleja edebiyatê, zanîngeha Tilmesan), www.ahmed-talib.com.
56. Kamil Hesen Besîr, Rexnesazî (pêrewkirina dîrokê), Çapxaneya Korrî Zanyarî Iraq, Çapa Duyem, Bexda, 1983, r.131.

çîrokê û derbas dibin pêk tê" [57] Di wê baweriyê de ye jî ku bûyer karesatên afirîner ên nav cîhana çîrokê, erkeke wan a wek dînamo heye û rêveberên proseya vegotinê ne, ji ber ku di hunera çîroknivîsiyê de karesat û bûyer û serpêhatî, dibin sedema birêvebirina malzemeyên sereke û nîşana zindîtî û keftelefta bêrawestan a jiyanê di tekstê de ne.

Lewra em dikarin bêjin: regezên hunerî yên binyata metinê romanê, her yek ji wan girîngiya xwe ya taybet heye û ji bo berhemanîna teksteke kamil a hunerî pêwistiya me bi her yekî ji wan heye, lê ligel vê jî rêzbendiyek heye ji bo pileya girîngî û asta beşdarîkirina her yekê ji wan regezan di tekstê de ku di rewşeke wiha de pêgeha pêşeng dibe para regeza bûyerê, ji ber ku di berhemanîna wê gotarê yan wê peyama ku tekst ji bowê hatiye afirandin bi roleke sereke radibe.

### 1.6.2 Girîngiya Bûyerê

Bûyer "kirdareke destpêk û naverast û dawiya wê heye."[58]Yan "zincîreyek (rastî-realîte) ne, di warê organîk de têkildarî hev in, xwe bi rêya destpêk û naverast û dawiyê nîşan didin."[59]Di nasîna bûyerê deew yek ji me re eşkere bû ku bûyer movika piştê ya roman û çîrokê ye. Bi rastî jî wiha ye, çimkî eger bûyer nebe, eger kesayetî jî hebin, bi şêweyekê rola wan di romanê de bê wate û mebest dibe û tu karek rû nade. "Bûyer pir girîng e, girîngiya wê di wê yekê de diyar dibe ku tu çîrokek bêyî bûyer nabe.Yanî eger bûyer nebe çîrok dirust nabe."[60] Tew hinek kes wek (Reşad Ruşdî) dibînin ku bêyî bûyer çîrok an roman teşe nagire "çîrok wê çaxê teşe digre ku wêneya bûyereke tevahî dikşîne, ew bûyer jî destpêk û naverast û dawî jê re heye û pêwendiyeke organîk hersê beşan bi hev re girêdide."[61] Herwiha (Perwêz Sabir) jî dibêje: "Bûyer bi roleke sereke di sazdana bînaya hunerî ya çîrokekê de radibe." [62]

Li ba Aristotle, bûyer ji sê xalan pêk tê. Ji destpêkê dest pê dike û digihe naverastê û piştre hino hino ber bi dawî diçe. Em dikarin vê yekê jî di vê nexşê de zelal bikin:

[57]. Hisên Arif, Çîroka Hunera Kurdî, Dezgeha Rewşenbîrî û Belavkirina Kurdî, Bexda, 1997, r.111. Ji (Mihemed Ehmed Hesen, Bînaya bûyerê di çîrokê de, Kovara Raman, hejmara 115, Xula Sêyem, Kanûna Yekem a 2006, Rêveberiya Rewşenbîrî ya Raman, r.112)


[58]. Aristotle, Hunera Şiîrê (Şiîrnasî), Wergerandina ji Ingilîzî: Ezîz Gerdî, Weşanxaneya Rênima, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r.33.

[59]. GeraldPrince, Têgeha Vegotinê (Ferhenga Têrman), W: Abid Xeznedar, Desteya Giştî ya Karûbarên Çapxaneyan, Qahîre, Çapa Yekem, 2005, r.19.

[60]. Husên Sabir Elî, Bînaya Bûyerê di Romana Muzîka Merga Nawext a Selah Celal Ebdula de, Kovara Raman, Hejmara 125, 05.10.2007, r.62.

[61]. Reşad Ruşdî, Hunera Kurteçîrokê, Pirtûkxaneya Ango ya Misrî, Çapa Yekem, 1997, r.115.

[62]. Perîz Sabir, Bînaya Hunerî ya Çîroka Kurdî, Weşanxaneya Serdem, Silêmanî, 2000, r.82.




Derbarê çawaniya bûyerê di romanê de di wê nexşa jor de, em dikarin rohnkirineke zêdetir bi vê şêweya li jêr berçav bikin:

1.Destpêk (Derwaze): Bîrokeyeke giştî ya babetê ye û amajekirineke seretayî ya bûyera sereke û zanyariyên giştî derbarê hinek karan e.

2. Naverast:

A. Bûyera hilkişiyayî: Geşbûn û pêşveçûna kêşe û milmilaneyan.

B. Plot (Lûtke): Rûbirûbûna hêzên neyar û xala lûtkeya bûyera hilkişiyayî.

3. Dawî: Çareserkirina wan bûyerên nesereke ye ku li asta bûyera sereke ber bi çareserî û dawî diçin."[63] Lê em dibînin ku ev rêzbendî ango bûyer, an arasteya bûyeran li ba helbestvanê romayî (Horace) têkdişke û bi cureke din dest pê dike. Herçiqasî beriya wî jî (Homerus) di (Ilyade û Odessa)yê de ev rêzbendî şikand û bûyerên vê dastanê ji naverastê ve dest pê kir. Vê bizavê hin guhertinên din jî lixwe girtin û heta niha şêweyên wê yên cuda hene wek:

1. Bûyer (kirde)=destpêk________ naverast______dawî.

2. Bûyer (kirde)=naverast________destpêk______dawî.

3. Bûyer (kirde)=dawî ________naverast______destpêk.

Her çawa be girîngiyeke pir mezin a van hersê beşan (destpêk, naverast, dawî) heye û divê girîngiyeke mezin bi wan bê dayîn, çimkî her yek li şûna xwe girîngiyeke wê ya taybet heye. "Destpêk di çîrokê de girîngiyeke wê ya mezin heye,

---

[63]Rêzan Osman Mistefa, Binyata Cureyên Bûyerê di Romana Kurdî ya Başûrê Kurdistanê de, Weşanxaneya Spîrêz, Çapa Yekem, Dihok, 2010, R.35.

çimkî destpêkirina bûyeran ji wê ye, derwazeyeke bo derbasbûna nav bûyerên çîrokê. Êdî lewra divê romannivîs bi şêweyeke wiha balkêş dest pê bike ku xwîner bikşîne nav çîrokê û wiha lê bike nikaribe dev ji xwendina çîrokê berde.Naverast şêweya duyem e ku bûyer ji naverastê dest pê dikin.Yanî di dema alozbûna bûyeran de, gava bûyer gihîştine lûtkeyê çîrok dest pê dike. Dawî girîngiya xwe heye, çimkî hemû tişt û encam di vir de ye û hemû tişt rohn dibe, divê bi şêweyeke hunerî ya wiha bê nivîsandin ta xwîner hewl bide zû bigihe dawî da bizane encama bûyeran çi dibe."[64]

Dema em dibêjin ku bûyer bi roleke sereke di romanê de radibe yan roleke wê ya berçavdi romanê de heye, mebesta me ne ew e ku regezên din nesereke ne û rola wan ne aktîf e, nexêr, lê mebesta me ew e ku bûyer li tenişta çend regezên din ên romanê avahiya romanê dirust dikin. "Hemû regezên di nav hunera çîroknivîsiyê de hev temam dikin, tu yek ji van regezan bi tenê nikare çîrokeke bedew biafirîne, wek mînak bi tenê zemanek (çaxek – demek) nikare çîrokê dirust bike, yan bûyer bi tena serê xwe." [65] Lê girîngiya bûyerê di wê yekê de ye ku piraniya regezên din ên romanê li dora xwe kom dike û wan girêdide. Eger di metinê romanekê de bûyerek an çend bûyer hebin, pêwist e ku kesayetî hebin ji bo cîbicîkirin û rollîstina wan di yarîkirina encama bûyeran de. Eger bûyer û kesayetî hebûn, pêwist e cih jî hebe da kar li ser bê pêkanîn. Dema ew hersê regez jî hebin, dem xwe bi şêweyeke pêwist nîşan dide û hemûyan di demeke diyarkirî de kom dike. Regezên din jî bi heman awayî bi rola xwe di tekstê de radibin, lê qasî ku heye di hinek metinên romanê de gelek bûyer hene û teqeziyeke zêde li ser wan tê kirin, di hinek romanên din de jî cih pir hatiye bergewdekirin û guhdan pê hatiye kirin, regezên din jî bi heman awayî ew reftar ligel wan tê kirin. Her çawa be bûyer di her metinekî romanê de heye, lê ya ku dimîne kêmî û zêdehî yan sadehî û aloziya bikaranîna wê ye.

### 1.7Birrê Duyem:

### 1.7.1 Nasandina Têgeha Pêşketinê

Dema em dixwazin çemka/têgeha pêşketina bûyerê lêkolîn bikin, bi kêmanî divê em du xalan li ber çav bigirin:

**Yekem**: Dîtina navekî guncaw bi zimanê kurdî, ku wek gelek çemkên din ên wêjeyî, hunerî, felsefî û zanistî hêj bi temamî nehatiye yekalîkirin û cihê xwe negirtiye.

**Duyem:** Bi zimanê kurdî pir kêm behsa vê çemkê hatiye kirin, lewra em di vê lêkolîna xwe de neçar dibin beşekî zêde terxanî pênase û rehendên wê bikin û emê hewl bidin di vê çarçoveyê de amaje bidin çend çavkaniyên cuda, bi wê mebesta ku em hinek hêlên giştî yên vê têgehê nîşan bidin. Em dikarin bêjin evtêgeh li gor

---

[64]. Mihemed Ehmed Hesen, Bînaya Bûyerê di Çîrokê de, Kovara Raman, hejmara (115), 2006, r.114.

[65]. Şêrko Bêkes, Çend peyvek derbarê çîroka kurdî, Kovara Ayînde, Hejmar (49), 2003, r.119.

çemkên din ên edebiyata vegotinê wek flaşbak, nûtir e û di van salên dawî de bêhtir ber bi pêş ve çûye, lewra li derveyî zimanê kurdî jî behsa wê kêm hatiye kirin.

Tevî ku di zimanê kurdî de, dirustir li ba wan ravekarên ku ev çemk lêkolîn kirine, (pêşketina bûyerê) li hember peyva (Prolepsis) a ingilîzî û (istîbaq)a erebî hatiye bikaranîn, lê bi baweriya me curek ji nezelaliyê di wan herdu peyvan de heye ku, mumkin e xwîner wiha bifkire ku mebest pêşveçûna bûyerê ye, ku ew jî yek ji teknîkên vegotinê ye, ango çawa hêla dramî ya bûyerê bipêş dikeve, lewra em baş dibînin li vir (bazdana demê) jî bikar bînin, ku nêzîkî (Time-Shift)a ingilîzî ye û hevwateya peyva (Prolepsis) e, daku wateya vê têgehê rewşentir bibe. Wek em dibînin (A.A.Mendelaw) di kitêba (Dem û Romanê) de, navê (Time Shift) lê dike û bawer dike ku (Conrad) û (Ford Madox Ford) ew vegeşandine. Divê em vê jî bêjin ku her bi zimanê ingilîzî (Flashforward) ji bo wê tê bikaranîn. [66] Herwiha divê em vê jî bêjin, ku pêşketina bûyerê ne tenê taybet e bi edebiyatê, lê di warê fikrî de jî çemkek e û kar pê tê kirin. Wek mînak (Hog de Juvenal) di kitêba (Ayînde wek moderníte diafirîne) de dibêje: "Pêşketina bûyerê ne çaverêkirin û ne pêşbînî ye, erkê wê jî ne ew e pêşbîniya dahatûbike wek tu bêjî tiştekî amadekirî be, lê erkê wê ew e alîkariya me bike di damezrandina wê de, ku bangewaziya me dike daku ayînde kareke li ser me ye em wê damezrînin û binyat bikin." [67]

(Lutfî Zeytunî) di (Ferhenga Têgehên Romanê) de pêşketina bûyerê bi vê şêweyê pênase dike: "Berevajî rêveçûna dema vegotinê ye ku, dema niha ya hîkayetê derbas dike û behsa bûyerekê dike ku hêj dema wê nehatiye. Pêşketina bûyerê di wan tekstên ku bi cînavê kesê yekem yê tak hatine nivîsandin, pir belav e, bi taybetî di kitêbên jiyanname û geştnameyan de, ku nivîskar, çîrokbêj û karakter sê rolên wan hene û yek kes bi wê rolê radibe. Ev têkilkirina rolan dibe sedema di hevde çûna wan û piştre bi hevde çûna zemanên wan jî. Pêşketina bûyerê hin caran şêweya xewnê werdigire, xewneke ku xeybê kifş bike, yan şêweya pêşbînî û ferziya rasteqîn derbarê siberojê werdigre."[68]

Di (Ensîklopediya Brîtanî) de jî pêşketina bûyerê wiha tê tarîfkirin: "Teknîkeke vegotinê ye ku bûyereke dahatû yan pêşketinekê pêşkêş dike, wek ku berê qewimîbe yan çêbûbe." [69] Di vê tarîfê de em dibînin ku teqezî li ser qewimîna bûyerê hatiye kirin wek ku di dema borî de qewimîbe. Li vir teknîka pêşketina bûyerê, wek vegerandinê tê hesibandin çimkî di vegerandinê de bûyer di dema borî de qewimiye, lê pêşketin divê bûyer di dahatû de biqewime, ango cudahî di navbera van herdu teknîkan de tenê dem e, di yekem de raborî navend e û di duyem de dahatû. Em dikarin bêjin pêşketina bûyerê berevajî teknîka (Flashback) e, çimkî

---

66. A.A.Mendelaw, Dem û Roman, Wergerandina: Bekir Ebas, Serastkirina: Ihsan Ebas, Weşanxaneya Sadir, Beyrût, Çapa Yekem, 1997, r.68.
67 Jêderê Berê, r.69.
68. Letîf Zeytûnî, Ferhenga Têrmên Rexneya Romanê, http://lzeitouni.lau.edu.lb/PDF/23.pdf
69. http://www.britannica.com/EBchecked/topic/478607/prolepsis

egerarmanca Flashbackê nîşandana dîmenekê yan bêhtirî dîmeneke raborî be, ku xwe di (niha) deferz dikin û derdikevin, lê pêşketina bûyerê ji anîna berçav a dîmenekê yan bêhtir pêk tê, ku tê çaverêkirin di dahatû de biqewimin. Eger a yekem anîna dîmena (raborî) ji bo (niha) be, lê ya duyem guhastina zeman bi xwe ye ji (niha) jibo (dahatû), çimkî di pêşketina bûyerê de (niha) girîngiya xwe ji dest dide û (dahatû) şûna wê digire. Bi wateyeke din eger di Flashbackê de dîmenên (rabirdû) bi dîmenên (niha) ve bêne girêdan, êdî di pêşketina bûyerê de (niha) bi (dahatû) ve girênade, lê dide aliyekî û bi şêweyeke paradoks (dahatû) dest pê dike, bêyî ku em bi rastî pê gihîştibin. Yanî bêyî ku hêj di aliyê fîzîkî de (niha) derbas bûbe û (dahatû) hatibe. Xala wekheviyê di navbera wan herdu teknîkan de ew e ku, herdu ji ber girîngiyê teqezî li ser wan tê kirin. Di vî warî de (Ehmed Hemed el Neîmî) di kitêba (Rîtma demê di romana erebî ya hevçax de) dinivîse: "Flashback û pêşketina demê şêweyek ji şêweyên dema psîkolojî pêk tînin, ku xwe di şêweyên curbicur de nîşan didin, wek bendewarî." [70]

(Ednan Xalid Ebdula) pêşketina bûyerê û pêşbîniyê wek heman tiştî dibîne, bi vê şêweyê tarîfa wê dike: "Pêşbînî di çîrokê deji rêkxistin û nîşandana bûyeran di çîrok û şanoyê de bi awayekî ku xwîner amade bike ji bo xwendin an dîtina bûyerên dûre pêk tê." Bi baweriya me, pêşbînî yek ji xisletên wê teknîkê ye, lê ne hevwateya wê ye.Romannivîs bi rêya teknîka pêşketina bûyerê fokus li ser bûyerekê dike, ku hêj nehatiye. Herwiha bi wê mebesta wiha li xwîner bike bêhtir girîngiyê bi wê pêşbîniyê (Prediction) bide û bi coştir çaverêyî wê bibe. Bêguman bi rêya pêşketina bûyerê xwîner hest dike ku zanyariyên girîng li ba çîrokbêj hene û dixwaze wan di beşên dahatû de ragihîne, lewra hewl dide lezê li xwendina romanê bike heta digihe wê bûyera ku pêşwext hatiye behskirin. "Ev nayê wateya dema romannivîs wê teknîkê bikar tîne û soza wê yekê dide xwîner ku bûyerek di dahatû de rû dide, êdî her divê pêk were.Lê nivîskar heta radeyekê azad e ku bi wê soza xwe re rast be yan na ku ev li ba (Gérard Genette) wek amadekariya xapandinê tê binavkirin." [71] Yanî nivîskar armanc dike xwîner bi xwe re heta dawiya romanê bibe, bêyî ku wî bigihîne wan deverên ku pêştir amaje pê dabûn, ku ev wiha dike xwîner tûşî helwesta ji nişka ve bike û li wir bi awayekî din li têmaya romanê birame.

(Amine Yûsif) di kitêba (Teknîkên Vegotinê) de, pêşbînî û pêşketinê ji hev cuda dike û bawer dike ku "pêşketina bûyerê aliyekî din e ji aliyên cudahiya teknîkên vegotinê di dahatû de. Pêşketin di aliyê têgihîştina hunerî de pêşketina wan bûyeran li xwe digire ku bêguman di dahatû de rû didin. Bi berevajî wan bûyerên ku tên pêşbînîkirin rû bidin, lê rû nadin." [72] Li vir (Amine Yûsif) mercê bicîhatinê ji bo wan

70. Ehmed Hemed el Neîmî, Rîtma demê di romana erebî ya hevçax de, Dezgeha Erebî ya Lêkolînan, Çapa Yekem, Oman, 2004, r 28.
71. Henan Xalid Ebdula, El Neqid el Tetbîqî el Tehlîlî (Mûqedîme lîdîraset el Edeb we Enasirh fî Dewi el Menhec el Neqdiye), Dar el Şiûn el Seqafiye, Çapa Yekem, Bexda, 1986, r 17.

72. Amine Yûsif, Teknîkên Vegotinê di Teorî û Pratîkê de, r 49.

pêşketinan daniye ku nivîskar di berdewamiya vegotinê de wan dike. Yanî pêşketina wan bûyerên dahatû, ku di dema niha de têne vegotin, divê dûre bicih werin, daku li ba xwîner gumanê dirust neke. Bi vî rengî pêşketina derveyî ku curek ji cureyên pêşketina bûyerê li ba wê nivîskarê nîne.Çimkî bi baweriya wê divê bi piştrastî di berdewamiya vegotinê de bicih bên. Wek me got jî ew pêşbînî û pêşketina bûyerê wek eynî tiştî nabîne.Bi baweriya wê pêşbînî tenê pêşbînîkirina bûyeran e di dema niha de.Yanî pêşbînî heta wê çaxê pêşbînî ye ku nivîskar behsa bûyerekê dike, yan bûyerekê ji boxwîner tevdide. Dûre gava ev pêşbînî di beşên din de bicih hat, hingê rasterast dibe pêşketina bûyerê, lê eger neqewimî her wek pêşbînî dimîne. Em di vê yekê de ligel nivîskar kok in ku ew herdu cuda ne, lê baweriya me ne wiha ye, eger bicih nehatin nabin pêşketina bûyerê. Çimkî wek li ba (Gérard Genette), me dît ev fêl û hîlebaziyeke hunerî ye û wek amadekariya xapandinê tên binavkirin. Em bawer dikin tevî ku pêşbînî girêdayî dahatû ye, lê têkildarî niha û rabirdû ye jî, çimkî li ser esas û binemaya bûyerênniha û rabirdû tê damezrandin.Dema têgeha pêşbîniyê derdikeve pêş, xwîner çaverêyê bûyerekê ye, gelo rû dide yan nade.Gelo bi dilê wî dibe, yan berevajî.Çaverêkirin bi xwe mişt tirs û dudilî ye.Bi vî rengî pêşbînî rengekî ji dilbijî û dahêlanê (Suspense) bi xwe re tîne, çimkî wiha li xwîner dike bi dû bûyeran here û bizanibe bûyer digihin kû.Yanî erkê pêşbîniyê bi pileya yekem lezgînkirina rîtma ziman û tevgera karakter e. Gava karakter çaverêyê bicîhatina pêşbîniyê ye, dev ji gelek fikrînên nesereke berdide û xeyala wî her li ba wê bûyerê ye ku li ba wî wateyeke wê ya taybet heye.

(Bextiyar Secadî) û (Mihemed Mehmûdî)pêşketina bûyerê bi vî awayî didin nasîn: Ev têgeh yewnanî ye bi şêweyên cuda cuda tê bikaranîn. Amajekirin e ji bo tiştekî ku di dahatûya kirdeya çîrokê de bi rastî rû dide. Yan derxistina pêşwext a hin diyardeyan e ku dûre di heman berhemê de derdikevin holê.Ev teknîk bêhtir girêdayî vegotinzaniyê ye. Gérard Genette du cureyên pêşbîniyê destnîşan kiriye: Pêşbîniya navxweyî ew pêşbînî ye ku bûyer di nav çarçoveya dema vegotinê de rû didin. Pêşbîniya derveyî ew pêşbînî ye ku bûyer di sînorê dema vegotinê de rû nadin, ango dikevin derveyî çarçoveya vegotinê de. [73]Van herdu nivîskaran têgeha pêşbîniyê jê re bikar aniye. Rûdan an qewimîna wan bûyeran jî di çarçoveya vegotinê de mercê sereke yê pêşbîniyê ye. Ango nivîskar dema pêşbîniyê dike, divê xwîner beriya xilasbûna vegotinê bicîhatina pêşbîniyê bixwîne.

Di Ensîklopediya wikipediayê de pêşketina bûyerê bi vî rengî hatiye tarîfkirin[74]: Bûyereke ji nişka ve ye ku vegotinê dibe beriya dema niha ya dema çîrok û romanê. Ya ku eşkere ye vegotin li ser du cureyên demê tê avakirin. Dema romanê ew dem e ku bûyer bi zincîreyî yek bi dû yek rû dane yan rû didin. Dema vegotinê ew dem e ku vebêjer tê de bûyeran vedibêje û wan birêk dixe. Ew zincîra bûyeran ku

[73]. Bextiyar Secadî û Mihemed Mehmûdî, Ferhenga Şîrovekar a Têgehên Wêjeyî, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2004, r 92.

[74]. http://en.wikipedia.org/wiki/Flashforward، 3/2/2016

di dema romanê de heye, di dema vegotinê de namîne. Yanî di dema vegotinê de nivîskar wê zincîra dema romanê têk dide, bi rêya teknîkên demê bûyeran pêş û paş dixe, ango nivîskar di yek demê de reftarê ligel rabirdû û niha û siberojê dike. Em dikarin bêjin dema romannivîs teknîka pêşketina bûyerê yan bezandina demê bikar tîne, mebesta wî ew e ku karakter di demeke diyarkirî de asê neke, lê di hersê deman de tevbigerîne. Ev jî wiha dike bûyer bi şêweya kronolojîk, ango bi zincîre, bi dû hev de neyên. Ev têkbirina desthilata hîkayetê ye jî, çimkî hîkayet vegotina zincîreyî bikar tîne, neku bezandinê, lewra bi rêya wê teknîkê romannivîs sînorê hîkayetê dibire û têmaya romanê ji wê bertengiyê derbas dike, tew wê dixe nav zemanekî vekirî de ku dahatû ye.Yanî xisleteke vê teknîkê ya (berdewamiyê) heye û nahêle bûyer di xaleke diyarkirî de raweste, lê bêsînor berdewamiyê pê dide. Li vir ev li ser romannivîs ferz dibe, ku reftareke cuda bi zeman re bike. Ji ber ku ew teknîk rasterast têkildarî zeman e. Em dikarin bêjin di romanên ku teknîka pêşketina bûyerê di wan de tê bikaranîn, dem dibe regezeke girîng û romannivîs me dixe pêşber nerîneke nû, hin caran nerîneke felsefî jî. Bi vî awayî roman ji wê şêwaza standard derdikeve ku li ser sê zemanên rabirdû, niha û dahatû parve bibe, lê destpêk, navîn û dawî cihê xwe bi hev diguherin. Êdî (xala dawî) ne ew cih e ku tekst di aliyê fîzîkî de xilas dibe.Yanî (dawiya) romanê nakeve rûpela dawî ya pirtûkê, lê li ser çend kanalên cihêreng parve dibe.Wek me li jor jî behs kir, em di vê çarçoveyê derastî têgeha pêşbîniyê tên.

Li gor danasîna (Wikipedia) nivîskar ji nişka ve bûyerekê tîne pêş daku xwîner ji bicîhatina pêşhatekê serwext bike. Yanî wiha li xwîner dike bikeve rewşa bendewariyê, bendewariya wê pêşbîniya ku vebêjer amaje pê kiriye, ku mumkin e rêveçûna bûyeran jî biguhere û wan ber bi aliyekî din ve bibe. Vebêjer bi rêya vê teknîkê hewl dide bi xwe re xwîner jî bi coşdarî heta beşên dawî yên romanê bibe.

Tiştê ku ji wan danasînan hemûyan derdikeveew e ku hîn bi temamî nehatiye piştrastkirin, ka gelo pêşbînî tê heman wateya pêşketina bûyerê yan cuda ne û her yek ji wan erk û taybetmendiya xwe heye. Her nivîskarek bi awayekî behsa van herdu têgehan dike. Hinek ji wan vê teknîkê ne wek pêşketina bûyerê, lê wek pêşbînî binav dikin. Lê hinekên din, merc jê re danîne û bawer dikin eger bûyer an pêşbîniya ku nivîskar amaje pê dike, di beşên dahatû de bicî hat, hingê mumkin e navê pêşketina bûyerê lê bê kirin. Lê eger bicî nehat, wê çaxê di sînorê pêşbîniyê de dimîne. Li vir rûdan û rûnedana wê bûyera ku pêşwext nivîskar behs dike dibe xala yekalîker ji bo navê vê teknîkê. Em bawer dikin di proseya vegotinê de ew yek derdikeve, ku nivîskar bi awayekî çawa bi vê teknîkê re tevdigere. Bicînehatina pêşbîniyê wek me li jor jî amaje pê kir, mumkin e beşek be ji wan fêlên hunerî yên ku nivîskar bi mebesta estetîkê bikar tîne. Daku ji aliyekî atmosfera tekstê berfirehtir û rengîntir bike û ji aliyekî din ve jî xwîner bixe pêşber regeza ji nişkavebûnê, daku ew bi xwe wê dawiya ku pê gihîştiye ligel wê dawiyê bide berhev, ku çaverêyê wê bû. Li vir nivîskar teksta xwe ne bi bersivê, lê bi pirsyarê bidawî tîne.

Ji aliyekî din ve meseleya xwîner xala werçerixîn û guhertina rêveçûna tekstê ye. Çimkî mumkin e hinek caran xwînerê neşareza yan rexnegirê kêm tecrûbe pêşbîniyê wek pêşketina bûyerê bibîne, ku nabe ev dûre wek nerîn û baweriya rexneyî bê wesfkirin, bi wateya ku pêşketina bûyerê her divê rû bide, lê mumkin e pêşbînî pûç bibe û wek guman û egerekê rêza bûyeran têk bide û helwesta karakteran biguherîne.

### 1.7.2 Cureyên Pêşketina Bûyerê

Her nivîskaran rexnegirekî edebî bi şêweyeke cuda pêşketina bûyerê destnîşan kiriye, lê bêguman hinek xalên hevbeş di piraniya wan lêkolînan de tên dîtin. Ev tiştekî xwezayî ye. Dema em tînin bîra xwe kuew têgeh ne tenê di zimanê kurdî de lê li derveyî me jî heta radeyekê nû ye û kêmtir ji têgehên din ên edebî yên vegotinê behsa wê hatiye kirin. Ewên ku heta niha bi zimanê kurdî di vî warî de nivîsandine, hewl dane wek destpêkekê wê têgehê bidin nasîn û li ser tekstên kurdî pratîze bikin, ku bêguman girîngiya van hewldanan heye.

(Celal Enwer Seîd) di pirtûka (Teknîka Vegotinê di Romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî de) bi awayekî giştî cureyên pêşketina bûyerê destnîşan kiriye û dinivîse: “Pêşketina bûyerê di romana Êvara Perwaneyê de bi çend şêweyan hatiye bikaranîn. Pêşketina bûyerên ku rû didin û pêşketina bûyerên ku rû nadin.”[75]Wek em dibînin wî rûdan û rûnedan (qewimîn û ne qewimîn) kiriye pîvan ji bo cudakirina cureyên wê, ku ev bi xwe taybetmendiyeke giştî ya vê teknîkê ye. Pêşketina bûyerên ku rû didin: **“…bavê min û meta min herdu bi tirs dihatin û li vê ken û girnijîna min a ji nişkêve dinerîn, min didît bi cot hêdî hêdî li dora agir difitilin û bi tirs bi wê girnijînê diponijin ku di nav hilm, dûman û barana wê sibehê de, saet li dû saetê bi awayekî ecêb, bi awayekî ku êdî ne li jêr desthilata min bû, li ser rûyê min mezintir û mezintir dibû, girnijînek heya demeke dirêj bi min re dimîne û tenê piştî hesreta şewitîneke dî li ser rûyê min namîne.”**(Êvara Perwaneyê, r 35)

Li vir vebêjer bala xwîner dikşîne ser pêşketina du bûyeran, ku herdu bicih tên û di dahatû de rû didin. Bûyera yekem tenê bi armanca ragihandinê ye û ji xwîner re radigihîne ku di dahatû de ew girnijîna li ser lêvên wê namîne. Ya duyem bi rêya (piştî hesreta şewitîneke dî) di aliyê derûnî de xwîner amade dike û pir bicoş dike daku bilez be ji bo zanîna wê hesreta ku dibe sedema nemana wê girnijîna li ser lêva wê (Xendan). Pêşketina bûyerên ku rû nadin:**"Fetane jî bi berdewamî digot: Xendan dibe ku sibe me bi temamî ji hevdu cuda bikin."**(Êvara Perwaneyê, r 222)

---

[75]. Celal Enwer Seîd, Teknîka Vegotinê di Romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî de, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapxaneya Kemal, 2009, r 103.

**“…Fetane ji me re digot `Dev û çavên xwe bişon, hertişt wê baş bibe, em li vir bi hevre dijîn; di siberojê de dibe ku em bibin mamosteyên olî."**(Êvara Perwaneyê, r 133)

Ev bûyer rû nadin. Di van herdu mînakên jor de, vebêjer ji zarê Fetaneyê pêşbîniya du bûyeran dike.Her ji destpêkê ve vebêjer ne piştrast e ka gelo ew bûyer rû didin an na? Çimkî peyva (dibe ku) bikar tîne, lê dûre ji xwîner re diyar dibe ku ev herdu bûyer jî bicih nayên û rû nadin.

(JapLintvelt) cudahiyê di navbera du cureyên pêşbîniyê de dike “Pêşbîniya piştrastker, ango ku bi rastî di siberoja kesayetiyan de rû dide û pêşbîniya gumanlêkirî, wek wan eger/fereziyên ku karakter dikin, bicîhatina wan di siberojê de cihê gumanê ye, bi heman şêweya (Celal Enwer Seîd), (JaapLintvelt) jî cureyên bûyerê li ser bingeha rûdan û rûnedana pêşbîniyê cuda kirine. Em bawer dikin ku nabe rûdan û rûnedana bûyeran, yan bi wateyeke din em bicîhatin û bicînehatina pêşbîniyan bikin pîvan ji bo cudakirina cureyên pêşketina bûyerê, lê em dikarin cureya tevgera nivîskar di bikaranîna teknîkê de li ber çav bigirin, çimkî divê em bizanin ku nivîskar çawa tekezî li ser wan pêşbîniyan kiriye û mecalekî çawa diyarî wan kiriye, di dawî de jî çi armanceke estetîk di bicîhatin û bicînehatina wan de heye. Mumkin e pêşbîniya bûyerekê hatibe kirin û bicih neyê, lê beşekî girîng ji tekstê dagîr kiribe û çend pirsên mezin û bibandor li ba xwîner tevdabin. Nabe ew yek jî ji bîra me here ku di romanên bi şêwaza klasîk bi demê re tevnagerin, cudakirina rabirdû, niha û dahatû zehmet dibe. Teknîka pêşketina bûyerê jî berhema wê şêwaza vegotinê ye, lewra taybet e bi wan romanên ku li ser têkbirina dema fîzîkî kar dikin.

Di vî warî de nerîna (Necm Elwenî) ji ya wan herdu nivîskarên ku me amaje bi wan kir, cuda ye.Ew bi vî awayî cureyên pêşketina bûyerê diyar dike: [76]

1. Pêşketina Navxweyî: Ev cureya pêşketinê her wekGérard Genette dibêje: “Wek vegotina navxweyî tê bikaranîn, têkilî û tevlîhevbûneke munasib pêk tîne di navbera hîkayeta yekem û wê hîkayeta ku benda pêş bûyer ketinê pê radibe.

2. Pêşketina Derveyî: Ev cure taybet e bi wan bûyerên ku pêşketin di wan de bicî hatiye û dikevin derveyî dema sereke ya vegotina romanê. Lewra ev jî her wek vegotina derveyî tê bikaranîn.

3. Pêşketina Dubarekirî: Ji dubarekirina bûyerekê ku di siberojê de rû dide pêk tê. Lê di dema niha ya vegotinê de çend caran û li çend cihên cuda bi dirêjiya tekstê dubare dibe.

---

[76]. Necm Xalid Elwenî, Binyata Demê di Sê Mînakên Romanên Kurdî de, Nameya Masterê, Koleja Selahedîn – Beşê Zimanê Kurdî, Weşanxaneya Serdem, Silêmanî, 2004, r 118.

Li vir Necm Elwenî sê cureyên pêşketina bûyerê cuda kiriye ku cureya yekem pêşketina navxweyî ye angoew pêşketinên ku vebêjer behsa wan dike, divê di çarçoveya dema vegotinê de bicih bên û pêwist e xwîner di beşên dahatû de wan bûyerên ku nivîskar pêşwext behsa wan kiriye bibîne. Cureya duyem ku pêşketina bûyerê ya derveyî ye. Em nikarin wê bidin nasîn û zêde li ser wê biaxivin, çimkî em nizanin ev cure piştî bidawîhatina tekstê rû dide yan na, li gor vê gotinê jî ku dibêje bûyerek heta niha rû nedabe dibe ku di siberojê de jî rû nede. Cureya sêyem, ku pêşketina dubarekirî ye, vebêjer ji ber girîngiya bûyerê bêhtirî carekê di çarçoveya vegotina xwe de behsa wê dike, da xwîner bi temamî amade bike ji bo wê pêşhata ku mumkin e rêveçûna vegotinê biguhere.

(Ehmed Hemed el Neîmî) di pirtûka (Rîtma Demê di Romana Erebî ya Hevçax de) pêşketina bûyerê li ser sê şêweyan dabeş dike:

**Yekem:** Pêşketina bûyerekê, mumkin e bicih bê, ku tê de xeyal realîstî ye, wek çawa armancên karakterê romanê ligel şiyanên wî û mirovê niha hevrik e, ku eger bixwaze hewl bide xewnên xwe di realîteyê de bike rastî.

**Duyem:** Pêşketina bûyerekê, ne mumkin e bicih bê, ku tê de karakter zêdetirî şiyana xwe û ya hawîrdora xwe dixebitîne ji bo bicihanîna wê. Ev di wan romanan de heye ku teşwîqê li ba xwîner dirust dikin, gelo pêşbîniyên wî rast derdikevin an tûşî bêhêvîtiyê dibe, ku wiha bawer dikir ew karakter wê bigihe armancên xwe.

**Sêyem:** Pêşketina bûyerekê, li derveyî tiştên berbelav, ev di çîrokên zanistî de rû dide, ku karakter şiyana wî heye wan hemû karan bike ku di rastiyê de dûrî mejî ne. [77]

Ango li gor baweriya (el Neîmî), pêşbînî bicih bên an neyên, her proseyek bi navê pêşketina bûyerê heye.Cureyeke din di kategorîzekirina pêşketina bûyerê de, ya (Genette) e ku tekezî li ser cudahiya demê kiriye, yan temamiya wê hawîrdora ku pêşketin tê de rû dide.Li ser vê bingehê jî cudahiya navbera (pêşketina navxweyî), ku şiyana rûdana wê yan maweya dema wê noqî wê demê dibe ku çîrok tê de dest pê dike û bidawî tê, ango her di çarçoveya vegotinê de pêşketin bicih tê.Heçî (pêşketina derveyî) ye, dema rûdana wê dikeve derveyî dema vegotinê.Yanî di wê çarçoveya demkî de bicih nayê, ku taybet e bi tekstê, lê (pêşketina tevlîhev) beşek jê dikeve hundirê dema vegotinê û beşê wê yê din diçe derveyî dema vegotinê. Ango xwîner hest dike ew pêşketina ku vebêjer behs kiriye beşek jê di çarçoveya vegotinê de bicih hatiye, lê beşekî pêşketinê maye, ku mumkin e nivîskar bi qestebende wiha bike, daku xwîner piştî xilasbûna tekstê jî hinek têz û egeran di bîra xwe de dirust bike, yanî dawiya tekstê vekirî dihêle.

[77]. Ehmed Hemed el Neîmî, Rîtma demê di romana erebî ya hevçax de, Dezgeha Erebî ya Lêkolînan, Çapa Yekem, Oman, 2004, r 30.

(Genette) kategorîzekirineke din jî dike li ser esas û binemaya karînê di navbera pêşketina tevayî (hemûtî), ku ev sosret e û pêşketina netevayî (beşkî). Li gor vê nerînê, pêşketina navxweyî dibe (pêşketina hemûtî-tevayî) eger hat û pêşketin bicî hat heta dawiya serpêhatiyê, lê eger hat û bicî nehat heta dawiya vegotinê, piştî dawiya serpêhatiyê jî berdewam bû, hingê dibe (pêşketina beşkî), ango pêşketina derveyî û pêşketina tevlîhev dibin pêşketina beşkî, çimkî tenê beşek ji bûyerê diqewime. Em dikarin bêjin tevî ku hêj li ba ravekaran bi temamî nehatiye yekalîkirin, ku çend cureyên pêşketina bûyerê hene û nerîn li ser rûdan û rûnedana wan pêşbîniyan cuda ne, lê hemû di wê yekê de hemfikr in ku yek ji teknîkên girîng ên edebiyata vegotinê ye.

Ligel wê yekê ku me berê amaje pê kir ku teknîka pêşketina bûyerê wek teknîkekê di proseya vegotina bûyerê de bikaranîna wê kêmtir e, lê tevî vê yekî jî romannivîs di tewzîfkirina pêşketina bûyerê de jêhatîbûn nîşan daye, bi taybetî pêşketina wan bûyerên ku xwîner teşwîq dike ji bo zanîna wan, berevajî wan baweriyên ku pêşketina bûyerê coşdariya xwîner di xwendin û şopandina bûyeran de dikuje yan kêm dike.

**1.8Birrê Sêyem:**

**1.8.1 Hunerabûyerê di binyata teksta romanê de**

Li wê gorê ku roman yek ji şêwazên girîng ên tekstên vegotinbend e û wek hemû cure û şêwazên din ên vî terzî, pêwistî bi regeza (bûyerê) heye, lewrapêwistiya romannivîs jî ji bo nivîsandina romana xwe bi hebûna bûyerekê heye da bikare li tenişta kirdeya vegotinê, berdewamiyê bide kirdeya nivîsandinê û teksta xwe di astên binyata teksteke vegotinbend a temamî de derbas bike, ku ew ast jî ji: (destpêk, girêk, lûtke û dawî) pêk tên û di nav tevnê de têne bihev vekirin û bi teknîkên cuda cuda yên wesfê jî têne xemilandinû di dawî de tên berçavkirin. Xuya ye di vê yekê de jî romannivîsê zîrek jîrekiya xwe nîşan dide, ango "di her romanekê de û li gor sîstemeke diyarkirî, çend bûyer rû didin, ku bûyer jî hebû êdî vegotin jî dirust dibe" [78] û berevajî vê jî rast e, çimkî sadetirîn şêweya vegotinê "ji wê yekê pêk tê ku bûyerekê yan rêzebûyeran ji me re vedibêje"[79] Bi awayekî giştî vegotina bûyerê di romanê de, li ser hîm û binemaya çar astên cuda tê binyatkirin, ku mumkin e di heman teksta romanekê de, yan bi cuda bê bikaranîn, ew jî pêk tên ji:

1. Bûyereke ku rû daye.

2. Bûyerek di dem û wextê rûdanê de ye.

3. Bûyerek ku egera rûdana wê di siberojê de heye.

---

[78]. Audin Muer, Binyata Romanê, W: Îbrahîm el Seyrefî, Dezgeha Misrî ya Çap û Belavkirinê, r 12.
[79]. Jêderê Berî, r 12.

4. Hinek caran vegotin bi xwe jî dibe bûyer û her bi xwe jî dibe çîrok.

Yanî bi tu hawî nabe û em nikarin bêyî hebûna bûyerê, roman an çîrokekê sawêr bikin, herwek bûyer jî bêyî cih û dem nabe. Roman an çîrok yanî bûyer. Pêwistiya bûyerê jî bi vebêjerekî heye wê vebêje.Helbet her bûyerek dema rûdana wê cuda ye ji dema vegotina wê û dema vegotina wê jî ji dema nivîsandin û belavkirin û xwendina wê cuda ye.

Ango egera wê yekê heye ku di tekstekê de bêhtirî demekê bi awayekî berçav hebin, yan komek bi hev re hebin, ku bi astên cuda cuda derdikevin û dibin beşek ji teknîk û tektîka tekstê. Ev dem jî di çarçoveya vegotinê de derdikevin, vegotin jî behsa bûyeran dike, lewra zincîra vegotina bûyeran deman radikêşin û nîşan didin ku dem di nav tevgera bûyeran de ne, dem jî bêyî cografya û cih nabe, lewra dibêjin: Livker û dînamoyê van hemûyan bûyer e xwîner jî di nav de, ku ew jî dema wî ji hemû demên din cuda ye. Di romanê de bandoreke bihêz di navbera bûyer û vegotinê de derdikeve, çimkî lezgînî yan giraniya vegotinê bandorê li ser awayê birêveçûna bûyeran dike, tew hokar e jî ji bo derxistina wê yekê ka gelo bûyer bûyerên rawestiyayî û sekinî ne yan livker û bi bizav in. Ji aliyekî din ve bûyer jî bandora xwe li ser rêveçûna vegotinê dike, ka gelo teknîka vegotinê çi cure ye, wek mînak vegotina bûyerên tundûtûj çêjdartir in, hokara vê jî li ba derûnnasan e û ew dikarin di warê psîkolojiya kesan de zelal bikin, li wê gorê ku pir caran bûyereke biçûk encameke mezin dide yan berevajî. Di hemû rewşan de tukes nikare wê yekê înkar bike ku"yek ji stûnên romanbûna tekstekê ji bûyerê pêk tê."[80]

Wek me berê amaje pê kir, girîngîdana (Aristotle) bi wê şêweya berçav bi bûyerê, girêdayî wê yekê ye ku bûyer pêkhateya sereke ye di dirustbûna trajediyê û herwiha di nav regezên din ên wek (kesayetî, hizr, dariştin, dîmen û stranê) de, bi şêweyeke xuya giranî pê daye, tew di pêşiya yekem a wê kategorîzekirinê de daniye. Aristotle di pirtûka (Hunera Şiîrê) de dibêje: "Ji hemû regezan girîngtir bûyer e, çimkî bêguman trajedî ne çavlêkirina kesan e, lê çavlêkirina kirde û jiyan û bextewerî û bextreşiyê ye, armanc ji jiyanê encamdana cure kirdeyeke diyarkirî ye neku xasiyetekê, bi xasiyetên xwe kesayetiya karakteran derdikeve, lê bextewerî û bextreşiya wan bi rêya kirdeyên wan bicih tê." [81] Ango em li hember vê hevkêşeyê dikarin wiha bêjin: "Jiyan bûyer e, bûyer bi xwe jî jiyan e, bi vê jî em digihin wê baweriyê ku mirov di nav xelekeke girtî ya (jiyan/bûyerê) de ye, çimkî mirov xwediyê her taybetmendiyekê bin di aliyê beolojî û kesêtî û derûnî de, ew taybetmendî tiştek in di sînorekî berteng ê kesan de dizîvirin, lê reftar û kirdeyên wan

[80]. Aram Sidîq, Estetîka Vegotinê, Raman li ser Çîrok û Romanên Kurdî û Cîhanî, Rêzê Pirtûkên Yaneya Qelemê, Weşanxaneya Yad, Çapa Yekem, Silêmanî, 2009, r 134.
[81]. Aristotle – Hunera Şirîê (Şiîrnasî), r 29.

di jiyanê de arasteya dahatû û çarenivîsa wan bi herdu rewşên bextewerî û bextreşî diyar dike û di siberoja wan de reng dide.” [82]

Eger baweriya me bi têgeha parastinê hebe, bêguman emê li baştirîn şêwe bigerin ji bo awayê parastina jiyanê, çimkî jiyan tije ye bi wan ceribandin û ezmûnên ku bi ser mirovan de hatine, ji bo parastina wê serweta mirovatiyê jî, pêwistiya me bi hêza vegotina bûyeran heye. Bêguman roman baştirîn amûr e ku mirov bikare bi rêya wê wî karî encam bide, herwek erkê romannivîs û romanê jî tê zanîn, ku wê erkê li stûyê xwe bigirin, (Ekremê Mîhrdad) dibêje: “Vegotina rastî û diyardeyên jiyanê di nav romanê de yek e ji wan babetên girîng ku ne tenê li ser asta huner û teknîka romannivîsiyê wêne û dîtin û wek encam wateyên cuda ji me re berhem tîne, lê herwiha dikare şêwazekê ji jiyanê û vegotina jiyanê ji me re binexşîne.” [83] Di dawî de ne zehmet e eger em bawer bikin ku roman jiyan bi xwe ye, çimkî “jiyan mijar û keresteya romannivîs e, herçiqasî dîrokê nanivîse divê jîr û zîrek be ji nihêniyên wê, lê serborî û cureya jiyana romannivîs ne girêdayî serketin û têkçûna berhema wî ye.”[84] Lê li tenişta vê yekê jî divê em wê yekê jî bizanin ku “roman ne guhastineke rasterast û tîp bi tîp a seranserê jiyanê bo ser kaxezê ye, lê hilbijartina tiwêjeyeke ravekirî û himbizkirî ya dîmenên pesendkirî ye.” [85]

Ligel geşbûn û pêşketina aliyên cuda cuda yên jiyana civaka mirovatiyê, lêkolîn li ser romanê wek janreke bibandor a edebiyatê berdewam bûn. Lewra em dibînin Formalîstên Rûs wek me berê got, bi taybetî girîngî danderxistina girîngiya bûyerê di romanê de û di tekstên vegotinbend de bi awayekî giştî “ew hatin li kêleka lêkolînên xwe ew şêwaz diyar kirin, ku bûyer li ser hatiye binyatkirin û bi piştgirêdana bi yasayên zimanî dabeşkirineke zanistî ji bo wan şêwazên binyata bûyerê berçav kirin”[86], ev rola ziman ji me re derdixe, di awayê binyatkirina bûyerê di teksta romanê de, çimkî ziman xwediyê desthilateke berfireh e di sîstema vegotinê de, bi wateya ku ziman di dem, kirdarên demê, tek û kom, binyata rêzimanî, danîn û rakirina di sîstema peyvê pêk tê “Li vê gorê wiha diyar e ku karê ziman di romanê de bi berawerd ligel janrên din, pir sereketir e û proseya romanê bi xwe jî bêhtir ji rêya wesfa hemereng ji himbizbûna rewanbêjî li ser aliyekî taybet” [87], lê ev şêwe reftarkirin li ba Formalîstên Rûs bi ziman re bi awayekî ji awayan girîngiya regezên din ên pêkhateya romanê kêm dike, di çarçoveya sîstemeke qalibgirtî yê zimanî de bêhnê lê diçkîne, wek mînak (VladimirPropp), ku yek ji formalîstên rûs ên navdar e

82. Mîran Celal Mihemed, Binyata Bûyerê di Romana Kurdî de, Nameya Masterê, Koleja Ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Weşanxaneya Renc, Silêmanî, 2009, r 18.
83. Enwer Hisên, Romanek di Guftûgoyê de, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapa Yekem, Silêmanî, 2006, r 108.
84. Ebdula Serac, Ber bi Istana Romanê û Nerîngehan, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2007, r 23.
85. Jêderê Berê, r 23.
86. Mîcan el Rîlî, Rêberê Rexnegirê Edebî, Navenda Çanda Erebî, Bexda, r 37.
87. Mihemed Kerîm, Teoriya Romanê, Çend Nivîskar, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2002, r 46.

bawer dike ku "kesatiya çîrokê û taybetmendiyên derûnî çend yekîneyeke guhêrbar û necihgirtî ne û beşdariyê di berhemanîna bihayê wezîfî yê tekstê de nakin, navborî kirdar li ba wî girîngtir in, çimkî eger kesatî bên guherandin dîsa kirdar cihgirtî dimînin û berdewam dibin di gihandina wan armancên ku xwe di rastkirina xeletiyan de dibîne, bi rêya bi dû hevhatina kirdarekî û hetmiyeta regeza berberiyan ku piraniya caran bi encama erênî û gihîştina bi kamîranî û serkeftinê bidawî tê." [88] Bi heman şêweyê "Todorof bi rêya ziman binyata tekstan lêkolîn dike û kirdarên di nav hevokan de ku rengpêderên bûyeran in ew neseqên ku li ser hatine binyatkirin, dike binemaya sereke ya berhemanîna wê gotara ku tekst ji bo wê hatiye berhemanîn û derbarê wê dibêje: Li gor xwezaya vegotina bûyerên çîrokan, ew neseqên ku kirdarên di nav hevokên tekstekê li ser hatiye binaytkirin, çend şêweyekê werdigirin." [89]Yanî em dibînin li ba formalîstên rûs bûyer girêdayî ziman e, ziman jî kirdeya vegotinê berhem tîne.Ji vê re jî tê gotin (şêweya vegotina bûyerê li gor binyata ziman.) Bi baweriya (RolandBarthes): "Dema em guh didin vegotinê, yanî bangewaziya hizrîna li ser xwezaya rewşenbîrî û dibe ku li xwezaya mirovatî bi xwe jî bikin." [90]

(James Joyce) dibêje: "Bi hezaran rê hene ji bo vegotina yek bûyerê, li gor wê armanca ku em wê dixwazin." [91] Lê gelo ew bi hezaran rê çend ji wan hunerî ne û wiha li me dikin ku em guhdariya babetê bikin an bixwînin?

Bextiyar Elî vê gotina Joyce piştrast dike, di romana (Êvara Perwaneyê) de ji zarê (Xendana Biçûçik) dema behsa zîrekî û jêhatîbûna (Fetaneya Xemgîn) dike, bi vî awayî behsa çendîtiya şêwe û çêja vegotinê dike û dibêje: **"Me çîrok li ser wan bajarên ku zeman di wan de sekinî ye çêkirin. Derbarê wan keçên ku xwestin ji pencereya bendîxaneyan bifirin, wan xatûnên ku xwestin li peraveke mezin bidin û nekarîn, hemû çîrok jî bi riyên cuda cuda diçûne ser êvara perwaneyan.Qehremanên me hertim nîvên wan mirov û nîvên wan giyandarên din bûn.Fetane ku çîrokbêja herî cadûbaz bû, bûnewer diafirandin ku nîvên wan ji gul û nîvên wan însan bûn, nîvên wan masî û nîvên wan mirov, nîvê wan totî û nîvên wan mirov, herdem jî êvara mirina wan bi nav dikir êvara gulan, yan êvara masiyan, yan êvara totiyan…."**(Êvara Perwaneyê, r 359).

Fetane digot**: "Xendana Biçûçik, na, ev mal dişibin gorê..ev hewş dîmena goristanê tînin bîra min."** (Êvara Perwaneyê, r 342).

**"Ev mêr wek ji ewr an ji xubar an ji tozeke reş hatibin afirandin, tevlî hevdu dibin…dev û çavên wan di nav hev de li ba dibin, laşê wan bi awayekî nemaqûl**

---

88. Azad Berzencî, Çend Rawestgehên Wêjeyî û Fikirî (Bihayê şêwe-formalîstên rûs), Weşanxaneya Murkiyan, Hewlêr, Çapa Duyem, 2006, r 238.
89. Jêderê Berê, r 239.
90. Paul Byron, Vegotin Sînorê Têgihîştinê, W: Ebdula Îbrahîm, Kultûra Biyanî, Çapa Yekem, Bexda, 1992, r 27.
91. Semer Ruhî Feysel, Romana Erebî – Binyat û Rûya, Yekîtiya Nivîskarên Ereb, Çapa Yekem, Şam, 2003, r 30.

**tevlî hevdibe, li wan dinere, ew ne ew in, lê tevî vê yekê jî ew ji xeynî xwe ne kesekî din in…"**(Êvara Perwaneyê, r 342).

Angoew çêja vegotinê ye ku tolstandinê ji bîra Şehreyar dibe û hunera vegotinê ye jî ku Şehrezad ji mirinê rizgar dike.Sihra vegotinê ye ku dihêle Xendanê tirs û dudiliyên xwe kontrol bike.Ango em dikarin bêjin vegotin yek ji binemayên girîng ên binyata hunerî ya teksta her çîrokekê ye, mercê sereke yê her karekî wêjeyî jî heta radeyeke mezin girêdayî wê rêyê ye ku keresteya wê pê tê rêkxistin û vegotin. Çimkî di edebiyatê de em rûbirûyî tiştan di şêweya wê ya seretayî de nabin, lê em rûbirûyî wan bûyeran dibin ku bi şêweyeke diyarkirî tên pêşkêşkirin, hemû tiştek jî hemû diyardeyên wê li gor wê dîtina ku jê têne pêşkêşkirin tê destnîşankirin.

Eger em vegerin ba (Balî) bi wan keresteyên pabendbûyî ku di ziman de hene (Balî) di vî warî de lêkolînek kiriye û wek pirtûk belav kiriye bi navê (Kurteyek ji Şêwazgeriyê), ku behsa derbirîna ziman dike.Her ramanek li gor (Balî) bi rêya ziman tê cîbicîkirin.[92] Em dibînin dîsa heman nerîna formalîstan eger ne tîp bi tîp be jî, lê bi şêweyeke pir nêzîk ji formalîstan, li cem (Balî) dubare dibe. Wek çawa ziman di romanê de di tekstên vegotinbend ên din de cuda ye û ev jî bûye hokara cudahiyê di şêwaz û vegotinê de, bi heman awayî bûyer di romanê de ji bûyerê di janrên din de cuda ye. Bûyer di romanê de "çînên civakî bi hemû cudahiyên xwe ve wêne kiriye, vê yekî jî nêzîkatiyeke bêhtir ji realîteyê diyarî romanê kiriye û mecala hilbijartina bûyeran ji realîteyê zêdetir kiriye. Romannivîs dikare jiyana paşa yan mîrekî bike bûyer û babeta romana xwe û di heman demê de dikare jiyana bendeyekî yan karkerekî yan herkesekî din ê nav civaka xwe bike babeta romanê û çend bûyeran ji jiyana wan kesan hilbijêre û bi şêwazekî edebî darêje û romanekê ji wan dirust bike. Herwiha mumkin e ew bûyerên ku behsa wan dike çend bûyerek bin ku bi ser kesayetiyeke dîrokî de hatine"[93], lê tiştê ku bûyeran bedew dike û wan rengîntir dike xeyala romannivîs bi xwe ye, ku tê û girîngiyê dide aliyên hûrgiliyên jiyanê û wan beloq dike, ew aliyên veşartî û nihênî ku bi hêsanî dernakevin û em (xwîner) hest bi wan nakin, heta ku di romanê de neyên berçavkirin "romannivîs pena bo derxistina bûyer û rewşên nesereke yên kesayetiyan dibe, ev jî ji bona bi hev re girêdana beşên cuda cuda yên romana xwe." [94]

(L.M.Vincent) dibêje: "Sîsika romanê karên wê yên xeyalî ye" [95] û romannivîs tucarî ji xeyalê bêzar nabe û li her cihekî hest bike babet an bûyer an her

---

92. Selîm Reşîd Salih, Şêwaz di Kurteçîroka Kurdî de, Rêveberiya Giştî ya Çap û belavkirinê, Çapa Yekem, Silêmanî, 2005, r 54.
93. Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî, Binyata Vegotinê di Dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û Romana (Şarî Mosîqare Spiyekan - Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de, Çapa Yekem, Weşanxaneya Xanî, Dihok, 2009, r 159.
94. Sadiq el Selmî, Yekîtî di Romana Yemenî de "Binyata Romanê bo Bûyera Dîrokî." www.anaween.net.
95. L.M.Vincent, Teoriya Janrên Wêjeyî, W: Hesen Ewn, Gerîngeha el Mearif, Weşanxaneya Mesni Iskenderiye, Iskenderiye, 1978, r 412.

tuxmekî din di nav romanê de xeyal tê de heye û di xizmeta tekstê de ye, romannivîs rasterast sûdê jê dibîne, lewra normal e em di nav romanekê de hinek bûyerên xeyalî û hinekên realîst bibînin, di tu demê de jî di wan deman de pêwendiya romanê ligel realîteyê bêhêz nabe û romannivîs gelek bûyerên hevawayê jiyanê pêşkêş dike û heta wê radeyê dikare wan bi diyardeyên rasteqîn reng bike, lewra ew xeyala ku di romanê de tê bikaranîn ne merc e her car bo wê yekê be bûyerên dijî realîst pê bê dirustkirin an çend bûyeran dirust bike ku di realîteyê de nebin. Lê gava romannivîs xeyalê dike ji bo dirustkirina romanê heman wan keresteyên romanê bikar tîne ku di realîteyê de bûyer bi wan dirust dibin. Heta vir xeyala romannivîs û realîteya jiyanê ligel hevteba ne, dûre romannivîs tê li şûna ku bi heman şêweya wan keresteyan ku bûyerek dirust kirine texlîda heman bûyerê bike, tê bi xeyala xwe û bi heman keresteyan bûyerên din ên nû ji me re dirust dike û cudahiya nav wan bûyerên ku di jiyanê de hene û ewên ku ew bi xwe wan dirust dike, cudahî jî di navbera bûyerên romanê û bûyerên jiyanê de ne tenê ew e rastiya wê yekê îzbat bikin, di demekê de ku em nikarin bi ya din bigihin eger ne di çarçoveya tekstê de be, lê bûyerên romanê ji bûyerên rastî pir balkêştir in. Hokara vê vedigere bo hebûna wê estetîk û ciwankariya ku romannivîs bi rêya xeyalê di tekstê de dirust dike. Ev mînakeke di (Êvara Perwaneyê) de ku romannivîs xeyal tê de bikar aniye:

**“Demsala xeyalan di çend şêweyên cuda de derket, di vê demsalê de Nesredînê Bêhnxweş di navbeyna kumbet û newal û daristanên asê de ew zeviya efsanewî û bi tenê dît, di vê demsalê de Ferîdunê Melek û Perwane ji hev hez kirin, di vê demsalê de xeyalên rêwîtiyê, sedên mêr û ciwanan berbi buhiştên efsanewî bir. Xeyalên işqê, sedên jin û mêran ji jiyana wan a biçûk û aram derxist, kor anîn ser xweziya dîtinê, kerr li ser fantaziyên deng anîn ser kolanan û xistin semayê de, zikê jinên kurdûndebi zarokên xeyalî avis bûn, mêrên pûçbûyî çend dest û lingên efsaneyî li wan zêde bûn, zarokên bêziman dest bi hûnandina helbestên efsanewî kirin. Demsala xeyalan li hemû cihan jiyan diguherand û dikir xeyalistaneke kesk, di vê xeyalistana kesk de kalemêrên ji derbketî li ser dikên bazarê, li ber rojê xwe vedizilandin û behsa hêviyên xwe dikirin, jinên tenê û nexweş yên li ber teştên zingargirtî yên cilşûştinê, li ber deriyan hev didîtin û digotin `Giring ew e, paşeroja me, bi destûra Xwedê, xweş û şêrîn û geş e`. Parsek li ser keviya riyan diketin û xewnan weke nafûreyan ji nav çavên wan birûsk dida, helbestvanan di pesindana xweşiyên paşerojê de hostetiya xwe nîşan didan, çîroknivîsan digotin divê dawiya hemû çîrokan weke paşeroja xwe bi şadiyê biteyisin. Pêşangeh tije bûn bi tabloyên ecêb ku lehiyeke qeşeng a rengan hemû fîgûr û hêl û wateyên wan nuxumandibû. Di wê demsalê de hemûşkan xwena wê yekê didît ku cîhan berbi baştir here.“** (Êvara Perwaneyê, r 111) Bi rastî ev çi demsaleke xeyalî û efsaneyî ye, ku xeyala nivîskar ew tevlî çend bûyerê realîst kiriye?

Di hunera bûyerê di Êvara Perwaneyê de pêşî em amaje didin ku raman û mijara vê romanê keresteyeke hêja ye ji bo hunera romanê û bûyereke zindî ye

ûdikare di janreke wek romanê de şênber bibe. Di dawiya romanê de piştî ku vebêjer (Xendana Biçûçik) nivîsandina çîrokê xilas dike û dibêje:**"Dizanim jî Fetane bi hêrsbûn û xîret û çavnebariyeke mezin vê çîrokê dixwîne, lê belê cara dawî min hembêz dike û dibêje, `Xendan, xem nake, xema min nexwe, bila wiha be, bila wiha... "** (Êvara Perwaneyê, r 380) ku ev jî mînakeke ji pêşxistina bûyerê, em jî di destnîşankirina aliyên çîroka Xendanê de dipirsin: Gelo Fetane di xwendina çîrokê de çavnebariya şiyan an îmkanên vegotin û nivîsandinê yên Xendanê dike? Di destpêka romanê de rih û koka bûyerên (êvara perwaneyê) bûyerên wê êvarê bi demsala xwînê dest pê dike û du rehendên sereke pêk tîne ji bo dariştina seranserê cîhanê, bi wateya demsala xwîn û qurbanî dibe melbendek ji bo teqandina tiştan û destpêka hemû bûyeran yek li pey yekê, ku ew herdu rehend jî ev in:

**Yekem:** Bersivdan û helwest wergirtina qehremana sereke (Perwane) li dijî wê dab û nerît û paşxana civakî ku di berhema olê de mane û ji wan bêzar e û ji aliyê xwe ve sînorekî ji wan re datîne, lê bi derketina ji wan dijberiya xwe nîşan dide. Ev tîrêjên destpêkê yên du cîhanên dijî hev tê de reng dide, ku piştre derdikevin. Perwane ji bo derbirîna wê **rewşê"Di dawî de bi hesreteke ji nişkê ve got `Xendana Biçûçik, tu dizanî ezê cejneke din ne li vir bim?`“** (Êvara Perwaneyê, r 11) ku ev mînakeke din a pêşxistina bûyerê ye ku pêşî pêşbînî dike, lê piştre pêşbînî dibin rastî û dibin pêşxistina bûyerê.

**Duyem:** Gihîştina bi pêwendiya di navbera karakterên sereke yên romanê de û yekem dîtina Ferîdûnê Melek (yekem dîtin bi nerîna Xendanê.)

Bûyer di romanê de wek regezên din ên pêkhateya laşê tekstê, şêwaza binyata taybet bi xwe heye.Armanca diyarkirina binyata bûyerê vedigere wê yekê ku romannivîs bikare bi rê û şêweyeke kêrhatî bîr û baweriyên xwe bigihîne xwîner. Diyar e ev piştî derketina holê ya têgeha binyatgeriyê dirust bû. Nemaze girîngîdan bi lêkolîna derbarê neseqa binyata bûyerê û tekstên çîrokvanî yên din, ligel derketina formalîstên rûs derket. Reng e ew diyarkirina (Viktor Shklovsky) yek be ji baştirîn wan şêwazên binyata bûyerê di romanê de.Bi baweriya Shklovsky mumkin e bi çend rêyan regeza bûyerê bê binyatkirin "ew jî pêk tên ji binyatên şûnketin, têkilhev, lixwegirtin, hevsengî, bazineyî û têkel“ [96] Diyar e mumkin e hinek ji wan neseqan ji ber lihevçûna wan ligel hevdu bên têkilkirin û bibin yek, wek ku di neseqa lixwegirtin û bazineyî de rû dide û neseqeke nû tînin holê. Bêguman li tenişta wan neseqan romannivîs dikare ji bo nîşandana bûyeran, sûdê ji teknîkên cuda yên vegotinê jî werbigire. Mînakên gelek romanan li ba me hene ku bi şêweyeke berçav sûd ji Flashback hatiye wergirtin û rûyekî estetîk diyarî tekstê kiriye û xwîner jî çêjeke rasteqîn jê werdigire.

---

[96]. Şûca Muslim Dexîm el Anî, Binyata Hunerî ya Romana Erebî li Iraqê, Têza Doktora, Koleja Edebiyatê – Zanîngeha Bexdayê, 1987, r 16.

(Todorof) jî amaje dide cureyên wan neseqan û dibêje: Yek ji wan neseqan rêkxistina kronolojî ye*, ku bûyer di zincîreke yek li pey yek de tên, lê li gor pêwistiya siruşta çîrokê mumkin e arasteya wê bê guherandin. Wek mînak dema encama bûyerekê berhemanîna bûyereke nû be û li derveyî rêveçûna xwe ya siruştî yan em di heman demê de rûbirûyî zêdetirî realîte û tevgerekê hatin, ku derfeta piştguhxistina wan nebe, em penayê dibin ber neseqên din ji bo berdewamîdana bi çîrokê û gihandina rêveçûna bûyeran bi wê encama ku ew tekst ji bona wan hatine afirandin, bi pileya yekem pişt bi regeza bûyerê girêdidin, çimkî bûyer ew kereste ne ku di wan tekstan de pir derdikevin û ji ber wan neseqên li ser hatine binyatkirin arasteya wê peyamê diyar dikin ku armanca tekstê ye.“ [97]

Eger em berê xwe bidin pirtûka (Çêja Tekstê) emê bibînin li ba (RolandBarthes) jî bûyer girîngtirîn regeza binyata teksta romanê ye, lê nabe em veşêrin ku li tenişta girîngîdana (RolandBarthes) bi bûyerê wek regezeke sereke ya teksta romanê, di heman demê de girîngî daye ziman jî û dibêje: Kirdara rabirdûya sade wek kevirê bingehîn ê proseya vegotinê tê hejmartin û rolên wê pêk tê ji guherandina demên cuda yên yek li pey yekê yên jiyan derbaskirinê ji bo çend bûyerên romanê ku bi ezmûneke hebûngerîtî têne arastekirin ber bi pêwendiyeke lojîkî ligel çend bûyerên din, çimkî kirdara rabirdûya sade proseya vegotinê dike lojîkî bi mebesta binyatkirina çend cîhan û gerdûn û efsane û dîrokên dirustkirî. Herwiha kirdara rabirdûya sade gava derbirîna bûyerekê pê tê kirin wiha dike ku diyarde nas û rasteqîne derkevin, ev belgeya dahêneriya metinê ye. [98] Gewdeyê metinê romanê di aliyê pêkhatinê de ji beşên: Destpêk, teşekirin, lûtke û dawî pêk tê, ku her yek ji wan jî taybetmendiya xwe heye. Herwiha çend regezên sereke jî hene ku rasterast beşdarî binyata wê pêkhateyê dibin. Ew regez jî li tenişta regeza bûyerê pêk tên ji: (kesayetî, cih û dem), ku hemû rasterast têkildarî hev in. Yek ji wan regezên ku bi berdewamî di cemserekî pêwendiyan de dubare dibe girîngiyeke wê ya berçav heye regeza bûyerê ye. Ev jî wiha dike ku girîngiyeke zêdetir a bûyeran di neseqan de hebe, tew hin caran erkê kontrolkirina wan pêwendiyan li stûyê xwe bigirin.

Xuya ye ev pêwistiyeke sereke ye ji romanê û hemû metinên vegotinbend ên din re wek çîrok, kurteçîrok, novlet û ...hwd, çimkî ew cure metin hunerek in ku pişta xwe bi vegotinê girêdidin ji bo behskirina bûyeran. Proseya vegotinê bi rêya bikaranîna daneyên ziman tê derbirînkirin, lewra em dikarin van herdu pêwistiyan wek du taybetmendiyên her metineke romanê bijmêrin. Ji ber ev herdu taybetmendî bandorê li ser stûnên sereke yên romanê dikin ku ew jî "stûna sêkuçke ya

---

[97]. Mîran Celal Mihemed, Binyata Bûyerê di Romana Kurdî de, Çapa Yekem, Weşanxaneya Renc, Silêmanî, 2009, r 24.
[98]. RolandBarthes, Nivîsandin di Pileya Zero de, W: Mihemed Nedîm Xişfe, Navenda Pêşxistina Şaristanî, Çapa Yekem, Heleb, 2007, r 32.

(romannivîs+nerîn+hêma) ye.“ [99] Herwiha bandora wan li ser teknîkên cuda cuda yên din ên romanê heye wek nîgarkêşî, muzîk...hwd, yan dîtina şêwazên nû wek: Herikîna hiş, monolog, montaj, falshback...hwd, ku dibin pîvana ciwansaziyên hunera romana nû. [100]

Lewma em dikarin bêjin regezên hunerî yên binyata metinê romanê her yek ji wan girîngiya xwe ya taybet heye, ji bo berhemanîna teksteke kemilî ya hunerî pêwistiya me bi her yekê ji wan heye, lê tevî vê yekê jî rêzbendiyek heye ji bo pileya girîngî û asta beşdarbûna her yek ji wan regezan di tekstê de, ku di rewşeke wiha de regeza bûyerê pêgeha pêşeng werdigire, ji ber ku di berhemanîna wê gotarê yan wê peyama ku tekst ji bona wê hatiye afirandin bi roleke sereke radibe.

### 1.8.2 Bûyer di navbera teksta romanê û teksta dîrokê de

Ji bo şîrovekirin û nasandina têgeha bûyerê di her yek ji romanê bi cuda û dîrokê bi cuda de, em dikarin ji çend aliyan ve li ser biaxivin, em her kîjanê ji wan aliyan jî hilbijêrin, dîsa di encamê de emê herin ser heman rêveçûna giştî ya mijarê, ku ew jî cudakirin e di navbera bûyerên teksta romanê û bûyerên teksta dîrokî de. Bi aliyekî din de gotina me li ser awayê bikaranîna bûyerên dîrokî di konteksta metinê romanekê de. Lewra emê herin ser beshkirina erkê her yek ji romannivîs û dîroknivîs, ku di dawî de berhema têkoşîna her yekî ji van herduyan jî di encama vegotina bûyeran di roman û dîrokê de têne dîtin. Xuya ye çavkaniya vê lênerîna me dîtin û baweriyeke berfirehtir e, ku bêguman ew jî dîtin û baweriya zana û rexnegiran e û tevahiya meseleyê jî girêdayî xwezaya tekstên vegotinbend ji aliyekî û tekstên dîrokîji aliyekî din ve ye, heta radeya ku (Milan Kundera) dibêje: "Wek romannivîsekî hertim hest dikim di hundirê dîrokê de me, ango ez li ser rê rawestiyame û ez wan kesan didim peyivandin ku dane pêşiya min.“ [101]

Herwiha rexnegirekî wek (Graham Huff) tekez dike ku “Her romaneke dîrokî ye, egerem bi wateya wê ya giştî romanê lêkolîn bikin, ev ji ber pêwendiya xurt û bihêz a wê hunerê ye bi realîteya jiyan û cîhanê û rengpêdana wan bi şêweya hunerî“ [102]Ji aliyekî din ve (Aristotle) derbarê cudahiya navbera bûyerên romanê û bûyerên dîrokî de gotiye: Dîroknivîs behsa tiştekî dike, ku rû daye û helbestvan behsa tiştekî dike ku dibe ku rû bide“ [103] Ev wiha dike em bawer bikin her romanek bi awayekî ji awayan amajeyekê li ser dîrokêvedihewîne, bi şêweyekê wek em dizanin, yek ji şaxên naskirî yên janra romanê ji romana dîrokî pêk tê, lê ev nayê

---

[99]. RolandBarthes, Çêja Tekstê, W: Îsmaîl Zeraî, Weşanxaneya Menare, Çapa Yekem, Hewlêr, 2007, r 34.
[100]. Herêm Osman, Teknîk di Sê Çîrokên Aram Kakey Felah de, Kovara Henar, j (44), 2009, r 18.
[101]. Milan Kundera, Galte û Romana Nivîsandî li jêr hêla pehniyê ya 35 de, W: Awat Ehmed, Kovara Gelawêja Nû, j (26), 2001, r 14.
[102]. Mîran Celal Mihemed, Binyata Bûyerê, r 48.
[103]. Hunera Şiîrê (Şiîrnasî), r 37.

wateya ku her di romanê de çavê me li nîşane û dirûva serdemeke dîrokî ket, em bêjin ev dîrok e“ [104] çimkî di dawî de gelek cudahî di navbera roman û dîrokê de hene û her yek ji wan ji dîtingeha xwe ya taybet bi bûyeran û awayê nivîsandina wan re tevdigerin "dîrok her bûyerekê û hûrgiliyên tevahiya serdemekê ji me re vedibêje, êdî ew bûyer girîng û karîger bin an bûyerên normal bin“ [105]Hevdem wek (Kemal Mezher) dibêje:"erkê mezin ê dîrokê pêk tê ji diyarkirina serpêhatiyên hemereng ên jiyana mirovan bi hev re yan cuda, li gor qonax an beşekê ji qonaxê, ji bilî destnîşankirina hêza livker û taybetiyên wê û nirxandina wan guhertinên ku bi ser de hatine, ligel zelalkirina dersên wê li gor giranî û mezinahiya wan“ [106] herwiha wek çawa zevînas (geologist) madeya sereke ya karê xwe ji paşmayên xwezayê bidest dixe û bi rêya wan belgeyan bidest dixe, her wisa dîroknivîs jî ji bo zanîna bûyerên borî, pena dibin ber keresteyên madî“ [107] lê roman ku karê edîb û romannivîs e, bêhtir girîngiyê dide aliyê zatî û xeyalê û amaje dide bûyerên giştî û mezin û wan tevlî babeta sereke û bingehîn a romana xwe dike, bi şêweyeke berçav ku em dikarin pir bi zelalî cudahiyê di navbera karê romannivîs û dîroknivîs de bikin, ev zelalkirineke baş diyarî me dike ji bo nasîna roman û dîrokê, çi di aliyê armancê û çi di aliyê şêwazê û çi jî di aliyê programê de.

Xaleke sereke di vê navê de dimîne, ku ew jî vedigere ji bo nêzîkiya roman û dîrokê ji wê nerîngeha ku herdu kar li ser bûyerê dikin û herdu karê wan "vegotina babetên rabirdû ye ji nerîngeheke çîrokvanî û paralelîpêşveçûna bûyeran.“ [108] Lewra her vegotineke romanê bi mercê ku neçe qalibê xeyala zanistî yan babeteke suryalîst, hevdem ligel her vegotineke dîrokî jî li tenişta temamiya aliyên jiyana karakterên cuda cuda, di nav siyaqeke dîrokî de derbas dibe. Her çawa em behsa tevgera romannivîs û dîroknivîs bi bûyerê re bikin, nabe em wê rastiyê ji bîr bikin ku"romannivîs tu carî ji xeyalê bêzar nabe û li her deverekê hest bike babet an bûyer an her regezeke din di romanê de xeyal tê de heye û di xizmeta tekstê de ye, romannivîs rasterast sûdê jê dibîne. Lewra normal e em di nav romanekê de hinek bûyerên xeyalî û hinek bûyerên realîst jî bibînin.“[109] Ev cure ji nerîna lêkolînvan û rexnegiran derbarê janra romanê, ji wê şêwazê çavkanî girtiye, ku bi şêweyeke giştî romannivîsên pêşin di binyata regezên romanê bi giştî û bûyerên wê hunerê de bi taybetî pêrew dikirin, ango dema bûyerên realîteya rastî yên cîhana derve dikirin

[104]. Enwer Hisên, Romanek di Guftûgoyê de, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapa Yekem, Silêmanî, 2006, r 15.
[105]. Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî, Binyata Vegotinê di Dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û Romana (Şarî Mosîqare Spiyekan - Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de, r 115.
[106]. Kemal Mezher Ehmed, Dîrok, Kurtebehseke zanistî ya dîrokî – Kurd û Dîrok, bi alîkariya emîndariya giştî ya lawan hatiye çapkirin, bêyî dîrok û cihê çapê, r 8.
[107]. G. Hernshow, Zanista Dîrokê, W: Ebdilhemîd el Ebadî, Weşanxaneya el Hedase, Çapa Duyem, Libnan – Beyrût, 1982, r
[108]. Cemal Mehmûd Hecer, Derbarê Romana Dîrokî û Vegotina Dîrokê, 20.01.2016, www.forum.egypt.com
[109]. Binyata Vegotinê di Dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û romana (Şarî Mosîqare Spiyekan - Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de, r 158.

havêna afirandina romanekê, hewl didan heta rêjeya herî bilind realîteya bûyerên vegotî di romanê de biparêzin, bi"darîştin û rêzkirina bûyerên afirandî di zincîreke yek li pey yekê ya dîrokî de û derxistin û girîngîdan bi rola kesayetiyan di dirustkirina dîrokê de.“ [110] Çimkî destpêkên janra romanê vedigerin bo destpêkên Rênesansê û derketina civaka burjwaz, ango hevdemî serdemekê ye ku berberiya navbera kilîseyê û kelehê di asteke geşbûyî de bû. Lê karîgertirîn hokar ku bêhtir rexnegir teşwîq kirin bi dîtineke dîrokî janra romanê lêkolîn bikin, afirandin û belavbûna (romana dîrokî) bû, ku romaneke karesat û ceng û bûyerên dîrokî yên berçav dike çavkaniya afirandina xwe û ji bona jinûve rêkxistina jiyanê hewl dide û dubarekirina keş û hewaya serdemeke cuda ji wê serdema nivîskarê wê. [111]

Lewra ev rastî nayê wateya ku êdî pêwendî di navbera roman û realîteyê de ji ber bikaranîna xeyalê qels û sist dibe û vedibire, çimkî li hêla din dîrok jî ku divê xwe ji xeyalê biparêze û jê dûr bikeve ku her wisa ye jî, lê rastî derdekî din dibe ku ew jî ji vê pêk tê:

**Yekem:**Ji hemû babetên din bêhtir dikeve ber sextekariyê, çimkî ewê dinivîse nikare bêalî be, eger bixwaze wiha be jî, çimkî ew tomarkirin ji kultûr û baweriyeke pêşwext derdikeve. Ji ber ku bi şêweyekê li bûyeran dinere û wan hildibijêre, ku di xizmeta nerîna wî de bin û rastiya bîr û nerînên wî teqez bikin.

**Duyem:** Piraniya demê yê ku dîrokê tomar dike û rêveçûn û dirûvekî taybet didiyê kesê serkeftî ye, serkeftî bi qest dixwaze rol û girîngî û mêrsaxiya xwe li ser hesabê binketî nîşan bide, bi awayekî ku hemû tevger û amajeyên ku dike nîşana zîrekî û dûrbîniya wî be di heman demê de lehengiya yê windakirî ji holê radike û sîfetên neyînî dide wî. Îcar ji ber ku dîrok ne tenê tomarkirina wan qewimîn û bûyeran e ku qewimîne, lê di rêza yekem de bîreweriya siberojê ye jî, ango yê ku wê dinivîse bi hişyarî û ji bo armanceke taybet vê yekê dike. Bi vî rengî dîrok dibe pîşe, tewwindakirî jî dîroka xwe dinivîsin. Bi armanca şandina egerên serkeftinê ji bo siberojê, bi rabirdûyê re tevdigerin.

Kêşe û pirsgirêka dîroknivîs bi bûyerê re ji wê yekê dest pê dike, ku "heqîqeta reha nîne û li ba tukesî jî nîne, lê yek ji sîfetên dîroka nivîsandî bi taybetî dîroka fermî ew e, ku dixwaze wê bike heqîqeteke reha û piştgiriya wê bike.“ [112] Lewra em dibînin dîroknivîs li ser temamiya proseya vegotin û tomarkirinê serdest nabe, çimkî yek ji taybetmendiyên dîrokê ji tomarkirina bûyeran pêk tê, wek ku qewimîne û di realîteyê de şênber bûne. Lewra karê dîroknivîs dibe karekî dijwar, çimkî bi dû rabirdû de diçe heta bigihe heqîqet û teoriyan, li tenişta vê jî ziman û

---

110. Arî Osman Xeyat, Binyata Bûyerê di Romana (Paşa Kuştin) a (Xusrew Caf) û (Beriya Ku Başoke Bifirre) ya (Ebdilxaliq Rikabî), Lêkolîneke Danberhevkarî ye, Weşanxaneya Narîn, 2011, r 60.
111. Ebdilrehman Munîf, Ronahiyek li ser Romanê, W: Şîrîn. K, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2006, r 77.
112. Jêderê Berê, r 81.

şêwaz nîşandana tevgera kesayetiyan piştguh naxe, lewma nikare wek pêwist hemû bûyeran destnîşan bike û kom bike. Wekî din dîrok deriyên xwe ji romannivîs re vedike, lewra ew keresteya dîrokî çiqasî berdest û hin caran jî bi hêsanî were dest, lê girîngî û armanca wê li ser wê şêwazê dimîne ku romannivîs mameleyê pê dike.

Ev bawerî gotineke (Selman Ruşdî) tîne bîra me ku dibêje: "Heqîqtea romandi wê yekê de ye ku wan tiştan tomar dike ku dîrokê ew piştguh kirine, û wan tiştên jibîrkirî dinivîse ku dîrok wan nabêje. Li vir romannivîs tê da tiştekî cuda bêje, tiştekî ku bi xwe kifş kiriye û kesî beriya wî bi wî rengî negotiye, bi vî rengî jî hewldana wî hêjayî wê yekê dibe ku bimîne û dikare tiştekî nû bixe ser dîrokê, gava romannivîs vê yekê dike wek dîroknivîs nayê wesfkirin (bi wateya wê ya berbelav) û nabe alternatîfê dîroknivîs,lê dibe xwînerek ji curekî taybet ji bo qonaxeke dîrokê yan babeteke dîrokî, lê li gor nerîngeheke nû û taybet.“ [113]

Ev dîtingeha (Ebdilrehman Munîf) ji bo romannivîs, cudahiya navbera bûyera romanê û bûyera dîrokî, bi bedewî derdixe, ji ber vedigere cudahiya navbera awayê tevgera romannivîs û dîroknivîs bi bûyerê bi xwe re. Herwekî (Bextiyar Elî) dibêje: "Cudahiya mezin a navbera dîroknivîs û romannivîs ew e ku, dîroknivîs bi wê demê jî ku guh dide karakterên biçûk û regezên nesereke, mebesta wî diyarkirina pêwendiya wê regezê ye bi aliyekî giştî ve, ku dikeve piştî xisûsiyet û taybetmendiya wan tiştan. Tiştê li ba dîroknivîs girîng e ew e ku ew tişt bi çi şêweyeke rasterast û nerasterast girêdayî bûyerên mezin ên dîrokê ne. Romannivîs heta di wê demê de jî ku behsa bûyerên dîrokî û realîst dike, ji bo tiştên giştî nagere, lê mebesta wî li pişt tiştên giştî xisûsiyet û taybetmedniya tiştên hûr şênber bike.“ [114]

Heman nerîn li ba (Şêrzad Hesen) jî dubare dibe ku dibêje: "Romannivîs di berhemanîna romanekê de dîrokê kopî yan dubare nake, romannivîs wan valahiyan tije dike ku dîrok wan vala dihêle, yan wan wextan tomar dike ku dîrok wan piştguh dixe. Romannivîs bi wateya wê ya mirî karê wî bi dîrokê tune, di edebiyatê de tê ser rûpelan, lê hertim wiha tê ku mirov mitûmat dibe ku ji ber çi ew hemû hûrgiliyên balkêş û sosret nedîtine ku dîrokê derbas kirine, romannivîs perdê ji ser wan hetîketiyan radike ku dîrok çavên xwe li hember wan digire.“ [115]

Wek mînak di Êvara Perwaneyê de çend demên dîrokî ji me re zelal dibin. Emê du mînakên dîrokî yên vê romanê wek nimûne bilêv bikin:

**"...Em di xakekê de derbas bûn ku tê de hestiyênhezar û hezarên lawiran, ji qeraxa cadê heya wî serê asoyan komîserhev bûbûn, şofêr digot: "Ev cebelên mezin di jehe baranên par de tarûmar bûn...“**(Êvara Perwaneyê, r 226) Ev gotina

113. Ebdilrehman Munîf, Ronahiyek li ser Romanê, W: Şîrîn. K, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2006, r 82.
114. Hevpeyvînek bi Bextiyar Elî re, Kovara Raman, www.ramn-media.net.
115. Çend hevpeyvînên neweşandî ligel Romannivîs (Şêrzad Hesen), ev berhem hatiye amadekirin ji bo çap û belavkirinê ji aliyê Weşanxaneya (Renc) ve, r 132.

Xendanê ye dema bavê wê û metika wê, wê û Fetaneya Xemgîn dibin ji bo dîtina merasîma kuştina (Perwane û Mîdyaya Xemgîn) Baş e kîjan Kurd heye nizanibe ku jehrabaran par, mebest jê kîmyabarana Helebceyê ye, ku di fikr û bîrdanka her krudekî de tucarî nehatiye jibîrkirin û ne jî tê jibîrkirin, ku di 16.03.1988an de qewimî? Û xwîner bi rêya peyva (par) têdigihe ku dema vegotinê di dema niha de divê sala 1989an be?

Duyemîn mînaka dîrokî dîsa ji ser zarê Xendanê ye ku dibêje:**"...min ji mêj ve biryar dabû ku êdî wê tobexaneyê biterikînim û vegerim û di wî xaniyê vala û tarî de jiyanê bidomînim û wan pereyan bo jiyanê terxan bikim û xwe ji bo vegotina vê çîrokê amade bikim. Di wan deman de jî ji nişkê ve dewlet ji hêzeke herî mezin tûşî şikestineke mezin hat û hêdî hêdî şîrêzên wê têk çûn, hejariyeke bixof berê xwe da welêt, çend hêz û partî û komeleyên sosret serê xwe ji bin axê derxistin, li tobexaneyê min nikarîbû û min nedixwest jî guh li çîroka wan guhertinên sosret û bilez ên welêt bigirim. Tena pêwendiya min bi wê xerabatê ve bi rêya vemirandina berdewam a elektrîka dibistanê bû..."** (Êvara Perwaneyê, r 250-251).

Eşkere ye li vir digel ku rasterast tu berwar û dîrokek nehatiye behskirin, mebesta vebêjer dawiyên sala (1990 û bihara 1991ê) ye, ku dewleta Iraqê di encama dagîrkirina dewleta (Kuwêtê) de têkçûneke mezin dît û serhildan li Kurdistanê pêket û çend partiyên siyasî li Kurdistanê derketin holê. Tewzîfkirina demên dîrokî bi vê şêweya nerasterast, wê hestê dide xwîner ku ew ne babeteke dîrokî, lê karekî hunerî yan romanekê dixwîne.

Bi mikurhatina lêkolînvan û rexnegiran ev taybetmendî di edebiyatê bi giştî û hunera romanê bi taybetî de heye û pêk tê ji rakirina perdê ji ser realîteyên piştguhkirî yên civakê û aliyên veşartî yên tevgera takekesên wê, di hundirê vegotina çîrok û serpêhatiyên wan ên taybet. Yanî ji bilî ku roman dikare bi rêya wan hûrgiliyên ku di vegotina çîrok û serpêhatiyên taybet û veşartî berçav dike, wan derzan tije bike ku dîrokê li şûn xwe hîştine, di şiyana wê de heye bibe çavkaniyeke sûdmend ji bo têgihîştin û lêkolînkirina hinek dab û nerît û taybetmendiyên takekesan û wek encam tevahiya civak û neteweyê.

### 1.8.3 Bûyer û Romana Dîrokî

Di birrê borî de me ronahî xistser bûyera romanê û bûyera dîrokî, ku bi kêmanî li vir amadebûneke me hebe ji bo axaftina bi du arasteyan, hem li ser (romana dîrokî) û hem li ser (bûyer di romana dîrokî) de, ji bo vê jî pêwist e em vegerin bo tarîfkirineke bilez a her yek ji têgeha (romanê) û (dîrokê) ku bêguman pirsa pênasekirinê di her dem û kêliyekê de yek i biryarên dijwar li pêşberher lêkolînekê ye. Di destpêka lêkolîna me de, me têgeha romanê nîşan da û em li ser axivîn. Lewma ewqas bes e eger bi awayekî giştî di pênaseya romanê, derbarê (têgeha romanê) em bi vê bersivê dest pê bikin, ku hertim li hember pirsa (roman çi

ye?) tê danîn, ku diyar e (roman: Çîrokeke dirêj e.) Hinek rexnegirên din ên romanê, romanê wek "mîratgira rewa ya dîrokê wesf dikin û wê hunerê wek çîrokeke xeyalvanî, ku siruşteke wê ya dîrokî ya kûr heye“ [116] pênase dikin. Derbarê pênaseya (têgeha dîrokê) jî, eger ji pênaseya romanê ne girantir be, ne hêsantir e jî, çimkî nabe em bi çavekî biçûk li dîrokê binerin û em wiha bawer bikin ku dîrok bi tenê "ji tomarkirina bûyerên rabirdû, ku di demeke diyarkirî de qewimîne û...hwd pêk tê.“ [117] Lewra mumkin e bi awayekî giştî em dîrokê deynin wek karnevaleke mezin a deng û reng e, dinyayeke berfireh a dijayetî û cemsergîrî û aştî û ceng û poşmaniyê ye, di wê meydanê de yasayeke giştî û prensîbeke seranserî nîne, ku hemû tiştên cuda di yek hevkêşeyê de kom bike, bi wê wateya ku dîrok parêzera rabirdû ye, çimkî di dawî de her bi xwe jî xwediyê yekem vegotina xwe ye.

Ew herdu pirsên li jor me digihînin pirseke bi vî rengî: Gelo di vê karnevala mezin a dîrokê de, rola romanê yan karê wê çi ye? Di vî warî de (Îsmaîl Heme Emîn) dibêje: "Roman bi xwe nivîsandina dîrokê ye.“ [118] Ango her çawa em destê xwe dirêjî bersivawê pirsê bikin, hevdem e bi hewldana me ji bo nasandina liqekê ji janra romanê, ku ew jî (romana dîrokî) ye, çimkî divê em bizanin ku alozbûna rewşa jiyana civakî û aborî û siyasî û kultûrî, hokareke mezin e daku roman jî wek hemû janrên din ên edebiyatê çend liqên wê peyda bibin, wek "romana civakî, romana romantîk, romana polîsî, romana dîrokî, romana tecrîbî, romana perwerdeyî, romana bûyerî, romana derûnî û ...hwd“ [119] û bêguman çend tekstên me yên wêjeyî jî hene, ku dikevin qalibê yek ji wan cureyên janra romanê.

(Gorj Locach) di danasîna romana dîrokî de dibêje: “Romaneke dîrokî ya rasteqîn e, ango romaneke niha tevdide û hevçax bi awayekî tê de dijîn, wek ku dîroka rabirdûya wan bi xwe be.“ [120]Hevdem romana dîrokî karekî hunerî û wêjeyî ye, ku dîrokê ji xwe re dike kereste, lê dîrokê tîp bi tîp wek wê venaguhêze, bi qasî ku dîtingeha taybet a romannivîs tê de tê wênekirin, ev jî ji bona derbirîna tecrûbeya jiyana xwe, yan helwesteke taybet bi wê civaka ku tê de dijî, lewra"aliyekî romana dîrokî ew e ku ligel wan bûyer û zeman û karakterên realîst ku hebûn tevdigere, lê bi dîtineke cuda û nû, lê bêyî ku wan biguhere.“ [121]

Tiştê ku di romana dîrokî de tê têbînîkirin girîngîdana bêsînor a nivîskar bi aliyên zatî ye, ev jî têkildarî wê serdemê ye ku tê de romana dîrokî "di destpêka

---

[116]. Mihemed Riyad, Tewzîfkirina Mîratê di Romana Erebî ya Hevçax de, Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Ereb, Çapa Yekem, Şam, 2002, r 104.
[117]. Cemal Mehmûd Hecer, Derbarê Romana Dîrokî û Vegotina Dîrokê, 20.01.2016, www.forum.egypt.com
[118]. Twana Emîn, Menfa û Xwendin, Çend Gotûbêjên Wêjeyî, Weşanên Paşkoya Rexeney Çawdêr, Silêmanî, J (15), 2008, r 369.
[119]. Cewad Mistefa, Roman çi ye? Çend Nivîskar, Serastkirina: Hejar Rehîmî, Dezgeha Lêkolîn û Belavkirinê ya Mukiryanî, Weşanxaneya Xanî, Dihok, Çapa Yekem, 2008, r 15.
[120]. Ebdula el Xetîb, Derbasgeha Romana Dîrokî, www.odabasham.net.
[121]. Ebdilrehman Munîf, Ronahiyek li ser Romanê, r 79.

sedsala 19an de û di serdema hilweşandina Napoleon de derket holê û berhema (Veorlî) ya (Valter Skat) di sala (1814)an de belav bû“ [122] Lewra pirsa gelo ka romannivîsê dîrokê girîngiyê dide derxistin an tewzîfkirina ezmûneke taybet a jiyana xwe, yan behsa helwesta taybet a jiyana civakî ya civaka xwe dike û wiha bîr dike ku dîrok bi giştî ji dîroka taybet a mirov bi xwe pêk tê, vedigere wê hesta romantîk ku li ba romannivîs heye, çimkî em dizanin serdema derketina romana dîrokî hevdem e ligel "guhdana mezin a romantîkan bi dîrokê, ku vê jî wiha kir di dawiyên sedsala 19an de mecalê bîrkirin û kemilîbûna wateya nû ya dîrokê derkeve holê.“ [123] Ev diyarkirin û destnîşankirina serhildanê/derketinê nayê wê wateyê ku dîroka romanê hewldanên bi wî rengî tê de berçav nekevin, çimkî di sedsalên 17 û 18an de gelek roman hatin nivîsandin ku naverokeke wan a dîrokî heye, herwiha mumkin e em dubare nivîsandina dîroka kevin û efsaneyên çaxê navîn wek piştxana romana dîrokî wesf bikin.“ [124] Belge jî ji bo selmandina vê nerînê ew e ku, heta dawiya sedsala 19an nerîna mirovatî li dîrokê cuda bû ji nerîna me ya îro li ser heman dîrokê, li wê gorê ku di wan serdeman de tew ji aliyê romannivîs bi xwe jî wek janrekê ji janrên huner û edebiyatê li dîrokê dihate temaşekirin û her bi vî awayî jî tevger pê re dihate kirin, tew di nav gelên Ereb de jî heman têgihîştin berbelav bû. Lewra dîrok çalakiyeke hizrî ya mirov e û kar li ser zindî hîştina rewşa jiyana giştî dike, di demekê de ku roman jî heman çalakiya hizrî ya mirov e, lê roman li hember hêza windakirin û piştguhxistina diyarde û bûyer û helwestên taybet ên mirov radiweste, di nav diyarde û helwestên giştî, lewra cudahiya navbera erkê wan herdu aliyan sînorê navbera nivîskarê romana dîrokî û dîroknivîs ji me re diyar dike, li wê gorê ku romannivîs rola wî alî dibîne di derbaskirina tiştên biçûk ên jiyanê.

Herwek (Gorky) dibêje: "Mumkin e trajediyeke dîrokî ya mezin bi rêya çarenivîsa mirovekî asayî nav gel bê wênekirin. Ev wiha li me dike ji pencereyên teniştê em li dîrokê binerin, her bi rêya van pencereyan derfet ji me re peyda dibe da em mezintirîn rûbera heqîqeta vê jiyanê vebêjin, bê sansur û qeyd û bend û herwiha sextekarî“ [125], bi vê yekê jî em tê derdixin ku romannivîs erkê dîroknivîs nalîze, lê cudahiyeke mezin û kûr di navbera wan de heye, lê herdu ji yek çavkaniyê sûdê ji bûyeran werdigirin, ku ew jî dîrok e bi hemû bedewî û kirêtî û baş û xirabiyên wê ve. Ev sûdwergirtina ji dîrokê jî, wek keresteya sereke karê herduyan ango romannivîs û dîroknivîs, wiha kiriye ku romana dîrokî wek janreke wêjeyî ya dualî derdikeve, çimkî romana dîrokî komkirin e di navbera sîfetên wêjeyî û sîfetên dîrokî de, lewra eger wiha pêwist bike nivîskarê romana dîrokî pabendî ragirtina hevsengiyê be di navbera xeyal û heqîqetê di karê wî yê edebî de, wiha kotekiya heqîqeta bûyerên dîrokî romana wî têk dibe, wek çawa xeyal jî heqîqetê têk dibe.

---

122. Hadî Mihemedî, Felsefe û Metod, Çend Nivîskar, W: Hadî Mihemedî, Weşanxaneya Şivan, Çapa Yekem, Silêmanî, 2007, r 389.
123. Eşref Selîm, Romana Dîrokî, Mahiyet û Pêwnedî, www.formus.moheet.com
124. Hadî Mihemedî, Felsefe û Metod, r 79.
125. Ebdilrehman Munîf, Ronahiyek li ser Romanê, r 80.

Me berê jî amaje da xeyal û heqîqetê ku sînorê cudakerên navbera roman û dîrokê ne, lê xeyalbûna romanê nayê wateya şênberbûna temamî ji rastî û realîteyê. Rast e romana dîrokî pişta xwe bi babeteke dîrokî girêdide, lê ew bi xwe ne dîrok e û li şûna wê jî nayê, çiqasî jî pişta xwe bi dîrokê girêdide lê wê dubare nake, ne wek rêveçûneke zemanî û ne wek bûyeran jî, romana dîrokî li beramber dîrokê diçe û wê dibirre jî, lê di encamê de ne dîrok e.

Aliyekî romana dîrokî ew e ku bi wan bûyer û zeman û karakterên realîst ên ku hebûn re tevdigere, lê bi dîtineke cuda û nû , ev jî nayê wê wateyê ku wan realîteyên ku hebûn diguhere, yanî romana dîrokî ne neçar e hemû wan hûrgiliyên ku hevdemî bûyereke taybet bûn li gor zincîreke sînordar wan bîne û behsa wan bike, lê bûyerek an çend bûyeran ji dîrokê hildibjêre ku li ba wî watedar û girîngtir e, dike binemayek an pêgehek ku jê jiyanê kifş dike ku di demeke zemanî de hebû, bêhtir ji bona mirov vê dike ne ji bona bûyeran, yanî bi rêya rengdana bûyeran li ser wan kesên ku di wê serdemê de jiyane bûyeran dixwîne, kirde û bertekên wan mirovan çawa bûn li hember bûyerên qewimî, herwiha ew motîfên mirovî û civakî çi bûn ku wiha li wan kirine bi wî awayî bîr bikin û tevbigerin, ne bi tenê ev jî lê romana dîrokî bi pileya yekem pişta xwe bi wênekirina jîna gelêrî girêdide, bêhtirî ku pişta xwe bi karakterên mezin û girîng girêdide, tew eger wêneya wan karakteran jî kir bê dudilî wan cudahiyan nîşan dide ku di navbera jiyana rojane ya wan kesan de hene, li gor wê guhdan û encama ku bi wan cure kesan tê dayîn.

Diyar e ev erk jî ku di stûyê romana dîrokî de ye, wateyeke baş e ji bo bersiva wê yekê ku pirsê di vî warî de dike, bi wê yekê ka gelo mekanîzma bikaranîna bûyerên dîrokî di hundirê teksta romana dîrokî de çawa û çilo ye? [126] Helbet hêla sereke di bersivdana wê pirsê de jî dîsa têkildarî awayê bikaranîna heqîqetê ye, di nav qalikê xeyalê de, ango qet tu bûyereke dîrokî tune bi tenê di nav metinê romanekê de hatibe bicihkirin, eger hatibe dûrxistin ji herdu têgehên heqîqet û xeyalê. Romannivîsê jêhatî dizane çawa û bi çi şêwazekê wê miameleyê dike, daku li bûyerên realîst bi tevlîkirina wan ligel xeyalê, jinûve wêneyeke din bide vegotinê.

Ji koma giştî ya têgihîştina me bo vê pirsê mumkin e em dîtingeha xwe ya dawî bi vî rengî darêjin: Dîroknivîs di çarçoveya qalikekî diyarkirî de û li gor programeke taybet kar dike. Lê romannivîs di şêwaza karkirina xwe de azadiyeke wî ya zêdetir heye, ku li ba dîroknivîs tune û nikare hewldana bidestxistina wê jî bide. Lewra berevajî dîroknivîs, romannivîs dikare bêhtir dîtin û baweriyên xwe yên taybet di teksta xwe de bikar bîne. Ji bo vê armancê jî penaya xwe dibe ber hemû cureyên şêwaz û teknîkan ji bona balkişandina xwîner û dayîna ciwankarî û estetîka zêdetir bi teksta xwe. Ev jî wiha dike ku romana dîrokî di hewldana komkirin û çinîna hûr û girsê wan aliyên nediyar de be, ku tewji kêmtirîn pencere ve ronahiyê dibin ser jiyana tak û kesayetiyan û wê rola ku di pêşveçûna bûyeran de dilîzin. Hevdem

126. Antonio Butrs, Edebiyat (Tarîfa wê, Janrên wê, Ekolên wê), Dezgeha Nûjen a Pirtûkê, Çapa Yekem, Libnan, 2005, r 163.

romannivîs di romana dîrokî de azad e ku gelek teknîkên wek: Wênekirin û pesin û diyalog û monolog û aliyên estetîkên din bikar bîne, ku ev hemû jî rehendeke dramatîk diyarî romanê dikin.

# Beşa Duduyan

**2. Pêwendiya bûyerê bi regezên din (cih, dem û kesayetiyê) re:**

Bûyer binemayeke diyar e ji binemayên pêkhênerên romanê, ligel vê yekê jî bûyer pir bi tundî girêdayî binemayên din ên metinê ye. Lewra karîgerî li ser binemayên din ên romanê dike û karvedana bûyerê jî dernakeve, tenê di çarçoveya van binemayan de nebe, bi wê wateya ku ne mumkin e bêyî (cih-dem-kes û bûyer) teksta romanê bê pêkanîn, çimkî her yek ji wan binemayan karîgeriya wan li ser hevdu dibe di aliyê ber bi pêş ve çûna karakter, ev ligelber bi pêş ve çûna demê de derdikeve, çimkî hebûna mirov pabendî dem û cih e, pêwistiya kombûna van binemayan bi bûyeran heye, daku kes bilivin û geş bibin û ber bi pêş ve herin. Hebûna pêwendiyê di navbera regezên hunerî yên teksta romanê û hemû tekstên vegotinbend de pêwistiyeke sereke ye, çimkî ew regez bi tenê nikarin tu erkekî hunerî li stûyê xwe bigirin û ew hokara ku ji çend têgehên asayî wan dike keresteyeke girîng di teksteke hunerî ya wek romanê de, siruşta wan pêwendiyan e ku di neseqan de wan bi hev ve girêdide, wiha li wan dike bibin hilgirê çend wate û hêmayên nû û li gor pêgeh û taybetmendiya xwe bêhtirî erkekî li stûyê xwe bigirin û bi rolekê rabin ji bona berhemanîna wê peyama ku tekst ji bona wê hatiye afirandin, lê em têbînî dikin yek ji wan regezên ku bi berdewamî di cemsereke pêwendiyan de dubare dibe û girîngiyeke wê ya diyar heye regeza bûyerê ye, ku her carê xwe di form û ruxsarekê de nîşan dide, wek (kirde û reftara asayî yan desthilata wan û ....hwd), ev jî wiha dike girîngiyeke bêhtir a bûyeran di neseqan de hebe û tew hinek caran erkê kontrolkirina wan pêwendiyan li stûyê xwe bigirin, çimkî roman hunereke zimanî ye, yanî naveroka xwe bi hevokan derdibire.“ [127]

Roman yek ji tekstên vegotinbend e. Yanî bi rêya vegotinê peyama xwe digihîne xwîner. Vegotin jî proseyeke di rêza yekem de pişta xwe bi regeza bûyerê girêdide. Eger bûyer nema, tevî ku hemû regezên din jî hebin, kirdeya vegotinê radiweste, ku ev nabe. Yanî bûyer dibe ew binemaya ku wiha li karakter dike di dem û cihekî diyarkirî de bi encamdana karekî rabin.

Ji bo bêhtir avêtina ronahiyê li ser pêwendiya bûyerê bi regezên hunerî yên din ên teksta romanê re wek (kesayetî, dem û cih) û karîgeriya wê regezê li ser regezên din, li xwarê em van pêwendiyan berçav dikin:

**2.1Yekem: Cih/Mekan**

Bûyer di cih/mekanekî de rû didin. Cih wek yek ji regezên pêkhênerên romanê wek yek ji wan hokarên sereke tê hejmartin ku bûyer li ser tên binyatkirin. [128] Girîngiya wê jî ji wê yekê çavkanî digire ku heta çiqasî nivîskar serkeftî dibe, ku bi şêweyeke jidil tiştekî derbibire, ku têkildarî derûn an asta civakî û aborî yakarakter

---

127. Mihemed Mehwî û Nermîn Omer Ehmed, Modela Rêzimana Kurdî, Weşanxaneya Jîr, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r 29.
128. Hesen Behrawî, Binyata Forma Romanê, Navenda Çanda Erebî, Çapa Yekem, Beyrût, 1990, r 29.

e. [129] Yanî divê bi şêweyekê wesfa cih bê kirin ku xwîner bikare bi rêya wê bi karakter re bibe nas. Di vî warî de bi baweriya (Rene Welk û Austin Warrin), wesfa cih divê "bi şêweyeke jidilkarakter derbibire. Çimkî mala mirov dirêjiya mirov bi xwe ye. Eger te wesfa mala xwe kir, ango te wesfa xwe kiriye.“ [130]

Cih beşekî girîng ji karê romanê pêk tîne. Ew tuxm e ku tutişt heta radeyekê bêyî wê rû nade. Piştguhxistina cih di romanê de, kêmasiyê di tekstê de dirust dike û derzê dixe nav bînaya hunera romanê. Hevdem eger roman ji cih dûr ket, aliyê xwe ye jînwarî (realîstîk) ji dest dide.[131]Ne tenê wiha, lê bi rêya pratîka rexneyî ew derket "eger hunerê cih nenas kir û piştguh xist di dîrokeke bêdîrok de dijî.“ [132]Rêya hunerî wateya kûr a cih û bedewiya cih ji me re derdixe "cih bihayê xwe yê estetîk û fikrî heye, lê eger ne berhema mirovê hişyar be, bihayê wê yê hunerî û fikrî nabe.“ [133] Bi rastî biha û girîngiya cih tenê li ba dahêneran derdikeve, bi rêya pratîka hişyar a nivîskar nû dibe, nîşanên wê yên hizrî jî tenê li ba wan derdikeve, ku ji zimanê hunerî têdigihin. Pêwist e rola cihê romanê ya karîger û berçav di bînaya kar de hebe, temamker û alîkarê tuxmên din ên tekstê be, rola wê di tevdana rewşa derûnî ya xwîner de hebe û hest pê bê kirin, bi cih di akama rengdana realîteya babetî li ser xeyala hunermend hatiye, lewra em dibînin ev hest hinek caran rûkeş e û hinek caran kûr e. [134]

Cih ku lêkolînvan wî wek"wê jîngeha xeyalî ku bûyerên romanê tê de rû didin“ [135] û "kesayetî tê de tevdigerin û dilivin“ [136] tarîf dikin, regezeke li gor regezên hunerî yên din, di binyatkirina teksta romanê de beşdariya wê ya herî kêm heye, çimkî ev regez"bêhtir regezeke wesfî ye“ [137] û nivîskar dikare ji bo bikaranîna wê tenê taybetmendiyên wê nîşan bide. Lê nikare tevgerê bidiyê wek çawa dide regezên din, tevî ku hinek hene bawer dikin "mumkin e tevger bi regeza cih bê dayîn, wek çawa tevger bi regezên din wek kesayetî û demê tê dayîn“ [138] ji bo vê jî amûr û alavên gihandinê wek: Otomobîl, tirên, keştî, firoke û...hwd, dikin nimûne û ew

129. Îbrahîm Mehmûd Xelîl, Rexneya Wêjeyî ya Nûjen ji Çavlêkirinê heta Texlîdê, Weşanxaneya el Mesîre, Çapa Yekem, Libnan, 1993, r 85.
130. Austin Warrin û Rene Welk, Teoriya Edebiyatê, W: Mihêdîn Subhî, Dezgeha Erebî ya Lêkolîn û Belavkirinê, Çapa Duyem, Beyrût, 1987, r 288.
131. Adil Mecîd Germiyanî, Realîzm Di Romana Kurdî ya Hevçax de li Iraqê, Nameya Masterê, Zanîngeha Bexdayê, 1996, r 60.
132. Yasîn Nesîr, Girîngiya Cih di Teksta Wêjeyî de, Weşanxaneya Karûbarên Çandî yên Giştî, Çapa Yekem, Bexda, 1986, r 5.
133. Jêderê Berê, r 27.
134. Tenya Esied Mihemed Salih, Binyata Cih di Du Nimûneyên Romanên Kurdî de, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2011, r 47.
135. Ehmed Ziyad Mehbek, Lêkolînên Rexneyî (Ji Dastanê heta Kurteçîrokê), Weşanxaneya Aladîn a Çap, Belavkirin û Wergerandinê, Çapa Yekem, Şam, 2001, r 147.
136. Jêderê Berê, r 148.
137. Mihemed Ezam, Helbestvaniya Gotara Vegotinbend, Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Ereb, Şam, 2005, r 44. www.awu-dam.org
138. Ehmed Ziyad, Lêkolînên Rexneyî, r 151.

tevgera ku ew amûr pêk tînin, dikin beşek ji rêveçûna wan bûyerên ku di hundirê wan de rû didin.

Wesfa cih jî li gor cureya romanê, ji romanekê heta romaneke din diguhere. Di romana texlîdî de, cih girîngiyeke mezin werdigire û hejmareke zêde ya rûpelan di binyata romanê de dagîr dike. Berevajî şepêla hiş a nû, ku nivîskar tenê amajeyeke lezgîn û ji nişkê ve dide cihê bûyeran. [139] Lê bi baweriya (Ebdilrehman Munîf): "Her cih formeke rasteqîn dide romanê û tam û çêjeke taybetmend dide bûyer û karakteran, ku di encamê de romanekê ji romanên din cihê dike.“ [140] Ev bîr û bawerî hemû, girîngiya cih û wesfê cih di romanê û di proseya vegotina bûyerê de nîşan didin. Di romana (Êvara Perwaneyê) de, emê wesfa wan cihan bikin ku bêhtir bûne şanoya bûyeran.

### 2.1.1 Bajar

Bajar wek cihekî regezeke sereke ya romana (Êvara Perwaneyê) ye û cihê qewimîna gelek bûyeran e. Gava dildar hest bi paşketina bajar û desthilat û sîstema wî dikin, eşq û rehendên eşqê dibe çeka rexnegirtinê, êdî hebûna derve û mabûna di wê rewşê de wiha dike hino hino aşiq tûşî bêhêvîtî û bêzarî û diltengiyê bibin. Lewra takekes neçar dibin ku wê red bikin û bîr li rev û dîtina cihekî din bikin, çimkî tu civakek bi hemû şêweyên bîrkirinê ku heta radeyeke mezin û pîroz daye dab û nerîtên wî, mehal e wiha hêsan û zû bê çareserkirin, lê di şiyana kesekî de heye ku wê xakê red bike ku li serê dijî, ev jî demekê rû dide ku êdî bajar dibe zindan û hest dike ku azadiyên wî tên şerjêkirin û mirin şûna eşqê girtiye. [141] Lewra em dibînin ku ji hêla vebêjer û karakteran ve bi çend şêweyan vê têgehê derdibirin.

**"Bajar corek ji dorpêçê ye, lewma jî derketina ji ti bajarekî vê dinyayê ne gengaz e.“**(Êvara Perwaneyê, r 22)

**"....her li pey wê xewnê jî dixwest dorpêça hesinî ya bajêr ku navê wî dikir "Bajarê xwîn, ol û toz û xweliyê, bişikîne.“** (Êvara Perwaneyê, r 24)

Lê ciwantirîn wesf ji bo bajêr di vê romanê de, vebêjer ji ser zarê (Ferîdunê Melek) û (Perwaneyê) ve pêşkêşî me dike. Ya yekem gava ku (Siyamendê Balinde) ji aliyê (Nesredînê Bêhnxweş) ve tê şandin bo bajêr daku (Ferîdunê Melek û Govendê Melevan) bibîne, (Ferîdun) hest dike ku (Siyamend) cara yekem e têbajêr, lewra jê re dibêje:

---

139. Amîne Yûsif, Teknîkên Vegotinê, r 93.
140. Ebdilrehman Munîf, Ronahiyek li ser Romanê, Wergerandina ji Erebî: Şîrîn. K, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2006, r 41.
141. Nîhad Camî, Daristan di (Êvara Perwaneyê) de, Beşê Duyem, Kovara Raman, Hewlêr, Hejmar (52), Dezgeha Rewşenbîrî û Ragihandina Gulan, 2000, r 42.

**"Hewl bide ser hewa û dîmenên bajêr ve nebî, hewl bide zêde ji ava vir venexwî, zêde li jinan nenerî...bajar weke narkotîkê ye, eger tu servebûyî bi hêsanî nayê jibîrkirin."**(Êvara Perwaneyê, r 69)

Ya duyem jî, gava di nav daristanê de (Perwane) bo Mîdya dinivîse û bi vî rengî wesfa (bajar) dike:

**"...Mîdyaya Xemgîn, hevrêya min, ez naxwazim ber bi paş ve vegerim, ez venagerim wan bajarên ku hetahetayê her bi vî rengî dimînin ku hene, ew bajarên ku careke din kes nikare destkariya nexşeyên wan bike, ew bajarên ku eger erdhej jî wan wêran bike, cardin li ser heman şêwe û li ser heman nexşeyê têne dirustkirin, xwediyên malên wan di heman cih de xaniyên xwe dirust dikin, dikandar li ser heman kolanan dikanên xwe ava dikin, polîsxane diçin heman cih, goristan jî her li ser cihên xwe dibin...Mîdya...musîbeta mezin ew e ku ez nikarim li wan bajaran û di wan dinyayan de jî bijîm ku şêweya xwe ya ebedî wergirtine...ji vê musîbetir jî ew e ku e daristan, daristaneke nikare şêweya xwe hebe...hest, xewn, proje li vir hêdî hêdî şêweya xwe winda dikin...aşiq li vir nizanin çi ji eşqê bikin....“**(Êvara Perwaneyê, r 178-179)

Bi rêya vê wesfa bajêr, (Perwane) rexneyeke tund li civakê digire, bi wê yekê ku civakeke teqinî ye û tu amadeyî û projeyeke wê ji bo guhertin û pêşketinê nîne, belkî ne şar e ku şêweya xwe ya ebedî wergirtiye, belkî hizra xelkê ye di cihekî de rawestiyaye û şêweya xwe ya ebedî diyarî bajar kiriye, lewra ligel rewta geşbûn û pêşketina dinyayê de naçe û li şûn dimîne.

Piştî hestkirina karakterên aşiq ên Êvara Perwaneyê bi wê yekê ku ew bajar û sîstem û civakên ku tê werbûne, paşketî ye û tê de debar nakin û hilnayên, hest bi bêhêvîtî û derneketin û jidestdana gelek tiştan û bicihhatina xewn û xeyalên xwe dikin. Lewma dikevin ser xeyal û bîrkirinê li dirustkirin û anîna holê ya dinyayeke din ku bawer dikin, xewn û hêviyên wan li wir bicih tên û mumkin e dinyaya xweşbextiya wan be. Di cihekî din de Govend bêyî ku awirê li Ferîdun bide û bêhtir çavên wî sor hildigeriyan û bileztir diçû û digot: "Bendewariya çi dikî? Dixwazî bibim çi...bibim çi di vî bajarê genî de? Bibim bulbulê zîv an çûkê zamrût...çi dixwazî? Tirêyê mirwarî yan xeyarên altûn ji te re bigirim. Di vî bajarê kirêt de, di vî bajarê mizrêb û çirav û bahoz û derewan de, ancax şerabvexwerekî qirêj ji min derdikeve."(Êvara Perwaneyê, r 22)

(Bajar) ji aliyê bereya îmandaran ve jî ne cihekî qebûlkirî ye. Lê li ba van jî bi şêweyeke tund, tê redkirin, lê ji nerîngeheke din ve. Ew jî ew e ku bajar di encama qelsbûna îmanê û jibîrkirina axîretê û windabûna xelkê di nav xweşiyên jiyana dinyayê de, bûye (gawiristanî) Ev jî di wê nimûneyê de derdikeve gava (Xendan) ji wan sê jinan dipirse ku wê dibin dibistana tobekaran, diçin kû derê? Yek ji wan di bersivê de ligel amajekirina bi dîwar û avahiyên hawirdora wan dibêje:**"Em te dibin derveyî vê kafiristaniyê ye.“** (Êvara Perwaneyê, r 126)

Wek em dibînin kes xwe wek xwediyê (bajar) nabîne û hemû bi hêviya pakbûnê jê direvin, aşiq ber bi (daristanê) û îmandar jî ber bi (tobexaneyê) lê dûre, ne (daristan) aşiqan û ne jî (tobexane) bo îmandaran dibin alternatîv. Lewra di encama wêranbûna daristan û tobexaneyê de, ji bilî Perwane, Mîdya, Ferîdun, Govend û Dilaram, hemû neçar dibin vegerin bajêr.

### 2.1.2 Daristan

Daristan ku li ba reviyan eşqistan e, bi dîtina îmandaran wehşistan e. Ligel ku şanoya beşekî zêde yê bûyerên romanê ye, tenê sê caran hatiye wesfkirin, carekê bi nerîna (Nesredînê Bêhnxweş), careke din jî bi nerîna wî kalemêrê ku daristan ji (Nesredîn) re dîtiye, cara sêyem jî ji nerîngeha (Xendanê) ve ye. Lê çend caran navê wê hatiye ji aliyê vebêjer û karakterên din ve, dûre ev daristan di nav xelkê navçeyê de wek (newala zinêkaran) tê binavkirin.

**"...Nesredîn ku ji dîtina vê xakê behitîbû, gotibû `Evder li derveyî zeman e, li derveyî dinyayê ye, xeyala Xwedayekî reviyayî ji esman afirandiye...pek li vê kelehê, pek, li van hemû deverên bêbinî, li vê newala ku şeytan jî bêyî rêberekî şehreza nabîne`. Kalemêr gotibû `Nesredîn ewqasî gêj nebe wisa bizanî kes nikare vê xakê bibîne, ewqasî nebe dewar wisa têbigihî ku te keleheke asê û dijwar dîtiye, evder jî zeviyeke weke her zeviyeke dî, bizanibe jî xakek li vê dinyayê nîne mirov negihiyê. Ez te agahdar dikim, te agahdar dikim."**(Êvara Perwaneyê, r 90)

Em dibînin ku (Nesredîn) matmayî ye û hêviyeke wî ya mezin bi vî cihê ecêb heye, lê kalemêr wî agehdar dike ku tu zeviyek nîne di vê dinyayê de mirov wê kifş neke û nebîne, çimkî ev daristan jî wek her parçe zeviyekî dî cihekî asayî ye, lewra divê ewqasî xeyalî û gêjikî hizr neke, ango daristan li vir ji du nerîngehên cuda ve tê wesfkirin. Lê karesat ew e ku nerîngeha duyem bicih tê û daristan wêran dibe.

Ew dinyaya ku aşiqan bi wêne dirust kiribûn, dinyayek bû hertişt tê de bi rêkûpêkî birêve diçû, bi wateya ku di aliyê exlaqî de hertiştek di vê cîhanê de parastî bû. Curek ji bê behayî û têkilbûna jin û mêran hebû bêyî tu binemayeke rewiştî ya mirovî, lê hemûligel hevranedizan, her du aşiq wek jin û mêrekî din ê derveyî realîteyê, di aliyê binemaya rewiştî bi hevûdin pabend bûn. Lê cureya pêwendiyê li gor şerîet û oleke diyarkirî biryar li ser nehatibû dayîn, ligel vê yekê jî beriya hilweşîna dinyayê eşqistan çarçoveyeke wê ya mirovane ya exlaqî ya parastî hebû.

Ji xeynî vê her yek ji bihayên din ên wek alîkarî û dilsozî û hevkarî û birêvebirina jiyanê bi şêweya wê ya giştî tê de hebûn. Eger wiha be şikestinê ji nerêkiya dinyayê çavkanî negirtiye, bi wê yekê ku sîstemeke derveyî nebû wê birêve bibe û şêweyekê pê bide, lê şikestin di hundirê aşiqan bi xwe de ye. Perwane di aşiqistanê de hêj zû tûşî dilgiranî û poşmaniyê dibe, bi baweriya wê ew dinyaya taze jî derbirînê ji dinyaya nav xewnên wê nake. Baweriya wê bi çûna nav dinyayeke

amadekirî hebû ku bi tena serê xwe azad û bedew be. Gava Perwane behsa cîhaneke din dike, dibêje bajarek nîne ji ezelê ve nazik be.

**"Aşiqan di daristanê de bawer dikirin ku eşq wan digihîne îzolebûn û malwêraniyê, Perwane"hêj zû hest dike ku sîbera giran û berfireh a vê daristanê, keçên aşiq guhertiye ser sîberên rengzer û nexweş.“** (Êvara Perwaneyê, r 252) Lê bi nerîna Platon eşqa rasteqîn armanceke wê ya bilind heye û mirov digihîne fezîlet û hîkmetê. [142] Û eşq ji "qonaxa berî bidestxistina wî tiştê ku eşqa aşiqan bû“ [143] pêk tê, li vê gorê eşq rawestgeheke bo gihîştina bi hebûna rasteqîn.

Lê hêjayî behskirinê ye wesfa yekem û duyem di destpêka dîtina wê de ye ji hêla (Nesredîn) û (kalemêr) ve, cara sêyem piştî wêranbûna wê ji hêla (Xendanê) ve ji me re tê wesfkirin.

**"Rojekê jî ez û Masûm me xwest em herine wê eşqistana dûr ku şanoya hemû bûyerên sosret ên vê çîrokê bû, lê çend rojekê bêhûde em li wan hemû herêm û zevî û çiya û daristanan geriyan, lêbelê me ew xak nedît. Tiştê ku me dît xakeke beyar û xwelîrengî û rût bû li berpala newalekê ku kesî nikarîbû jê dakeve xwarê, xakek bû çend caran agir û ceng û lehiyan ew wêran kiribûn. Diyar bû ku Nesredînê Bêhnxweş jî beriya me xwestibû vegere ser wê parçe zeviyê û nedîtibû, lê hemû gundiyên wê herêmê zanibûn li cihekî wê zemînê, newaleke bixof heye ku jê re digotin"newala zinêkaran."** (Êvara Perwaneyê, r 252)

Eger em bi hûrî binerin em dibînin ku paradoksek di navbera (bajar) û (daristanê) de tê têbînîkirin. (Bajar) bi wateya xwe ya sivîl hertim wargeh an penagehek bo xweveşartina aşiq û lêqewimiyan bû. Lê di (Êvara Perwaneyê) de, aşiq ji bajêr direve û penaya xwe dibe (daristanê), wek penageh û sembolekê ji bo eşqê. Ango deng di (bajar) de hatiye binpêkirin û di (daristanê) de azad dibe. Lê ev azadî berdewam nabe, çimkî dema ku aşiq peykerên wan nayên firotin êdî (daristan) nabe sembola eşqê, çimkî di cengê de êdî tukes guh li hîkayetên eşqê nagire. Lewra êdî aşiq bi neçarî ji azadiya (daristanê) direvin. Piştî şikestina navxweyî ya aşiqan û bêhêvîbûna wan li hember eşq û maşûq û dinyaya eşqê, sedemê îzolebûn û xerîbiya aşiqan di romanê de, wiha tê wênekirin ku her yek ji wan xewnên cudatir ji hevdu hene û ne mumkin e xewn û dinyayên cuda yên mirovan li jêr yek esmanî bêne cem hev. Îcar eger ew esman esmanê ciwanî û eşqê be jî. Di eşqistanê de Ferîdunê Melek bergirîkerê vê nerînê ye û bawer dike ku mirov û xewnên wan ji hevdu cuda ne, her kesek û heqê wî heye bide dû xewnên xwe yên taybet û cihêreng. Lewra wek hat

142. Plato, Ziyafet (Felsefeya Evînê), W: Wîlyam el Mîrî, Weşanxaneya Mearif li Misrê, Çapa Yekem, Qahîre, 1970, r 41.
143. Mihemed Emîn Ebdula, Hebûn di Helbestên Mehwî de, Nameya Doktorayê, Koleja Ziman – Kurdî, Zanîngeha Koye, 2008, r 80.

amajekirin bingeha wan cudahiyên ku ew bergiriyê lê dike, li ser binemaya eqlekî hevbeş peyda nebûne.Nesredîn ku nûçeya hatina karwanê îmandaran ber bi daristana aşiqan ve radigihîne, hawar dike:**"Tenê jiyana xwe bidin ser qolîka xwe û hilkişin jor û vegerin nav wê dinyayê....“** (Êvara Perwaneyê, r 355)

Bi şêweyeke giştî mumkin e bê gotin ku gotara mabûnê û rizgarkirina laş û kuştina ruh li ba piraniya karakterên Bextiyar Elî serdest e û ji bona mabûnê, ewa ku bawer dikin bi ruh tê dayîn. Ku ev jî nimûneyeke romanê ye gava Nesredîn ji Govend re digot:**"Govend ev ne cara pêşî ye xelk neçar dibin dev ji xewnên xwe berdin. Em di heyameke bixof de dijîn. Ku divê mirov dev ji xewnên xwe berde û bikare bijî. Divê em fêr bibin ku jiyana me di nav van agiran de, berbest li pey berbestê, deynin alîkî...ku xewn têne kuştin, tena tiştek ku wateya wê heye jiyan bi xwe ye, rûmeta taybet a jiyanê û heqê taybet ê mirovan e li ser zindîtiyê....hinek qonax di dîroka vî welatî de hene, zindîtî tê de hertişt e, girîng ew e tu bijî...niha û li vir girîng ew e em bijîn...ez hertim ji bo eşqê şewitîme, lê ew şerefa ku mirov zindî be, şerefeke ne kêm e....“** (Êvara Perwaneyê, r 307) Lewra gotar û bangewaziya Nesredîn ku bawer dike girîng ewe mirov bijî, rast e, çimkî hemû tiştên derveyî û çavkaniyên ku hatin behskirin, ne hêjayî wê yekê ne mirov jiyana xwe ji bona wan bike qurbanî.

### 2.1.3 Kurdistan

Kurdistan di vê romanê de landik û dergûşa bûyeran e. Çend caran tê wesfkirin û du caran jî bi awayekî eşkere navê wê tê gotin, her du caran jî li ser zarê (Nesredînê Bêhnxweş) tê wesfkirin. Lê bi rastîwesf ne wesfa Kurdistanê ye bi qasî ku bi rêya wesfa Kurdistanê civaka kurdî rexne dike.Wek dema ku bi wê erda mîna hesin de çûbû, gotibû: **"Çi biçûkxistineke aşiq di vê memleketê de ku welatê hezar êl, hezar bav û hezar pêxemberên rast û derewîn bû, warekî wan nebe. Wax çi biçûkxistineke, çi şermeke niştimanê bi vê mezinbûnê be, welatê ku serîkî wî taqên Ferhad be û serîk kêlên Mem û Zînê be veşargeheke dildaran lê nebe, wax li vê avirûçûnê."** (Êvara Perwaneyê, r 89-90) Li vir bi rêya (taqên Ferhad û kêlên Mem û Zînê) em dizanin ku mebest ji vî welatî Kurdistan e: Kurdistana Mezin e.

**"...Şehla ku bi Ezîzê Tîrendaz re reviyabû, keça şêxê bajarokekî dûr bû, şêxekî zengîn ku sînorê bax û zeviyên wî bi curekî berfireh bû, heybeta mîrên Kurd ên kevin bibîr tanî. Ezîz ku ji xwe re digot `ravyarekî winda`, ji herêmên dûr yên Kurdistanê hatibû, xelkê gundekî biçûk yê ser sînorê rojhilat bû, bi nêçîrkirina tilûran erd bi erd hemû welat tey kiribû heya di dawî de gihiştibû baxên şêxê mezin, li wir bi nêçîrkirina teyrikan re dil ketibû Şehlayê...“** (Êvara Perwaneyê, r 173)

Romannivîs amaje dide aşiqbûna Ezîz Tîrendaz û Şehlayê, ku Şehla keça şêxê dewlemend û Ezîzê Tîrendaz jî ravçî bû, ji navçeyekê ji navçeyên dûr ên

Kurdistanê hatiye, ji nêzîkî sînorên Kurdistana Rojhilat, ku Şehla ligel Ezîz Tîrendaz direve û berê xwe dide eşqistanê.

**"...Nesredîn îro di studyoya xwe de tê û diçe û destê xwe li gulên naylonî yên li ser maseyê dide û dibêje `Hezarên nifşan, pişt li pey piştê di nav wan çiyayan de ji dayikbûn û mirine û jibîrbûne; Kurdistan cihê sed hezarên gundên ku di qorzî û enîşkên wê xwezaya dilkevir de wendabûn e, milyonên mirovan tê de jiyane, vêga ti bîranîn li pey xwe nehiştine; min di wan salan de digot, deryayeke mezin e ji rih û derûna zindî, deryayeke fireh ji zindîtiyê, hemû li van çiya û şax û hevrazan jiyane û mirine û erdê ew daqurtandin, min ji xwe dipirsî çi di dîroka vî welatî de hêjayî rizgarkirinê ye? Wekeposteçiyekî ji vî serê Kurdistanê diçûm wî serî, bi dijmin û êlên kirêgirtî û xizmetkarên biyanî re rastî şer dihatim; li wan çiyayan min hemû serokên siyasî nasîn, li deştên pehn, li germiyan û zozanan, min axa û rêncberên Kurd dîtin, heya gihiştim wê baweriyê ku bêjim ev welat xalî ye ji beşerekî ku bikare ji te hez bike, xalî ye ji beşerekî bikare, li jêr piyê wî dêwê mezin ku navê wî zeman e xwe li ber mabûnê bigire, ez li jêr kepire û konên sedên eşîran rûniştim, min maqûlên tevahiya eşîran dît, tena kes li vî welatî, li vê boşistanê hêjayî bîranînê bin dildar bûn, ji xwe lewma jî ez roj û heyamekê li ser nivîsandina dîroka aşiqan veniştim, lê vêga dibêjim, di vî welatî de ku bi xwe welatekî jibîrkirî ye, li vê erdê ku hezarên sala ye ranehiştiye bîranîna çend mêrekî mezin, bîreweriya du zanayan neparastiye, çima divê ecêb be ger ew dildar jî nola milyonên mirovên dî herin û bên jibîrkirin? Çima divê ecêb be Perwane yan Ferîdunê Melek li bîra ti kesî nemînin? Hemû tiştên vî welatî leylan in, dîroka wî ji xubareke dûr wêdetir ne tiştekî dî ye, êlên wî ji leylanê wêdetir ne tiştekî din in, sînorên wî ji ber efsaneyên xwe û yên neyarên xwe ne diyar in, şoreşên wî dibin toz, serhildanên wî dibin ardûman; êdî çima ecêb e mexlûqên wî yên biçûk bi vî awayî biweşin?"**(Êvara Perwaneyê, r 121)

Diyar e ku temamiya bûyerên çîrokê li dora (bibîranîn û jibîrçûnê) disekinin. Hertim xema mezin a (Perwane) ew bû ku neyê jibîrkirin. Lewra bi hemû ewên ku têkilî bi wan re girêdida û wêneyên xwe pêşkêşî wan dikir, li ser wêneyan ji wan re dinivîsandmin ji bîr nekin. Êdî lewra hewldana (Xendanê) dest pê dike da xwîşka xwe (Perwane) ji dojeha jibîrçûnê rizgar bike. Ji bo vî karî jî pêwistiya wê bi (Nesredînê Bêhnxweş) heye. Li vir ji vê wesfkirina wî ji (Kurdistanê) re, (Nesredîn) dixwaze qenahetê bi (Xendanê) bike ku asayî ye dev ji wî karî berde. (Nesredîn) rexneyeke pir tûj li civaka kurdî dike û gumaneke mezin jî dixe ser hemû dîroka siyasî û civakî ya miletê Kurd. Çimkî bi gotina wan welatê kurdan landik an dergûşa mirovatiyê ye û bi dirêjiya milyonên salan jiyan tê de berdewam bûye, lêbelê du zana û du mirovên mezin di bîrdanka xwe de hilnegirtiye, lê sedema vê yekê çi ye?

Diyar e eger em bi hûrbînî berê xwe bidin binyata antolojî ya mirovê Kurd, em bi şêweyekî giştî dibînin ku her ji pêşî ve qudreta wî ya jibîrkirinê pir berfirehtir e

ji qudreta wîya bîranînê. Her vê wiha lê kiriye berevajî hemû miletên din ên dinyayê ku piştî her şikestinekê di kêmtirîn dem de hemû tiştî ji bîr bike. Bêyî ku sûdekê jê werbigire û wê bike wek faktoreke rabûnê. Na. Belkî zêdetir û zêdetir di kûraniya jibîrçûnê de werbûye [144], lewma em dibînin ku ev welat sînorên wî, serhildanên wî, şoreşên wî her hemû rewrewk û efsane ne. Êdî pir asayî ye ku du aşiq bêne jibîrkirin.

Her di çarçoveyaregeza cih de, di romana (Êvara Perwaneyê) de çend cihên din hene ku çavkaniya gelek bûyerên romanê pêk tînin, ku em tenê bi kurtî amaje didin wan.

*** Mala metê**

*** Dibistana xwîşkên tobekar**

*** Ew gundê ku Perwane û Mîdyaya Xemgîn tê de tênkuştin**

**2.1.4 Mala metê:**

Mala metê rawestgeh an qonaxeke pakbûna (Xendan) e. Ligel vê yekê jî tenê wesfeke rûkeş a wê malê ji me re dike, ku diyar e rengdaneke wê ya xirab li ser derûna (Xendanê) hebû û tirseke mezin di nava wê de dirust kiriye. Ji malekê bêhtir, dişibe mizgeftekê yan tobexaneyekê yan bendîxaneyekê. Ne wek malekê ye ku malbatek tê de bijî.

**"...Min berî hingî çend carên kêm ew mal dîtibû, lê îro piştî her du şevên tirsnak yên çûyî, min dikarî dinyayê bi awayekî nû bibînim, min karibû bi dû çavên dî li wê zulmat, agir û barana berbangê binerim, lewma gava çavê min li dîmenê wan odeyên tarî û girtî ket, gava çavê min li wan def, şûr, tizbî û pirçên birrî ku bi awayekî balkêş li hemû cihekî hatibûn daleqandin ket, tirseke kujer da ser min. Ji bilî qelşeke biçûkku diket navbeyna pencereya odeyekê û dîwarê pişta xanî ji ti cihê din roj derbasî malê nedibû. Ji pişt ve li kolaneke wêran û xemgîn dinerî ku xweliyeke zer weke xweliya çolistanê nuxumandibû, mizgevteke biçûçik jî di orta malan de bû, ji pişt ve jî diçû ser zeviyekî xalî, lê dagirtî bi paşmaka maşînên kevin û hesinê zingargirtî. Ji roja yekê ve min hest kir ew çavên li hawirdora min nerînek di wan de tune hinekî bi dostane li min temaşe bike."**(Êvara Perwaneyê, r 37)

Mala metê landik an hêlîna çend tiwêjeke diyarkirî ya civakê ye, bi reftar û guftara fêrkirîderbirînê ji hizrên olî yên civakê dikin. Li gor naveroka romanê serdankerên mala metê nûnerên hizrê paşketî yên beşekî civakê ne, ew kesên ku dibin hilgirên hizr û bîr û baweriyên wan bîrê kuştin û tirsandin di fikrê wan de dirust dibe. Ev cure nimûneya wan di edebiyata cîhanî de heye wek: Hamlet, Don Kîşot, Bake Goryo. Di romana kurdî de jî Kerîm û Kwêxa Sêwê.

---

144. Eta Qeredaxî, Rola Jibîrçûna Nediyar – Hevawakirina Dîrokkirina Rabirdûya Kurd, Kovara (Karwan), Hejmar (121), r 4.

Di mala metê de 8 keç dihatin perwerdekirin ku keçên metê bi xwe bûn. Û perwerdeya destê wê bi xwe jî bûn. Rabûn û derketin û cil lixwekirina wan û tew cureya girnijîna wan jî ji hêla wê ve hatibûn fêrkirin. Ev keç bê ku di romanê de navê wan bê anîn, wek çend karakterên nesereke û kesayetiyên têkdayî û bê vîn û îrade hatine wesfkirin.

### 2.1.5Dibistana xwîşkên tobekar

Li tihêla (bajar û daristanê), dibistana xwîşkên tobekar sêyemîn cihê girîng ê romanê ye, şanoya bêhtirîn bûyerên romanê ye. Sê caran wesfê dibistanê hatiye kirin. Carekê ji nerîngeha jineke îmandar, ji wan jinên ku Xendanê dibin dibistanê. Du carên din jî ji nerîngeha Xendanê bi xwe ve gava digihe dibistanê û wê bi çavê xwe dibîne.

**"Ji bilî odeyên razanê, çend salonên pir mezin yên xwendinê jî di dibistanê de hebûn, jêrzemîneke pir fireh, çend odeyên taybet bo mexzen û sotemenî û zad, xwaringeheke berfireh, rêzeke dirêj ya serşokên girtî û destşokên taybet bi destnimêjê. Odeyên xewê hema weke wan odeyan bûn ku we di beşên navxweyî yên dî de dîtine, du qeryoleyên duqatî û maseyeke xwarinê û du lokerên cil û bergan. Çend pencereyên biçûk di odeya min û Fetane de hebûn, lê dîsa jî herdem tarî bû."**(Êvara Perwaneyê, r 133)

**"Çavê xwe li wî deriyî digerînim ku çend xatûnên pak û nuxumandî û laçik li serê wan, jê derdikevin û diçin hundir, ew cih xaniyekî pir mezin e, ji xênî zexrefeya pencereyên wê tiştekî wê yê dî li mizgevtê naçe. Weke piştre derket, ew cih di bingeh de dibistaneke olî bû ku dewletê li ser daxwaza gundiyên wê navçeyê ava kiribû, dûre bi têkçûna rewşa navçeyê re dane destê berpirsên Ewqaf qena bi awayên xwe yên taybet birêve bibin, wan jî ew li wê navçeya dûrîdest kiribûn navenda xwedîkirina zarokên malbatên bêkes, lê ew nav tenê rûkeşeke fermî ye, eger na em mîna xwîşkên tobekar bi nav û deng dibin.“** (Êvara Perwaneyê, r 127)

Ku ev bêhtir wesfê dibistana tobekaran e, ku Xendanê ji (gişt) ve bo (beş) diçe û wêneyeke derve û navxwe ya dibistanê pêşkêşî me dike, ku dibistaneke olî bû û dûre bûye navendek ji bo zarokên bêkes, lêbelê di rastiyê de ne wisa ye, lê dibe ku bûye (dibistan-menfa)yek ji bo wan xwîşk û bextreşên ku divê baca (tawanê eger wan hebe) xwîşk û dayikên wan bidin.

Ligel wê yekê jî dibistan cihekî bi zorê bûye, lê bêhtirîn bûyerên romanê pêk tîne. Lê ji zarê Xendanê ji me re vedibêje, ku bûyera dîtina perperokan di pirtûkxaneya dibistanê de, xweştirîn demên jiyana wê pêk tînin, ku mumkin e ew dem pir xweştir bûbin li **gor wê di rojên beriya êvara perwaneyê de:**

**"Rojên dûre me rastiyeke sosret dît. Ew perperok, ne take perperokek bû di wê dibistanê de...lê kun û derzên wî xaniyê mezin tije perperok bûn. Ew**

**perperok ji ku ve dihatin, çawa di vê payîza sar de derketin, tefsîreke me jê re nebû. Lê dûre min û Fetane hemû perperok di pirtûkxanê de kom kirin, heta hêdî hêdî ew perperok bûn mezintirîn nihêniya jiyana me. Nêçîrkirina wan perperokên ku ji xeynî min û Fetane, tu kesê dî ew nedidîtin, lezeteke ecêb da wan hemû rojên ku li ser salnameya jiyanê diketin beriya Êvara Perwaneyê de."**(Êvara Perwaneyê, r 218)

### 2.1.6 Ew gundê ku Perwane û Mîdyaya Xemgîn tê de hatin kuştin

Ev gund girîngtirîn cihê romanê ye, çimkî girîngtirîn, naziktirîn, fantazîtirîn bûyera romanê li vî gundî rû dide û dawî li wan hemû azar û kambaxiyan tîne, ku ji destpêka demsala xeyalan ve herdu bere tê de werbûn. Aşiqan bi geşbînî û îmandaran bi reşbînî, bûyera kuştina Perwane ku wek (Êvara Perwaneyê) tê naskirin û navnîşana romanê ye, di vî gundî de dirust dibe.

Ev gund ne navê wî heye û ne jî cograyaya wî diyar e, ketiye kûdera vê wêrangeha ku jê re dibêjin (welat)? Lê xeyaleke pir ciwan tê de hatiye şênberkirin. Du caran ew gund tê wesfkirin. Carekê li ser zarê Fetaneyê û careke din jî li ser zarê Xendanê bi xwe.

**"...Min digot Fetane binihêre, bêhna mirinê ji birayên min tê...“ Fetane bêyî ku bersiva min bide, gotina min dibirî: "Xendanê, xeyala min li ba şêweya wî gundî ye, xeyala min li ba malan e, ez dibêjim pencereyên wan çima wiha biçûk in, derî çima bi vî awayî nizm in, sefende çima bi vî rengî tewiyane.“ Bêyî ku derfeta bersivdanê bide min, wê bixwe digot: "Xendana Biçûçik, na, ev mal dişibin goran...ev hewş dîmena goristanê tînin bîra min... "** (Êvara Perwaneyê, r 228)

**"Gund pêk dihat ji zincîreke têkdayî ji mal û ode û derî û kolanan, ku bi awayekî têkilîhev bi ser hev de vedibûn. Hemû tişt bi awayekî bi hev ve girêdayî bûn. Min qet hest nedikir ku ez ji cihekî diçim cihekî din. Temamiya gund jî dişibiya korîdorekê ku dîwarên wê berf û kevir û mirov dirust kiribin. Li hin cihan, min hest dikir ku mirov li şûna dîwaran sekinîne. Li hin cihên din jî berevajî mirov li şûna dîwaran em dorpêç dikirin. Di destpêkê de gund wek koregundekî dûrîdest û biçûk hate pêşiya çavê min, lê dema derî hatin vekirin, her deriyek diçû ser rêyeke kevirîn û her rêyek jî di nav çend mal û ode û hewş û dîwanxaneyan de derbas dibû. Her ku em bêhtir hildikişiyane jor, min hest dikir ev gund xwe bêhtir vedike. Lê dîwar û mal û kuçe hemû vala bûn. Ji bilî berfê tiştekî dî nebû...berf û kevir...di dawî de em gihîştin maleke biçûk, ku ji hemû malan xweştir bû. Malek bû li ser deşteke berfireh vedibû. Eşkere bû ew mala dawî ya gund e û li pişt wê malê êdî zevî û çêrgeh û xakên beyar dest pê dikin... "**(Êvara Perwaneyê, r 233)

Li gor nerîngeha Xendanê wêneya gund pêşkêşî me tê kirin. Tenê wesfeke asayî ya gund dike û heta radeyeke mezin di nerîna li malên gund, xwîner dikare bawer bike ku ev gund li navçeya Hewramanê ya Kurdistanê ye. Ku êvara perwaneyê li vî gundî qewimî û qonaxeke din a romanê ber bi dawî ji vî gundî ve dest pê dike.

### 2.2 Duyem: Dem

Dem di romanê de pêk tê ji "wê dema rêjeyî ku awayê vegotina bûyeran û livandina kesayetiyan di niha û rabirdû û siberojê de li gor şêwaza vegotina tekstê rêk dixe“ [145] Dem regezeke di binyata teksta romanê de girîngiyeke pir mezin heye, tew hinek rexnegir romanê wek (hunera zemanî) [146] pênase dikin û bawer dikin ku"çîrok bala me dibe ser zeman û bi dû hev hatina bûyeran di aliyê demê de.“ [147]Têkilî di navbera regeza dem û bûyerê de bi temamî cuda ye ji têkiliya regezên din bi bûyerê re û têkiliya wan heta asta pişaftinê diçe, yanî ne bûyer bêyî lixwegirtina demê tê afirandin û ne jî dem dikare ji bûyerê veqete, çimkî "kirdar bixwe di naverokê de amajeyên demê lixwe girtiye.“ [148] û pêwendiya navbera bûyer û demê pêwendiyeke temamkarî ye, ne mumkin e lêkolîna yekê ji wan bêyî ya dîtir bê bicihanîn.

#### 2.2.1 Têgeh û Tarîfa Demê

Dem tewerê sereke yê edebiyata vegotinê pêk tîne, bi wê yekê ku ne tenê hemû karakter û bûyeran diafirîne, belkî wan bi hevdu ve jî girêdide, çimkî tu liv û tevgerek nakeve derveyî demê. Bandora demê li ser karakteran di wê yekê de derdikeve, ku bi rêya wê berdewamiya ku tê de heye pirsyarê li ba te dirust dike, lewra hestkirina bi demê hestkirina bi hebûnê ye. Bi vî awayî dem hemû aliyên çîrokê digire: Babet, form û şêwaz, yan ziman.

(Necm Xalid Elwenî) di çarçoveya romanê de bi vî awayî demê tarîf dike:"Dema romanê ew dem e ku awayê vegotina bûyeran û livandina kesayetiyan di niha û rabirdû û siberojê de li gor şêwaza vegotina tekstê rêk dixe û wek guncawtirîn şêwe derbirînê ji rewşa aborî û civakî û derûnî û fikrî ya wan di helwestên cuda de dike û felsefeya jiyana wan, ji destpêkê heta dawiya bûyeran nîşan dide.“[149]

---

145. Necm Xalid Elwenî, Bînaya Demê di Sê Mînakên Romanên Kurdî de (Jana Gel, Şar û Raz) de, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r 54.
146. Zeman û Mekan di Romanên Xayib Ferman de (Lêkolîneke Teorî û Pratîk), Weşanxaneya el Ehalî, Çapa Yekem, Şam, 2002, r 104.
147. Austin Warrin û Rene Welk, Teoriya Edebiyatê, W: Mihêdîn Subhî, Dezgeha Erebî ya Lêkolîn û Belavkirinê, Çapa Duyem, Beyrût, 1987, r 279.
148. Derbarê Teoriya Romanê, r 209.
149. Necm Xalid Elwenî, Bînaya Demê di Sê Mînakên Romanên Kurdî de (Jana Gel, Şar û Raz) de, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r 36.

Felsefeya klasîk bi dilgiraniyeke kûr rûbirûyî meseleya derbasbûna dem û bûyerên rojane bû. Fîlozofekî wek Heraklitus wiha li demê nenihêriye, ku tişteke yê niha û yê vir e, lê dem bi guherînê ve girêdaye. Herwihafîlozofekî wek (Aristotle) jî dem bi livandinê ve girêdaye û diyar kiriye ku dem bidawî nayê, çimkî liv û tevger bêdawî ne, bi baweriya vî fîlozofî "dem di her tevgerekê de heye, çimkî her tevgerekê dema xwe ya taybet heye.“ Yanî dem pîvana tevgerê ye û girêdayî cih e, çimkî liv û hereket demê ji rewşekê dibe rewşeke dîtir, yan ji cihekî digihîne cihekî dîtir. Bi vî awayî maweya demekê ji maweya demeke dîtir cuda ye û her tevgerek jî guherînekê bi ser dema beriya xwe de tîne.

Li ba (Heidegger) mebest ne ew e ku dem wek vî bûnewer û wî bûnewerî bê destnîşankirin, "lê mebest guherîna pirsyara (dem çi ye) ye ji bo (çidem e)“, ku ev take rê ye ku em bi şêweya zemanî derbarê demê biaxivin. Yanî nabe em bawer bikin ku dem bûnewerekî nenaskirî ye, lê divê em wiha bihesibînin ku dem em bixwe ne. Li gor vê baweriya (Heidegger), gava em dizanin ku dem mirov bixwe ye, netiştekî li derveyî mirov e, êdî ew yek jî ji me re derdikeve ku bi rêya demê pêwendiya mirov bi hemû dinyayê re heye, ruhber û bêcan jî di nav de, lê tenê mirov derbarê demê pirsyar dike, çimkî ew pirsyar taybet e bi hebûnê. [150]

Ji ber wê rola girîng a demê ku di her teksteke wêjeyî de heye, nemaze di romanê de, rexneya wêjeyî guhdaneke pir mezin dide wê regezê. Kêm caran em lêkolîneke wêjeyî dibînin ku pêwendiya dem û cih li aliyekî û pêwendiya dem û karakteran piştguh kiribe. Bi baweriya (Frank O'Connor), regeza demê mezintirîn xisleta cudaker a roman û çîrokê ye, bi wê yekê ku di romanê demumkin e beşekî zêde yê jiyana rojane bê nîşandan, ku çawadi aliyê dîrokî de karakter û bûyer geşe dikin.

Bi rastî tu yek ji wan regezên ku romanê pêk tînin wek demê ne hewcedarîvegotinê ne, "çimkî vegotin bêyî demê nayê berhemanîn.“ Girîngiya demê jî di proseya vegotinê de ji wê yekê çavkanî digire, ku her tekstek bi tena serê xwe li ser dema pirreng û piralî tê damezrandin. Her vê girîngiyê jî wiha li rexnegiran kiriye ku êdî wek mijareke asayî li demê nenihêrin, "lê li ba wan dem roman bixwe ye.“ [151] Roman nêzîktirîn regeza edebî ye ji realîteyê û realîte jî bê dem nabe. Heman ew hemerengiya zemanî ku di jiyanê de heye, romannivîs bêyî dudilî vediguhêze nav metinê romana xwe, lê sîstema wê ya zemanî têk dişkîne û bi şêweyeke bilindtir derdixe, ku huner hertim wê bi ser nûser de ferz dike li gor sîstema estetîk ligel wan wêneyan tevbigere ku wan ji realîteyê werdigire. Serkeftina romanê girêdayî awayê wê miameleyê ye ku romannivîs ligel demê dike, ew rastiya ku balê dikşîne ew e

[150]. Hesen Behrawî, Binyata Forma Romanê (Feza, Zeman û Karakter), Navenda Çanda Erebî, Çapa Yekem, Beyrût, Kazablanka, 1995, r 71.
[151]. Hesan Reşad el Şamî, Jin di Romana Filistînê 1965-1985 de, Yekîtiya Nivîskarên Ereb li Şamê, 1998, http://www.awu-dam.org/book/98/study98/169-r-s/book98-sd014.htm

pirraniya wan pêşketinên ku di hunera romanê de rû dane, di kokê de ew pêşketin in ku di tuxmê demê de rû dane.

Dem wê yekê li ser romannivîs ferz dike wek regezekê miameleyê ligel wê bike, ku di hundirê karakter û bûyeran de ye, neku regezeke ji derve ve be. Eger cih di karê edebiyata vegotinê de rehenda maddî ya jiyana karakter pêk bîne, lê dem her jiyan bixwe ye, yan hestkirina bi jiyanê ye. "Cih dinyaya tiştên çespandî ye, lê dem wek dinyaya tiştên livok tê hejmartin.“ [152] Pirraniya romannivîsên ku bi tecrûbeyên xwe beşdarî di pêşxistina romanê di warê form û şêwazê de kirine, xeyala wan li cem demê bû, "xwestine ji xweza û buhayê demê têbigihin, bi taybetî ji aliyê ku pêwendiya wê bi binyata romanê ve heye.“ [153]

Tiştê ku wiha li nivîsên ( Samuel Richardson 1689-1761) kiriye, ku xwîner bi şêweyeke berfireh pêşwaziya wan bike û berevajî berhemên nûserên dî guh bide wan, hokara wê miamelekirina wî ya hûrbîn ligel demê bû. Wî bêhtir hundirê karakter derxistiye û guh daye aliyê wan yê psîkolojîk. Vê yekê jî wiha pêwist kiriye xwe nêzîkî têgeha demê bike. Destnîşankirina deman bi hûrbînî xasiyeteke realîst (realîzm) dida romanên wî, "Richardson pir hûrbînkarî li wê yekê dikir da hemû bûyerên çîrokên xwe di têza demeke diyar ya ravekirî de bicih bike, kuberiya wî qet wêneya wê nebû“ [154], herwiha (Richardson) di name-romanên xwe de, wê hestê li ba xwîner dirust dike ku di hemû bûyerên nav romanê de beşdar e. Ev jî bi saya wê hûrbînkariyê ye, ku di demê de kiriye. Dem biqasî ku bandorê li derveyî karakter dike wek di liv û tevgerên di nav çarçoveya cih de derdikeve, ewqasî jî bandorê li ser hundirê wî dike wek di şêwaza bîrkirinê û xeyalên wî de reng dide. Mirovê serdema îro ne wek mirovê serdema sedsalên navîn e. Teknolojiya ne tenê bandoreke mezin li ser lezgîniya mirov kiriye, lê cureya bîrkirin û xeyalên wî jî guhertiye, ku wiha kiriye mirovê îro dilgiran û şerpize be û hest bi xurbetê bike. Ev di edebiyatê de, bi taybetî di edebiyata vegotinê de derdikevin. Wek em dibînin roman, ku bêhtir di destpêka sedsala bîstan de geşe kiriye zêdetirîn guhdan daye demê, ku ev yek di berhemên (MarcelProust*)*, *(*JamesJoyce*)*, *(*WilliamFaulkner*)* û gelek kesên dîtir de derdikeve. Mebest ji bikaranîna teknîka şepêla hiş, ku pişta xwe bi teoriya şîrovekariya derûnî ya (Freud) girêdide, ji bilî aliyê estetîk, aliyê derxistina bandorên demê ye jî li ser psîkolojiya karakteran. Yanî her gava em bixwazin derbarê edebiyata vegotinê bi giştî û romanê bi taybetî binivîsin, regeza demê xwe bi ser me de ferz dike.

Ji bo nîşandana pêwendiya navbera regeza demê û bûyerê di romanê de û girîngiya bûyerê girêdayî demê, em dikarin pişta xwe bi wê şêwazê girêdin ku

---

[152]. Senger Qadir Şêx Mihemed Hacî, Binyata Vegotinê di Dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û romana (Şarî Mosîqare Spiyekan - Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de, Weşanxaneya Mukiryan, Dihok, 2009, r 49.

[153]. Jêderê Berê, r 49.

[154]. Necm Xalid Elwenî, Bînaya Demê di Sê Mînakên Romanên Kurdî de (Jana Gel, Şar û Raz) de, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004, r 56.

lêkolînvan û rexnegirên vî biwarî ji bo binyatkirina regeza demê di romanê de destnîşan kirine, çimkî bi rêya wê nerasterast ew bandor tekez kirine û dibêjin: Mumkin e dema teksta romanê li ser du beşan bê dabeşkirin:

1. Dema hîkayetê: Wan deman digire ku bûyerên romanêtê de jidayik dibin.

2. Dema vegotinê: Ew dem in ku bûyerên romanêtê de tênvegotin. [155] Ango regeza demê ji bo binyatkirinê pişta xwe bi bûyerê girêdide û ji bona wê yekê derbirînê ji hebûna xwe dike, çimkî dem di tekstê de bi du cureyan derdikeve (dema diyarkirîwek: spêde, duhî, beriya salekê û ...hwd) û ( dema veşartî di pêkhateya kirdar de), di herdu rewşan de jî pêwistî bi kirdarekî heye ji bo gihandina erka xwe.

**"...Hemû tiştî ji wê êvara hînik a buharê dest pê kir ku diviyabû ez, Xendana Biçûçik û Perwane, li ser sêniyeke mezin goştê wan qurbaniyên ku salane bavê min berî Cejna Qurbanê dabeş dikirin, dabeş bikira. "**(Êvara Perwaneyê, r 5)

**"Ew hergav bi şevan zû radiketin, jiyan li cem wan di heştê êvarê de xilas dibû, min jî da ku demeke dirêjtir bi xwe re bijîm û biramim, hê zû ji çavên metê direviyam û diçûm ser cihê xwe. "**(Êvara Perwaneyê, r 40)

**"Îro piştî derbasbûna wan hemû salên xemgîn gava em bi wan bûyeran hemûçkan diramin, ew bûyerên ku di dawî de êvara Perwaneyê sînorek ji wan re danî."** (Êvara Perwaneyê, r 82)

Li vir Xendan di nihaya vegotinê de behsa rabirdû dike û wan wek salên xemgîniyê wesf dike, lê amaje dide dawiya wan salên xemgîn jî ku (êvara perwaneyê), ango kuştina Perwane sînorek ji wan re danî.

Nivîskar çend caran bi rêya hevokan, wêneya çend deman ji me re dikşîne, wek **(Di wan mehên dûrûdirêj de, di şevên dirêj û bixof de, piştî hefteyekê, piştî sê şevan, şeva dîtir, piştî salên dûr û dirêj, çend mehên dûr û dirêj ên xemxwarinê, bi salan.)**

**"Di dawiya wê demsalê de gava Ferîdunê Melek nameya xwe ya yekê ji Perwane re nivîsand `tevî ku destpêka demsala xeyalan bû`, lê diltengiyeke kujer baskê xwe li ser jiyana me herduyan vedabû..."**(Êvara Perwaneyê, r 13)

Ev gotina Xendana Biçûçik e ku behsa wê demsalê dike ku jê re dibêjin demsala xeyalan û pirraniya jiyana xelkê dagîr kiriye, nemaze ya aşiqan. Lê ev demsal demsaleke demkî ye û zû bidawî tê. Di vê demsalê de jî bi berdewamî diltengiyeke kujer baskê xwe li ser jiyana Xendan û Perwaneyê vedaye.

155. Jêderê Berê, r 55.

**"Nîve şeveke hînik a buharê bû ku di dawî de xewna reva Perwane bû rastî..."**(Êvara Perwaneyê, r 18) Vebêjer berdewam dibe heta digihe**: "Berbang dihat û ji nişka ve Ferîdunê Melek li nêzîkî meydanê derdiket. Perwane gava çenteyê xwe yê biçûk di destê Ferîdun de didît mişeweş dibû û dikir ji bîr bike xatirê xwe ji min bixwaze... "** (Êvara Perwaneyê, r 21)

Li vir eşkere ye ku vebêjer behsa bûyera reva (Perwane û Ferîdunê Melek) dike, tenê ewqasî ji me re dibêje ku ji nîveşeveke hînik a biharê ve heta berbenga dotira rojê ew kar bi temamî qewimî, lê ji me re nabêje ku ew bihar bihara kîjan salê ye û di kîjan roj û meheke wê biharê de ew kar qewimiye, tew demjimêra revê jî ji me re nabêje, lê ew vê ji xwîner re dihêle, çimkî vebêjer bawer dike ku divê xwîner bi xwe bizane berbanga rojeke buharê saet çend dike?

### 2.3 Sêyem: Kesayetî/ Karakter

Kesayetî"ew regez e ku di binyata metinên vegotinbend de wek yekîneyeke (qaydeyên syntatîk ) derdikeve. [156] Regezeke bi temamî girêdayî bûyerê ye, ango gava kesayetiyek di metineke romanê de bi ber çavê me dikeve (di proseya vegotinê de – zindî be yan mirî) rasterast, bi kêmanî kirdarek an bûyerek amade dibe, çimkî di vegotinê de hertim kesayetî kirdeyekê encam didin an bandora kirdarekê dikeve ser wan. Yanî "kesayetî wê çaxê dibin xwediyê statûyekê di binyata metinê romanekê de, gava bûyerek bi wan hatibe spartin, bikerê wê bin an berkarê wê bin“ [157]di binyata metinên vegotinbend de kesayetî girêdaneke diyar û têbînîkirî bi regeza bûyerê re heye, ev diyarde jî di metinê romanê de bi temamî reng daye, çimkî "nûserê romanê kesayetiyên xwe ji jiyana rasteqîn werdigire“ [158] neçar e wêne û bûyerên jiyana wan wek wan an bi kêmanî nêzîkî wan nîşan bide, lewra em têbînî dikin kesayetî di metinê romanê de, nemaze di romana nû de wek yekîneyeke girêdayî û neveqetandî ji regeza bûyerê derdikeve, ji bilî rewşekê ku ew jî rawestana tevgerê (vegotinê) û serdestiya wesfê ye, ku "proseyeke, ronahiyê dixe ser hinek wêne, rewş, taybetmendî, ciwanî, hest û soz û...hwd, bi armanca derxistina ciwanî yan kirêtiya berhemanîna wêneyeke estetîk di metinê de. [159]

Hilbijartina karakter ji aliyê romannivîs pêwist e tevlîheviyek ji qenc û xirab be, ciwanî û kirêtiya reftarê, şêwe ...hwd, daku zindîtî û realîteya wan nîşan bide, herwiha li tevger û reftarên wan jî lûtkeya kêşe û milmilaneyê curbicur dirust bike bo derxistina holê ya bûyerê, çimkî hinek romannivîs ciwaniya navxwe û derve diyarî

---

156. Ehmed Talib, Sîmyatîk ji Teoriya Texlîdê heta Teoriya Formalîzmê, www.ahmed-talib.com
157Sirûr Ebdilrehman Ebdila, Binyata Kesayetiyan di Romanên Xesan Kenefanî de, Nameya Masterê, Koleja Edebiyatê, Zanîngeha Selahedînê, 1994, r 3.

158. Studying the Novel, p 1.
159Ebdilmelîk Mertaz, Derbarê Teoriya Romanê (Xwendinek di Teknîkên Vegotinê de), Encûmena Niştimanî ya Çand, Huner û Edebiyatê, Çapa Yekem, Kuwêt, 1998, r 283.

kesekî dikin û bi berevaj jî. Di vî warî de (Mihemed Emîn) dibêje:"Li vir kesayetî di nav romanê de derdikeve, di wî alî de ku dibe sedemê rohnkirin û eşkerekirina mahiyeta mirov û têgihîştinaheqîqeta hebûna mirov û anîna holê ya armancên wî ji bona kêşe û şoreş û rûbirûbûnên wî.“ [160]

Di vî birrê lêkolînê de emê hewl bidin rola karakteran di romana (Êvara Perwaneyê) de şîrove bikin bi taybetî karakterên sereke yên romanê. Romannivîs di vê romanê de hewl daye wêneya rewşenbîr heta radeyekê ji bo karakterên sereke bi rêya çend karakterekî aşiq nîşan bide. Bi tevlîhevkirina wêneya rewşenbîr bi wêneya eşqê, aşiq ji kesekî tenê û piştguhkirî guhertiye kesekî şoreşger û aktîf di nav civakê û eşqa wî jî kiriye ew peyama ku civakê ji sîstemeke oldarî biguhere û bike sîstemeke dinyayî.

Romannivîs di vê romanê de eşqê dike wesîleyek ji bo şoreşkirina li ser nerîtên olî û civakî, karakter li vir pir caran erkêdinyaya xwe di kirasê aşiq de cîbicî dike, lê karakterên din berevajî aşiqan, aşiqê olê wiha hatiye nîşandan ku dibin dijber li pêşber wan aşiqên ku xwe wiha nîşan didin ku şer dikin ji bona gihîştina bi maşûqa xwe, lê bi rastî ev aşiq şer li ser guherîna sîstema civakî dikin û dixwazin desthilata olî di nav wê sîstemê de rakin û desthilateke din di sîstemê de bê pêşxistin, ku guh bide pêdiviyên dinyayî û psîkolojîk ên mirov û zemînê jê re xweş bike destê mirov bigihîje wan pêdiviyên dinyayî.

Romannivîs bi rêya çend karakteran hewl dide wêneya rewşenbîrekî ji me re bikşîne, ku dixwaze bi rêya eşqê rola xwe ya rewşenbîrî di nav civakê de bilîze. Bi vî awayî jî dixwaze pêwendiyeke sereke di navbera rewşenbîr û pêdiviyên aşiqane yên mirov de berçav bike, wê yekê ji me re bêje ku rewşenbîr e ku ji bona pêwendiya aşiqan şer dike û qurbaniyê dide, nerîtên olî û civakî yên texlîdî ne ku astengiyan li pêşber azadiya aşiqan dirust dikin, rewşenbîr ne tenê berevaniya aşiqan dike, lê pêwanê aşiqan e jî û berevaniya aşiqan dike û amade ye ji bona wan qurbaniyan bide. Herçiqasî romannivîs bi rêya van karakteran hemû yasayên olî yên Îslamê wek kelem li ber azadiya takekesan û sepandina bi kotekî û sînordarkirina wan azadiyan nîşan dide, lê ola Îslamê bi xwe li derveyî îslama hişk û tund e û dûrîwê biryara romannivîs e.

Romannivîs karaktera sereke di forma keseke aşiq de nîşan dide, ku eşqê ji meseleyeke takekesî ber bi meseleyeke kolêktîf dibe û wê dixe rêza wan meseleyan ku divê kar ji bo wan bike û ji bona wan bijî. Bi vî awayî jî tevlîhevbûnek di navbera kesayetiya aşiq û rewşenbîr de dirust kiriye, em neçar kirine ku bêyî kesayetiya aşiq nikaribin wêneya kesayetiya sereke rola wê diyar bikin. Lewra ji bo diyarkirina wêneya karakterê aşiq û karakterê olî û karakterên din ên civaka paşketî ya romanê, yan bêjin civaka rêgir li aşiqan, hewldana nîşandana aliyê navxweyî û aliyê derve

---

[160] Mihemed Emîn Ebdila, Şakes di Romana Kurdî de, Nameya Masterê, Koleja Edebiyatê – Zanîngeha Selahedînê, 2000, r 6.

wêne bidin û wêneya di nav wê mij û morana eşqê de nîşan bidin. Ji bo vê mebestê jî hewldana diyarkirina herdu aliyên karakterên romanê didin ku karakterên sereke ne û bêhtir rola wan di dirustkirina bûyeran de hebû û di beşekî zêde yê bûyeran de jiyane.

Em dikarin cureyên karakteran di romana Êvara Perwaneyê de li ser du cureyan dabeş bikin ku ew jî ev in:

1. Karakterên sereke

2. Karakterên nesereke.

### 2.3.1 Karakterên sereke

Navenda romanê pêk tînin û kar li ser rêveçûna bûyeran dikin û tevger û reftarên wan bandorê li ser jiyana karakterên din jî dike.Bi vî rengîrêveçûna sereke ya serpêhatiyan ber bi pêş ve diçe.Qerarên jiyana wan, di jiyana karakterên nesereke de reng didin û tew hin caran şêweya çarenivîsa wan dadirêjin. Li ber ronahiya vê nerînê, em dikarin bêjin: Karaktera/ê sereke livkerê jiyana karakterên din e û li gor helwestên wî dawiya bûyerên romanê tê diyarkirin. Tevî ku di romana Êvara Perwaneyê de ne tenê karakterekî sereke heye, lê çend karakterên di vê romanê de rola sereke dilîzin û vê jî kiriye ku roman çend bûyer û jiyanname û nerîngehên cuda vehewîne.

### 2.3.2 Karakterên nesereke

Li tenişta karakterên sereke, em di piraniya romanan de dibînin ku hinek karakter bi rolên nesereke radibin. Ev nayê wateya ku romannivîs di binyata hunerî ya van de kêmguhdanê dike, lê kêmtir beşdariyê bi wan di bûyeran de dike. Dîsa jî karakterên nesereke bi roleke girîng di derxistin û zelalkirina kesayetî û helwest û taybetmendiyên karakterên sereke de radibin. Di Êvara Perwaneyê de çend karakter bi roleke nesereke di bûyeran de radibin, lê hinek ji wan kirdarên wan ji hêla çîrokbêj hatine wesfkirin. Hinekan ji wan bi kirdarî kar kirine li ser reftar û rewşa derûnî ya karakterên sereke, hinek ji wan tenê di yek bûyerê de derdikevin, hinek ji wan behsa jiyan û serpêhatiya wan hatiye kirin, hinekên din jî tenê navê wan hatiye anîn.

Li gor riwange yan nerîngeha (Êvara Perwaneyê), çend karakter beşdarî bûyeran dibin li gor wê tevgera ku nivîskar daye wan. Emê li vir îşaretê bidin hinekan ji wan:

### 2.3.3Xendana Biçûçik

Wek me got (Xendana Biçûçik) vebêjera sereke ya bûyerên romanê ye û karaktereke beşdarbûyî bûyeran e. (Xendan) bi cînavê (ez-min) ê axêver di proseya vegotinê de rêveçûna vegotinê ber bi du demên cuda dibe, ku ji dema niha û dema raborî pêk tên. Di dema niha de, ku dema vegotinê ye, bûyerên çîrokê behsa xwe û

Nesredînê Bêhnxweş û Fetane û Rezayê Dilxweş dike. Ku di dema rabirdû de ku dema çîrokê qewimîne, behsa têkiliya xwe û Perwane û bav û dayik û bira û metik û dibistana xwîşkên tobekar dike.Ev wê hestê li ba xwîner dirust dike ku çîrok rengekî jiyannamê ye. Yan mikurhatineke, ku tê de tecrûbeya xwe ya kesayetî bi rêya cînavê (min-ez) yê axêver ji me re vedibêje, daku me bide qanihkirin ku ew bûyerên ku behsa wan dike û bi xwe di wan de jiyaye, realîst in, divê em bêjin ku (15) beşên romanê bi vî cînavî vedibêje, ev tê wateya ku (Xendan) bi xwe di beşekî zêde yê bûyeran de jiyaye.

**"Ez Xendana Biçûçik berî niha bi çend salan di wan hemû bûyerên ecêb de jiyam, ku di dawî de dijwar bû heya hinekî mezin nebim bikarim ji hemû wateyên wan têbigihim û wan binivîsim; ew bûyerên ku vêga weke yekeyeke hevdûgirtî li wan dinerim, ne ku tenê ji ber ku pêwendiyeke mezin di navbera wan hemû tiştên ku qewimîn de hebû; lê ji ber wiha têdigihim ku qeder û çarenivîsên mirovan jî bi hêsanî ji hevdu nayên cudakirin."** (Êvara Perwaneyê, r 1)

**"Ez Xendana Biçûçik, `esreke hînik cîhana min serobinî hev bû..."**(Êvara Perwaneyê, r 108)

Êdî lewra (Xendan) piştî ku xwe bi me dide naskirin, axaftina xwe didomîne û sedemê nivîsandina vê çîrokê ji me re dibêje û tew wan çavkaniyan jî ji me re eşkere dike, ku zanyarî yan aliyên veşartî yên din ên çîrokê ji wan wergirtine. Herwiha da wiha li xwîner bike bi şêweyeke hunerî ligel wê tehlî û nexweşiya ezmûna kesayetî ku karakter (Xendan) tê de derbas bûye hevsoz be.

**"Ez Xendana Biçûçik im, ew keça ku bi derewan dibêjin, bahozan dirust dike…"** (Êvara Perwaneyê, r 376)

Romannivîs şiyana dirustkirina bahozan daye Xendanê, ku di çend bûyerên romanê de ev şiyan derdikeve, wek ji zarê Xendan bi xwe ji me re vedibêje ku sê caran bahoz dirust kiriye, carekê di pola pêncê seretayî de dema mamosteya wê neheqiyê lê dike, carekê li mala metikê û careke din li dibistana xwîşkên tobekar. Lê cihê lêfikrînê ye, ku karîna Xendanê ya rakirina bahozan di girîngtirîn bûyera romanê de ku kuştina Perwane û Mîdyaya Xemgîn e, li jêr sifr e?

**"Mamoste, yanî çi Xweda ku gerdûn bi vê hemerengiyê dirust kir, hemerengiyê qebûl nake? Yanî çi Xweda bi xwe ew arezûya wî ya mezin ji bo afirandinê hebû, arezûyek bi milyonan stêrk û roj peyda kirin, arezûyek ji hikmeta xunçeyekê ta hemû hikmetên din ên gerdûnê di xwe de kom kiriye û arezûya afirandin û dîtina mirov pê neyê qebûlkirin? Yanî çi, gerdûn di tevger û nûbûneke berdewam de dirust kiriye, li dijî hêz û şiyana firrîn û nûbûn û guherînê di mirov de be?.."**(Êvara Perwaneyê, r 284)Bi baweriya me vî karî ziyan

gihandiye asta hunerî ya romanê, çimkî Xendan ne di wê asta fikrî de ye ku bikare bi vî rengî van têgeh û wateyan derbibire.

**"Di wan salan de meta min, diya min û bavê min koç kirin û hemû behî jî li mala meta min hatin sazkirin; birayên min jî yek li pey yekî di helkeftên cihê û bi awayên cuda welat terikandin û gihiştin rojava, tu caran navnîşanek ji wan ji bo min nehat, heya tena nameyek jî çi ye negihişt destê min. Diyariya wan ya dawî ji min re mîkdareke zêde ya pere û pisûleyeke biçûk û reşbeleka tapo bû ku hemûçkan bi hev re îmze kiribûn û ew xanî weke wargehê dawî ji min re li cî hiştibûn. Ji mêj ve bû min biryar dabû ku êdî ji wê tobexaneyê derkevim, vegerim, di wî xaniyê vala û tarî de jiyana xwe berdewam bikim, wan pereyan ji jiyanê re veqetînim û xwe ji vegotina vê çîrokê re amade bikim. "** (Êvara Perwaneyê, r 375)

Di dawiya romanê de bergewde bûye ku ew avahiya ku tê de dijîn a wan e, piştî mirina dê û bav û barkirina birayan ji bo derveyî Kurdistanê, ji Xendanê re maye, vaye diyariya dawî ya birayan tibabeke zêde yapere û pisûleyeke biçûk û reşbeleka tapo bû, ev jî ji bona dariştin û peydakirina atmosfereke kêrhatî ji bo Xendanê, ku tê de vehewê û dirêjiyê bide jiyana xwe, da tenê bimîne û vala bibe ji bo nivîsandina vê çîrokê. Lê li ba xwîner eşkere ye ku ew bira piştî windabûna Perwane buxçeyan vedikin û xencerên xwe dertînin. Ew birayên ku di birina Xendanê ji bo mala metikê û dibistana xwîşkên tobekar tu helwesteke wan nebû û guh nedane çarenivîsa Xendanê. Êdî çawa ji nişkê ve li xwe vegeriyan û tibabeke zêde ya pere û pisûle û reşbeleka tapoyê îmzekirî jê re li cî dihêlin? Û bîra firotina xanî nekirin da pêbigihin welatên Ewropayê…? Yan em bêjin pêwistiya wan bi wan pereyên zêdenebûku li pişt xwe hîştin…! Em van pirsan hemûyan bi wê yekê rave dikin ku mumkin e bira wek berê nemabin û hemû guherîbin û li xwe vegeriyabin. Eger ev xala werçerixîna bîr û baweriya wan e, baş e çima piştre navnîşanek ji wan ji Xendanê re qet nehat? Çima nameyeke tenê jî jê re neşandin û serîk lê nedan? Ku ev ji bilî derxistina xisleta wan ya neguhêr ne tiştekî din e û çend wêneyên hevdij nîşan dide. Yanî romannivîs barekî giran dixe ser milê karakter ku bi başî karîna karakter a bergewdekirina wê nîne.

### 2.3.4Perwane

Kesayetiyeke sereke ya romanê ye, xwîşka Xendana Piçûçik e û roman jî bi navê wê hatiye binavkirin.Ev karakter ji jiyana malê û dibistan û bajêr bêzar dibe.Dixwest ji wî bajarî bireve ku wê bi xwe navê wî kiribû bajarê **"xwîn û ol toz û tirabêlkê."**(Êvara Perwaneyê, r 28) Aşiqa ger û herdem guherandina cih e. Dixwest bi her awayî be ji wê jiyanê rizgar bibe.Tew bi rêya eşq û pêwendiya seksî bigihe armanca xwe. Di vî warî de, Xendan dibêje**: "Çarçoveya têkiliyên wê ku biciwanên zarok û famkor yên dibistanê re hebûn û jiyana xwe tenê bi riya eşqên demkî diselimandin li xwe digirt, heya wan dewlemendên ku dixwestin**

**keçeke mîna Perwane têxin ser hejmara hezkiriyên xwe û şanaziyê pê bikin…"** (Êvara Perwaneyê, r 17) Ji bo nearamiya derûnî hertim cihan gunehkar dibîne. Jiyana Perwane bi nearamiya derûnî û xeyala seferê dest pê dike ku sefer xewn û xeyala herî mezin a Perwaneyê bû. Wekî mînak dibêje: **"Emê sefer bikin, ber bi cihekî din diçin. Berdewamiyê didin rêya xwe. Em her diçin, her diçin…."** (Êvara Perwaneyê, r 133)

Perwane ji bilî ku di qonaxa amadeyî de xwendekareke bişiyan û zîrek dibe, li malê mijûlî xwendina çend kitêbên derveyî yên rengereng dibe. Xwîşka wê Xendan di nav vegotinê de, belge û binemaya rewşenbîrî ya Perwane nîşan dide û derbarê Perwane dibêje: **"Hinek şevan, kitêbek bi dizî ji çenteyê xwe derdixist û dixwend, hinek şevan pir dixwend, ez behitî dimam ku çawa dikare neraze û tenê bixwîne û hey bixwîne. Carna diyar bû dixwest xwe ji bîr bike, car caran jî kitêb bi xwe re dibirin û min hest dikir ku ew pir bi kûrî dirame û diponije…."** (Êvara Perwaneyê, r 16) Li gor vê yekê, Perwane keseke xwendewar û xwîner bû û bi kûrî jî dirame, û di xema wan hemû dildaran de ye ku li bajêr di nav kirîz û kultûra eşqkuj de dinalin. Dema li Eşqistanê xema şikestin û nîvcomayîna aşiqan dixwe, ji Ferîdun re diyar dike ku wê hertim hest bi kovan û malwêraniya aşiqan kiriye û xemxwera kambaxiya jiyana wan bû: **"Ji destpêka serdema qesabxaneyên işqê, min pirxema wan miriyan dixwar, min pir xema wê kovan û tirsê dixwar, ku diviyabû aşiq tam bikin, ez çend şevan ranedizam, hertim digiriyam…"** (Êvara Perwaneyê, r 181)

Tirsa vê karakterê ji mirin û jibîrkirinê hebû, ji wê yekê ditirsiya rojekê bimire û kes wê bibîr neyîne,behsa vê tirsê ji Xendan û Mîdyaya Xemgîn re jî kiriye. Di guftûgoyekê de ji Mîdyayê re dibêje: **"Bextreşiya min a herî mezin ew e ku peyvên min dimirin, hemû tişt ji bîra min diçe, bîranînên min tên paşguhxistin, emrê min dibe ba…"** (Êvara Perwaneyê, r 139)Ji ber vê yekê pir caran ji xwîşka xwe Xendanê re dibêje soz bide min tu min ji bîr nekî. Her ev soz e jî wiha dike ku Xendan bi dû serpêhatiya wê bigere û biryar bide jiyana wê binivîse.

Perwane beriya ku aşiqî Ferîdûnê Melek be û here Işqistanê, di aliyê derveyî de xwe wek keçeke qurre û mexrûr nîşan dide, û têkelî çend pêwendiyên xoşewîstî dibe, piştrast jî bû ku tu yek ji wan mêrên ku wan bi vê rêyê nas dike ne mêrên xewnan û ne mêrên çarenûsê ne jî. Herwiha bawer dikir asêmayîn an jiyan û rûniştina di yek cihî de, tiştên ciwan dikuje, dema li daristana aşiqan rastî diltengî û bêzariyê dibe, ji Ferîdûn re dibêje: **"Divê em rêwîtiya xwe berdewam bikin.Mana li heman cihî, jiyan û ruh û eşqê dikuje. "**(Êvara Perwaneyê, r 115)

Li vê gorê Perwane xewn bi cîhaneke berdewam guhêrbar didît.Her li ser binemaya wê xewnê jî Ferîdûn diheband.**"dizanî, wê lewra ji Ferîdûn hez kiriye da wê ber bi dinyayeke din ve bibe, dinyayek tije be bi zeviyan, tije be bi avahî û azadiyê, ji sîbera van êşên kûr û kujer yên mirovan dûr be..."** (Êvara Perwaneyê,

r 143) Li vê gorê dinyaya ku Perwane xewnê pêve dibîne, dinyaya modern e, dinyaya berhemhatî ya sîstema modernîte ye, her lewra jî ji yekem kêliya gihîştina daristana aşiqan, hest dikeew der ne ew dinya ye ku xewnan pêve dibîne. Lewra ji roja yekemîn ve rastî dilgiranî û diltengiyê tê. Piştî reva wan ji eşqistanê û girtina wan, ji hêla karwanê îmandaran li mala (Pîr Mûsayê Xezannas) li gund, bi Mîdyaya Xemgîn re, ber êvarekê bi hev re tên gulebarankirin û kuştin. Jiyana Perwane bi trajedyaya mirinê bidawî tê.Xendana Biçûçik û Fetane wê êvarê wek êvara perwaneyê binav dikin.

### 2.3.5Nesredînê Bêhnxweş

Nesredînê Bêhnxweş, yekem vebêjerê şahidhal e piştî (Xendana Biçûçik), ku di beşekî zêde yê bûyerên romanê de jiyaye. Ev vebêjer ji bilî destnivîsên (Mîdyaya Xemgîn) zanyarî bûyerên beşê (8) hinek ji beşê (9, 11) û nîvê beşê (13) bi cînavê (ew, wî) derdikeve. Lê bêhtir mohra cînavê axêver li ser diyar e.

**Nesredîn dibêje: "…Min hê ji pêşî ve ew têkilbûna ecêb a dildaran ne lihevkirî didît, hinek ji wan keç û xortên nazik ên bajarên mezin bûn û hinekên dî jî jin û mêrên navçeyên çiyayî, her yek ji wan ji ber sedemekî reviyabû..."** (Êvara Perwaneyê, r 111)

**"Nesredînê Bêhnxweş di nav deşta xeyalperestên kesk de, digot: "Hemû aşiqên ku cihekî wan tune, ku sitema malbat, êlbat û şeytên ew ji hev cuda kirine, divê bexçeyekî wan ê azad hebe...divê zeviyek ji eşqê re hebe..."** (Êvara Perwaneyê, r 74)

Wek di van mînakan de ji me re diyar dibe ku vebêjera sereke ya romanê bîr û baweriyên (Nesredînê Bêhnxweş) ji me re berçav dike, berdewam wek “Nesredîn îro dibêje, Nesredîn dibêje…hwd” wî binav dike û bi vê yekê jî nîşanî me dide ku “Nesredînê Bêhnxweş” bi dirêjiya rêwîtiya nivîsandina romanê hevkariya vebêjerê kiriye.

**"…Bêhnxweş mêrê girnijînên şermîn û keçan, piştî ku ji artêşê derketibû, li jiyanê vegeriyabû, di nav mey, şewqa flaş û tarîtiya sorboz a labortûaran de, nîvê jiyana xwe bi şûştina wan fîlmên sosret ve mijûl bû ku weke wî bi xwe digot: “Fena rêwîtiya ber bi rastiyê ye, pêşî ji tarîtiyeke seranserî destpê dike, piştre weke cameke reş û piştre jî bi wêneyeke rengîn û qeşeng bidawî tê."**(Êvara Perwaneyê, r 8)

Di van çend hevokan de, vebêjer (Xendan) wesfeke rûkeş a (Nesredîn) ji me re dike. Bi bedewtirîn derbirîn amaje dide jidayikbûna (Nesredîn) piştî vegera wî ji artêşê, wê dema ku li artêşê bû wek mirî tê hesibandin. Niha jî berdewamî daye pîşeya xwe ya kevin, ku wênegirtin e. Gava behsa şûştina fîlman dike û nîvê jiyana xwe di labortûaran de jê re terxan kiriye. Di vê wesfê de vebêjer daye pêşiya bûyeran, çimkî em li vir dibînin ku qonaxeke baş ji hevrêtiyê derbas kirine.

Karakterê Nesredînê Bêhnxweş pêşî di wêneya derveyî de kesekî meraqker diyar dibe, li wê gore ku pêşî **"zilamekî meraqker ê pir normal bû...zilamek, ji yên ku hez dikin hertiştî derbarê jiyana keçên naskirî û berçav ên bajêr bizanin, jixwe vê meraqkeriya kujer jî ew kir wênegirekî gerok. "**(Êvara Perwaneyê, r 52)

**"Rojekê hest kir ji dêvla wê meraqa wî ya ecêb a berê ku li ser dîtin û eşkerekirina çîrokên eşqê hebû, vêga sozeke mezin ji bo rizgarkirina wan eşqên nîvco li ba wî çêbûye."**(Êvara Perwaneyê, r 52) Lewra beriya dîtin û dirustkirina eşqistanê studyoya xwe dike cihê jivan û stargeha hevdîtina aşiqan. Nesredîn li bajêr dibe hevalê nêzîk ê Ferîdûnê Melek û Govendê Peykersaz, diyalog û têkiliyeke wî ya berfireh bi hemû helbestvan, hunermend û rewşenbîrên bajêr re hebû. Piştî demekê dibe Pêşmerge û cihekî dûrîdest dibîne da aşiqan bibe wir.

### 2.3.6 Govendê Peykersaz

Karakterekî sereke yê din ê Êvara Perwaneyê Govendê Peykersaz e. Govend wek nûnerê aşiqan û rêberê eşqistanê di romanê de hatiye wênekirin. Pêşî Govend wek ciwanekî xwendewar û çalak û dinyadîtî û hevçax hatiye wênekirin.

**"Destpêka jiyana xwe bi awayekî nexweş xeyala xwe dabû ser lîstika hesin, dûre berê xwe dabû melevanîkirinê, lê di dawî de êvaran di pencereyên wê yaneya sporê de dihat dîtin, bi Mamoste Îsmaîl, pîrtirîn şetrencbazê bajêr re, noqbûyî di ponijîneke kûr de bi şetrencê dileyîst. "** (Êvara Perwaneyê, r 53)

Li vir Govend ji lîstika hesin û melevaniyê ku lîstikên hevçax û gewdeyî ne, diçe ser lîstika şetrencê ku lîstikeke zihnî ye û bi şêweyeke giştî fikrê mirov bihêz dike. Govend xwendewar e û xwediyê bawernameya akademî ye û herwiha hunermend e jî. **"Ji wê havînê ve ku çû peymangeha hunerî li paytextê hemû tişt guherî. "**(Êvara Perwaneyê, r 53)

Bi wê wateya ku şêweya jiyana Govend û axaftin û hizrînên Govend li jêr bandora jiyana nû ya paytextê û tevlîbûna wî bi hunermendên din re guherîn bi ser de tê. **"Salên xwendinê li paytextê ew fêr kirin weke hunermendên dî meyê zêde vexwe, bi dengê bilind bipeyve, bê tirs behsa jin û hunerê bike."** (Êvara Perwaneyê, r 54) dûre dibe aşiqê (Dilaram). **"Bi kurtî bûbû şeydayê wê keça bejinzirav ku êvaran bi jînzekî teng û poreke berdayî dihat yaneyê û bi qevdek keçên din re di taximê balê yê keçan de dileyîst."** (Êvara Perwaneyê, r 54)

### 2.3.7 Ferîdunê Melek

Girîngiyeke taybet a Ferîdûnê Melek heye çimkî jiyana wî di vê romanê de girêdayî jiyana Perwaneyê ye. Ferîdun beriya aşiqbûna Perwane û çûna ji bo nav eşqistanê, wêneya wî ya derve wek ciwanekî bazarî yê tewtewe û kêrbaz derdikeve. Sîpekek e ku li semûnxanê kar dike û yarîkerê futbolê ye, wek yarîkerekî jêhatî navê wî derdikeve, hêviya melevanekî şareza jê dihat kirin û li nav koma serserî û

kêrbazên bajêr hesabekî taybet jê re dihat kirin. Destpêka derketina Ferîdun wek kesekî bazarî û kêrbaz, vedigere wê rewşa ku Ferîdun her ji zaroktiyê ve tê de jiyaye. Bi wê wateya ku Ferîdun bi xwe **"kurê hêminiyan bû, lê salên jiyana di nav xirecira semûnfiroşan de, rihê hêmin yê wî ciwanî şewihandibû."** (Êvara Perwaneyê, r 56) Bi awayekî giştî Ferîdun **"Ji wan ciwanên sosret bû ku li marjînala taxên qeraxa bajêr mezin dibin. "** (Êvara Perwaneyê, r 57)

Ligel derketina kesayetiya Govendê Peykersaz di jiyana Ferîdun de, ew kesayetiya bazarî hino hino winda dibe, ligel serdankirina wî ji bo werşê (workshop) Govend fêrî destpêkên karê peykersaziyê dibe.Li wê gorê ku **"karkirin bi Govend re aramiyeke ruhî ya kûr dibexişandiyê. "**(Êvara Perwaneyê, r 57) Ji bilî vê jî **"ji hertiştî girîngtir ew bû ku cîhana werşê, Ferîdun fêrî ponijîn û bêdengiyeke kûr kir. "** (Êvara Perwaneyê, r 57) Li vê gorê êdî Ferîdun dikeve cîhana têfikrîn û ponijînê.

Piştî ku dibe dildarê Perwaneyê, êdî perwane yan perperokan nêçîr nake, **"Ferîdûn ji wê êvarê ku Perwane dît êdî ti perperîkek nêçîr nekir...êdî ji wê êvarê heya mirinê dev ji ravkirina perperîkan berda."**(Êvara Perwaneyê, r 76) Dûre hest bi hemû kambaxiyên bajêr dike û dengek ji hundir ve jê re dibêje ji vî bajarî bar bike, beriya ku tu bibî cinawirekî rasteqîn. Li gor vê yekê dûre xewn û xeyala rêwîtiya ji bo memleket û zeviyeke din hemû hest û xeyalên wî dagîr dike û dixwaze here welatekî din. Kîjan welat be ne girîng e, ya girîng ew e ku here. Ya ku berdewamiyê dide eşqa Ferîdûn û Perwaneyê, ew xewn û xeyala rêwîtiyê ye ku wek xewneke hevbeş pêşî herduyan bi hev ve girêdide û çarenûsa wan diyar dike.

### 2.3.8Mesûm

Mesûm bi xwe di nav bûyeran de jiyaye. Cihê wê di hundirê romanê de, vebêjera axêver dema wan bûyeran ji me re vedibêje ku ji (Mesûm) wergirtine, gotina (Mesûm dibêje, Mesûm digot) bikar tîne, ku mumkin e ev jî cînavê (ew-wê) jê re bê bikaranîn ku mohra cînavê axêver li ser diyar e.

**"Mesûme di wan şevan de serê xwe dideyne ser sînga Perwaneyê û dibêje: Min qet ji Siyamend hez nekiriye….qet…."**(Êvara Perwaneyê, r 176-177)

Reva Mesûme û teslîmkirinawê ji boMela Kewserê Baxewan mezintirîn gef li ser jiyana dildarên newalê dirust dike, encama wê jî bi wêrankirina daristanê û kuştina dildaran bidawî tê. Ji aliyekî din ve jîew rev bandoreke pir bixof li ser pêwendiya navbera hemû dildaran de dike û dudilî û tirseke kujer di nav wan de belav dike.Di dibistana Xwîşkên Tobekar de jî, di bin bandora ders û şîretkariyên Zeyneba Kwêstanî de, Mesûme hîn bêhtir rastî rahejîna derûnî û hizrî dibe. Derbarê vê karakterê Xendanê dibêje: **"Mesûme jî hingî li siza û dojehê difkirî, tirsa wê bi deh caran mezintir dibû, bi awayekî ku bi tu hawî şiyana wê nebû Xwedê wek mehebet û eşq bibîne."** (Êvara Perwaneyê, r 258)

### 2.3.9 Mîdyaya Xemgîn

Mîdyaya Xemgîn taybetmendiya xwe heye ku wê ji vebêjerên din cuda dike, ew jî ew e ku her ji zaroktiyê ve ji ber hezkirina wê ji heyvê re û coşa wê ji bo girtina heyvê bi lepê xwe fêrî axaftinê nebûye.

**"Mîdyaya Xemgîn, demekê piştî çûna Siyamend, di deftera xwe de nivîsandiye, windabûna Mesûm û çûna Siyamendê Balinde, destpêka tevlîheviyên mezin bûn…"** (Êvara Perwaneyê, r 178)

Li derveyî van karakterên (Êvara Perwaneyê) çend karakterên din hene ku roleke wan a sereke û nesereke di bûyerên romanê de heye. Herwiha Ferîdunê Melek, Govendê Melevan, Rezayê Dilxweş, met, Zeyneba Kwêstanî, dayik û bav û birayên Perwaneyê, Fetane, Mela Kewserê Baxvan, Dilaram, Kilpeyê hevjînê Mîdyaya Xemgîn, Leyla, Pîr Mûsayê Xezannas, Tahirê Tûtî, Mehdî Gulebax, jinên defbidest, Mehtab, Şino, Xemgînê Bextewer, Şehlaya Xudanas, Eseidê Namo, Ezîzê Tîrendaz, rêberê çavşîn, mamoste Îsmaîl û…hwd ku karakterên sereke û nesereke ne di bûyerên romanê de, ku me tenê amaje bi navên wan kiriye ji ber pirbûna karakterên romanê.

Bi vî rengî ji me re diyar dibe ku bûyer di (Êvara Perwaneyê) de, proseyeke kolektîf û bi kome û çend karakteran beşdarî di proseya binyata bûyerî ya roman û vegotinê de kiriye ku, her yek ji van jî xwediyê serxwebûna xwe ye tevî ku di proseya vegotina bûyerê de ev hemû di nav dengê vebêjerê sereke yê romanê de kom bûne.

# Beşa Sisêyan

### 3. Têgeha Binyatê

Têgeha (Binyat-Struktur) li gor wê pênaseya ku di ferhenga têgehên (Laros Liter) de jê re hatiye kirin (ew rêyeke tiştek pêtê dirustkirin an beşên hemû geşt an madeyeke binerd an karekî pîşeyî pê tê rêxistin)([161]). Têgeheke ji (stuere) ya Latînî hatiye û di zimanên ewropî de di warê hunerê bînakarî de bikar hatiye û pêk hatiye ji (wê rêya ku avahiyek pê tê avakirin)([162]). Yanî têgeha binyatê ji rêxistina çend yekîneyên biçûk di yekîneyeke mezintir de pêk tê, li gor sîstemekê ku ji pêwendiya wan yekîneyan bingeh girtiye ku wan bi hev ve girêdide.Her çiqasî têgeha binyatê bi fermî (Bo yekem car di sala 1929an de bikar hatiye)([163]). Lê (binyadgerî) wek rêbazekê dîrokeke wê ya kevintir heye û bi mikurhatina binyadgeran bixwe (zimanzanê swîsrîFerdinand de Saussure (1857-1913) wek damezrênerê sereke yê vê rêbazê tê hejamrtin, bi rêya wan dersên ku di warê zanista ziman de li Zanîngeha Jinêvê di salên (1913-1970) de) dabûn)([164]). Ekola wî jî wek (Ekola Jinêvê – Geneva School)([165]) hatiye binavkirin.

Ji bilî hinek nerînên dîtir ku vê destpêkê derbas dikin, ji vê riwangehê jî Claude Lévi-Strauss (1908- ) zanayê mirovnas (antropolojist) tekeziyê li ser wê yekê dike ku (hîm û kokên metoda binyadgerî vedigere bo renosans û rêça wê bi felsefeya siruştî (Goethe – 1749-1832) de derbas dibe)([166]). Binyat ew ravekirinên ku derbarê wê de hatine kirin selmandine ku (ne forma tiştekî yan peykerekî yan yekîneyeke konkret an ew keresteya giştî ye ku tenê parçeyan bi hev ve girêdide, lê sîstem û pêkhateya tiştan şîrove û rave dike)([167]).

Yek ji wan aliyên ku Ferdinand de Saussure bi rêya lêkolînên xwe yên zimanî rave kiriye, navlêkirina yekîneyên ziman e wek (nîşane-signal), ew demekê ziman wek (sîstemek ji nîşaneyan)([168]) pênase dike, mebesta wî ji nîşaneyan ne tenê çend yekîneyên sade yên ziman in û dibêje (têgeha nîşane ji du cemseran pêk tê, ku

[161]. Azad Heme, Rehenda Têraman û Cesteya Witara Roşinbîrî ya Hevçax, çapa 1, Swêd, 1995, r. 20.
[162]. Fayiq Mistefa - Ebdilreda Elî, Derbarê rexneya edebî ya nûjen (rwangeh û tetbîq), Dar el Kutub bo çap û belavkirinê, çapa 2, Mûsil, 2000, r. 178.
[163]. Rehenda Têraman û Cesteya Witara Roşinbîrî ya Hevçax, r. 20.
[164]. Bunyadgerî, Amadekirina sîmpozyoma cîhanî yan ciwanên musilman, r. 1, www.saaid.net.
[165]. Zanista zimanvanî ya nû, Dr. Ebdilqadir Ebdilcelîl, Weşanxaneya Sefa, Oman, 2002, r. 224.
[166].Îbrahîm Elî Mehmûd, Serpêhatiya lojîka bunyadger, çapa 1, 1991, r. 6.
[167]. Zekeriya Îbrahîm, Kêşeya bunyatê yan ravekirina bunyadgeriyê, Weşanxaneya Misr, r. 33.
[168]. Wail Berekat, Têgehên di binyata tekstê de, Weşanxana Maehd, çapa 1, Şam, 1996, r. 18.

pêk tên ji significant anku wêneyê dengî û signify ku têgeh û wate ye, ew wê jî dike du cemserên girîng û wan bi hev ve girêdide([169]). Herwiha tekeziyê li ser hebûna pêwendiyên sîstematîk dike ku nîşaneyan bi hev ve girêdidin di konteksteké de, çimkî (nîşane di ziman de bihayê wê bi rêya wê pêgehêku di sîstema pêwendiyan di konteksteké de hene tê diyarkirin)([170]).

Li gor vê nerînê jî dibêje (wateya peyvekê nayê diyarkirin, ku ne bi rêya wê pêwendiyê be ku bi hejmarek peyvên din re heye)([171]) bo vê jî peyva (reş) wek mînak tîne û dibêje: rengê reş wê demê wateya wê derdikeve ku li hember wê peyva (spî) hebe, heke na her rengek dibû rengê reş.Têgehên ziman (language) û axaftin (parole) û cudahiya navbera wan (ku language wekkonteksta ziman binav dike û axaftinê jî wek çalakiyeke takekesî)([172]) aliyekî dî yê projeya zanistî ya Ferdinand de Saussure ku berfirehtirîn lêkolînên wî lixwe digire. Ev dahênanû dahênanên dî yên Ferdinand de Saussure di warê zanista zimên de bûne çavkaniyeke girîng a lêkolînên kesên piştî wî û di bêhtirî warekî de sûd ji wan hat dîtin, nemaze di warê rexneya edebî de, li gor vê nerînê jî em dikarin amaje bidin ekola formalîstên rûs ku lêkolînvan wan wek berdewamkerên rexneya nû binav dikin.

Dîroka ekola Formalîzmê vedigere beriya Şoreşa Cotmeha 1917an, bi taybetî vedigere (xeleka zimannasî ya Moskowê di sala (1915) de, herwiha komeleya lêkolînên zimanê şiîrî – OPOJAZ)([173]) ku guherîneke girîng di bingehên rexneyê de peyda kirin, bi rêya veqetandina lêkolînên edebî ji zanistên mirovatî yên dîtir, wek mînak (Roman Jakobson) tekez dike ku (armanca zanista edebiyatê, ne edebiyat e bi rengê wê yê giştî, lê edebiyata wê ye, ango ew regezên taybet ku wê dikin berhemeke edebî)([174]). Di vê de jî mebesta wî dûrxistin û veqetandina lêkolînên taybet bi teksta

---

[169].Hikmet Sebax Xetîb Derbarê naskirina tekstê, lêkolînên rexneya edebî, Weşanxana Afaq Cedîde, çapa 2, Beyrût 1984, r. 30.
[170]. Besam Quts, Derbasgehek bo rêbazên rexneya hevçax, Weşanxana Wefa, çapa 1, Misr 2006, r. 128.
[171]. S. Rafindran, Binyat û veçirîn (pêşveçûnên rexneya edebî), w: Xalide Hamid, Weşanxana Çandî ya Giştî, çapa 1, Bexda, 2002, r. 34.
[172].Şukrî Ezîz el Madî, Derbarê Teoriya edebiyatê, Weşanxana Hedase, Beyrût.
[173]. Selah Fezil, Teoriya binyatî di rexneya edebî de, Weşanxana Karûbarên Çandî ya Giştî, çapa 2, Bexda 1987, r. 78.
[174]. Ebdilfetah el Misrî, Şêwaza Jakobson di xwendina teksta helbestê de (lêkolîn), Kovara Mewqif Edebî, Şam, www.awu-dam.org.

edebî bû ji faktorên derveyî wek (dîrok, civaknasî û psîkolojî), ev dîtin jî girêdayî bûn bi formalîstan bi şêweyê giştî ku bi baweriya wan (edebiyat ezmûngeheke hunerî ye neku babet û erkê wê diyarkirina roleke biyanî bo tiştên asayî û naskirî ye, tevî hebûna wan a berdewam tê de)([175]) yanî bi şêweyeke giştî dîtina vê ekolê tekezî li ser wê yekê dikir ku (karê rexnegir ji tekstê destpê dike û di tekstê de jî bidawî tê.)([176]).

Yek ji wan warên ku lêkolînvanên serbi vê ekola rexneyî li ser kar dikirin, lêkolîn li ser tekstên vegotinbêj bi giştî û janreya romanê bi taybetî bû, bi destnîşankirin û pesendkirina şêwaza binyatkirina regezên pêkhênerên wê janreyê nemaze regeza bûyerê, ku em dikarin bêjin girîngtirîn kar ku li ser regeza bûyerê hatibe kirin di tekstên vegotinbêj de bi giştî û di romanê de bi taybetî ew dabeşkirina zanistî ye ku formalîstan bovê regezê kirin, çimkî di lêkolînên wan de metodên rexneyî yên nû pratîze dikirin, bi wê yekê ku ew kontekst destnîşan û pesend dikirin ku bûyerên di nav tekstan de li ser wan hatibûn binyatkirin, li gor yasayên zimên.

Herwiha derbarê cureyên binyata bûyerê, weke formalîstên rûs amaje danê, çend cureyek in, ku bi rastî hinek ji van binyata bûyerê dikarin bi hev ve bên kirin, çimkî di bingeh de pir dişibin hev. Em jî di vê lêkolîna xwe de û bo encama karê xwe, wan pîvan û yasayan pratîze dikin ku wan di kar û lêkolînên xwe de diyar kirine û dariştine. Li gor vê nerînê jî, li gor derfet û xwezaya lêkolînê û taybetmendiyên romanê, em ê her yek ji çar cureyên binyata bûyerê werbigrin û wan di romana (Êvara Perwaneyê) depratîze bikin ku, ew cure jî evi n. Em jî di van pêwendiyên xwe de ji bo encamdana karê xwe wan pîvan û yasayan praktîze dikin ku me ew di nava kar û lêkolîna xwe de diyar kirine û dariştine. Li gor vê riwangeyê jî û li gor siruşta lêkolîn û taybetmendiya romanên kurdî, emê her yekê ji van binyatan werbigirin û li ser tekst û metinan praktîze bikin. Bi taybetî emê tekeziyê li ser binyatabazineyî bikin, çimkî romannivîsê Kurd Bextiyar Elî romana xwe ya (Êvara Perwaneyê) li ser vê binyatê dariştiye. Binyat jî ji van pêk tên:

1. Şûnketin

2. Têhelkêş (Têkilîkirin)

---

[175]. Ebdilqadir Heme Emîn, Binyata karnameyî di teksta nû ya kurdî de, Têza doktorayê, Zanîngeha Silêmanî, Koleja ziman, 2007, r. 9.
[176]. Cabir Isfûr,Xwendina Binyatî,www.arraee.com.

3. Hevseng

4. Bazineyî

### 3.1.1 BinyataŞûnketin:

Binyata Zincîreyî yek e ji wan binyatên ku di rêxistina bûyerên romanê de tê dîtin û (ji rêzkirin û bi dûhevhatina bûyeran di zincîreyeke rêxistî ya dîrokî de li gor demêpêk tê, bêyî pêrewkirina kirdeyên qutkirin an vegera ber bi paş ve)([177]) Ev binyat ji wan binyatan e ku dîroka bikaranîna wê hemdem e ligel dîroka derketina tekstên vegotinbêj, her ji çîrok û hîkayetên gelêrî heta efsane û dastanan, çimkî "hîkayetbêjên pêşî bûyerên çîrokên xwe di zincîreyeke dîrokî ya rêxistî de pêşkêşî guhdarên xwe dikirin"([178]) lewma dema Aristotle nerînên xwe derbarê tekstên vegotinbêj de nîşan dan tekezî li ser parastina zincîreya bi dû hevhatina bûyerên trajediyê dikir, di warê rêxistina binemayên "destpêk, navend û dawiyê."([179]) Ev binyat ku hinek caran lêkolînvan wê wek "binyata teqlîdî" *binav dikin didemekezêde de baskê xwe li ser janreya romanê kêşabû û tekane rê bû ku romannivîsan pişta xwe pê girêdidan ji bo binyata bûyerên romanê, bi cureyekî vegotina kronolojîk (wergirtina bûyerekê ji realîteya derveyî tekstê ye û tomarkirin û rêxistina wê di zincîreyekê de bi şêweyek ku rasterast wênedana wê bûyerê be ku rû daye)([180]) bûbû rêyeke belav û wek hevwateya kirdeya vegotinê dihat bikaranîn, vê faktorê jî wiha li rexnegir û lêkolînvanan kiribûku bikevin wê baweriyê ku "roman

[177]. Ebdulla Îbrahîm, Binyata hunerî ya romana cengê li Iraqê (Lêkolînek li ser pergalên vegotin û binyatê di romana Iraqî ya nûjen de), Weşanxana Karûbarûn Çandî ya Giştî, çapa 1, Bexda, 1988, r. 28.

[178]. Binyata Hunerî di Romanê de, r. 50.

[179]. Aristotle, Pirtûk, r. 111.113.

* Bi baweriya min "wek lêkolînvanekî", bikaranîna têgeha (teqlîdî) bi wê wateyê xwariyek tê de heye û bi nerîna min têgeha (pêşîn) rastir e, çimkî (teqlîdî) wateya (çavlêkirin û pêrewkirinê) dide, li vê gorê jî hemû rêbazên kevn û nû jî teqlîdî ne û wê wateyê nadin ku di bikaranînê de mebest bû, lê (pêşîn) bêhtir di warê wate û nîşaneyê de ji naveroka mebesteke wiha nêzîktir e, çimkî ew cure berhem li gor îro dîrokeke wan a kevnare heye û di çend qonaxan de derbas bûne, wek mînak em dikarin di heman demê de wek teksteke folklorî û teksteke ku li gor binemayên rêbaza klasîkhatine nivîsandin re bêjin pêşîn.

[180]. Boris Ikhnbawum Derbarê Teoriya pexşanê, w: Îbrahîm el Xetîb, Dezgeha lêkolînên erebî, çapa 1, Beyrût, 1982, r. 112.

hunerek e ku di pileya yekemîn degirîngiyê dide şêwaza zincîreyî û bi dû hevhatina bûyeran û derbasbûna berdewam a demê”([181])

Lê ev hunerdi dawiya sedsala 17an û destpêka sedsala 18an de li ser destê romannivîsên wek (Daniel Defoe – 1660-1713), (Samuel Richardson 1689-1761) û (Henry Fielding 1707-1754)geş bû û asoyeke nû dahunera romanê û lêkolînên rexneyî jî (girîngiyeke taybet danproseya vegotinê û serbestiyeke zêdetir jî dan romannivîs di şêwaza binyatê û bikarbirina regezên romanê de bi giştî û bûyerê bi taybetî)([182]) û bûne destpêkeke nû bo romannivîs û lêkolînvan û rexnegirên pey xwe da wan bikin binema bo berhem û dahênanên nû. Her çiqasî binyata zincîreyî wek kevintirîn binyata bûyerê di çîrok û romanê de tê hejmartin, bi şêweyekê ku zehmet e hîkayetek an çîrokek an romanekku ev binyat tê de bikar nehatibe bê dîtin. Yanî binyata zincîreyî di piraniya regezên edebî de bikar hatiye.

Binyata zincîreyî ku vebêjer wê di vegotina bûyeran de bikar tîne, ji beşê sêyem ve vebêjer ligor zincîrê di vegotina bûyeran de berdewam dibe heta dawiya beşê heftan ê romanê.

Di beşê piştre de, yanî di beşê çaran de vebêjer vegotina bûyeran didomîne û xewna reva (Perwane û Ferîdûnê Melek) dibe rastî û ew di berbangekeke hînik a rojeke biharê de direvin.

Di êvara wê rojê de reva (Perwane) li mala wê eşkere dibe, qiyametek li mala wê û li seranserê bajêr radibe û ji bo dema sê şev û sê rojan ji hêla bav û birayên (Perwane) û artêşa îmandaran ku ji hêla (pûrê-metikê) tên komkirin,li tevahiya bajar lê digerin, lê bêhûde ye. Vebêjer van bûyeran di beşê pêncan de vedibêje.

Gava nivîskarbehsa lêgerîna li (Perwane û Ferîdûnê Melek) dike, di beşê pêştir de vebêjer dibêje: **“...piştî sê şevan ji neraketinê, min dixwest bimirim…..” (Êvara Perwaneyê, r. 32.)** Lê belê di destpêka beşê şeşem de bi vî rengî destpê dike: **“Zehmet bû piştî bûyerên wê şevê, ez dîsa dest bi jiyana xwe ya berê ya êmin û aram bikim…” (Êvara Perwaneyê, r. 35.).** Em dibînin ku nivîskar dikeve

[181]. Senger Qadir Mihemed Hacî, Binyata Vegotinê di dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û romana (Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de, Nameya masterê, Koleja Selahedîn, Hewlêr, 2009, r. 72.
[182] . Boris Ikhnbawum, Derbarê Teoriya pexşanê, w: Îbrahîm el Xetîb, r. 112.

çewtiyeke hunerî, ku ne li gor behremendî û şiyana wî ye, çimkî bi rastî bûyerên piştî reva (Perwane) ku hemû bajarli wê digeriya, di yek şevê de bûn.Bi her hawî vebêjer behsa wê yekê dike ku êdî ji biçûktirîn xweşiyên jiyanê ku dibistan e tê mehrûmkirin. Çimkî êdî divê baca çewtî û tawanên (Perwaneyê) bide.

Hebûna taybetmendiya kronolojî mercekî sereke ye di edebiyatê de û di neamadebûna vê binyatê de çîrok parçe parçe dibe û tutişt wê bi hev ve girênade ji bilî hevnêzîkbûna şûnên wê, ev jî rast e çimkî em her bûyereke jiyanê werbigrin jî, bi siruşta xwe bi şêweyekî zincîreyî de rû dide.

Lewra em digihin vê encamê ku ev roman di rêxistin û dariştina bûyerên xwe de pişta xwe bi binyata zincîreyî girêdaye, romanek e bêhtir armanca wê tomarkirin û zindîhîştina bûyerên rabirdû ye. Ev jî wiha pêwist dike ku zincîreya dîrokî û lojîkî ya bûyeran bêparastin ji bodayîna teşeyeke realîst bi wan bûyeran û qenahetpêkirina xwîneran bi rasteqîniya wan.

### 3.1.2 BinyataTêhelkêş(Têkilîkirin)

Binyata Têhelkêş (Têhelkêşkirin an Têkilîkirina çîrokekê di nav çîrokeke dîtir de)([183]) yan (Têhelkêşkirin an Têkilîkirina çend bûyerên cuda ye di heman romanê de, bêyî liberçavgirtina zincîreya bi dû hev hatina rasteqîn a bûyeran di warê demê de)([184]). Yanî li kêleka vegotinêçend bûyertêhelkêşî-têkilhevî hevtên kirin bêyî giringîdana bi zincîreya dema bûyeran, romannivîs di proseya têkşikandin û têhelkêşkirina çend bûyeran di romanê de, mebesta wî (nîşandana aliyê ciwankarî û zelalkirina helwesta karakteran e li hember bûyeran, bêyî guhdana bi rêzbûna bûyeran)([185]) Çimkî yarîkirina bi dema qewimîna bûyeran û paş û pêşxistina wan bandorê li ser wateyê nake yan ciwaniyekê dide teşeya metnêê û roleke bêhtir dide kesayetiyan.

Dîroka binyata têhelkêş vedigere destpêkên sedsala bîstan, û yek e ji wan binyatên ku di romana hevçax de hatiye bikaranîn, piştî ku çend romannivîsên wek

---

[183]. Letîf Zeytûnî, Ferhenga Têgehên rexneya romanê (Erebî-ingilîzî-fransî), Weşanxana Nehar, Beyrût 2002, r. 56.

[184]. Binyata Hunerî ya romana cengê li Iraqê, r. 38.

[185]. Rêzan Osman Mistefa, Binyata Cureyên bûyerê di romana Başûrê Kurdistanê de (1985-1990), Nameya masterê, Koleja ziman- Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2008, r. 94.

(James Joyce 1882-1941) û (Marcel Proust 1871-1922) û (Virginia Woolf 1882-1941)di dariştina bûyerên romanên xwe de, ji bikaranîna binyata kronolojîk ku wê heyamê berbelav bû dûr ketin, ev jî bo bexşîna arasteyeke nû bi hunera romanê û dûrxistina wê janreyê ji wê pênaseya ku wek tomareke rûta dîrokê pênase dikirin bi rêya dahênana cureyekî nû yê romanê ku wek romana zêhiş (stream of consciousness) naskirî ye û têgehek e bo yekem car zanayê psîkologê amerîkî (William James 1842-1910) afirandiye û mebest jê bîrkirina hiş (pêwendî kirin – contect) û çavkaniya vî hişî jî navçeya beriya hişmendiya mejî ye û piştî derbasbûna wê di çend astan de digihe bilinditîrn asta hişmendiyê, ku evast e.)([186]) dûre ev têgeh di warê edebiyat û rexneya edebî de jî hat bikaranîn, nemaze di warê lêkolîn kirina çîrok û romanê de.

Wek mînak (Robert Humphry 1954- ) derbarê lêkolîn kirina romanên (Henry James û Marsel Proust) û şîrovekirina wê şêwaza ku wan derbarê tevgera ligel kesayetiyên romanên xwe de bikar aniye, gihîşte diyarkirina çarçoveyekê bo pênaseya vê diyardeyê û dibêje: (Romana zêhişî "ji cureyekî çîrokê pêk tê ku di bingeh de tekeziyê li ser (pevuhertin)a astên beriya gotinê di hiş de dike, bi armanca destnîşankirinapêkhateya psîkolojî ya kesayetiyan)([187]) Anku romannivîs êdî ne ew vebêjer e ku hemû bûyeran ji me re vedibêje, lê (berê xwe dide lêkolîna hizrî û derûnî ya kesayetiyan û heyecan û xwestek û xewn û xeyalên wan bi rêya bergewdekirina bûyerên çîrokê)([188])rê dide wan ku beşdariyeke aktîf di bûyeran de bikin û xwestek û xewnên xwe nîşan bidin.

Yanî dema xwîner romanekê dixwîne ku pişta xwe bi vê binyatê girêdabe rastî bêhtirî çîrok û serpêhatiyekê tê û êdî ne ew xwîner e ku hemû bûyer di zincîreyeke dîrokî û sade de jê re hatibin rêzkirin û pêşkêşkirin. Lê xwîner xwe li pêşber çend serpêhatiyên hûr û bûyerên cuda cuda dibîne ku her yek ji wan dikare çend wate û hêmayên taybet hilgire û havêna berhemanîna metn û çîrokên serbixwe bin.

[186]. Robert Humphry, Zêhişî di Romana nû dew: Dr. Mehmûd el Rebî, Weşanxana Mearifa Misrê, Qahîre 1975, r. 16.
[187] . Robert Humphry, Zêhişî, r. 20.
[188]. Necm Elwenî, Binyata Vegotinê di kurteromana (Mulazim Tehsîn û tiştine dîtir jî), Kovara Raman, Hejmara 68, 2002, Navenda Rewşenbîrî ya Gulan derdixe, Hewlêr, 2002, r. 19.

Herwiha bi baweriya Todorov, kirdeya têhelkêşkirina bûyeran bi erkekî sereke di proseya vegotinê de radibe, ku bi rêya hîkayeta yekem, ku rûdana sereke ye, wateya veşartî ya hîkayeta duyem kifş dike ku bûyerên diyar yên negirîng e. Bo vê mebestê jî proseya têhelkêşanê li ser du astan dabeş dike û dibêje: (Têhelkêşan li ser du astan pêk tê:

1. Asta hîkayetê: Di vê astê de hîkayeta têhelkêşkirî dibe mînakeke biçûk a hîkayeta sereke.
2. Asta Vegotinê: Vegotina hîkayeta sereke tê veqetandin ji bo vegotina hîkayeta têhelkêşkirî.([189])

Binyata têhelkêş duyemîn binyata bûyerê ye ku di (Êvara Perwaneyê) de derdikeve û di vegotina bûyeran de, nûser bi şêweyekî berçav pişta xwe bi vê binyatê girêdaye û zincîreya dema bûyeran têkşikandiye.

Di beşê duyem ê romanê de, vebêjer rêçûna bûyeran radigre û vedigere dawiya hîkayetê û behsa derçûna (xwe û Fetane û Masûm) ji dibistana Xwişkên Tobekar dike. Ev jî piştî mirina metika wê û wan hemû guherînên ku di wê serdemê de li navçeya wan belav bûne, êdî li vir (Xendan) vedigere mala xwe û bi tenê dijî, çimkî bavê wê û dayika wê herduyan jî wefat kiriye, birayên wê jî koçî Ewropayê kirine. Êdî daku (Perwane) zindî bike hertim di bîreweriyê de amade be bîr li nivîsandina hîkayetan dike. Li vir hewldanên wê ji bo dîtina (Nesredînê Bêhnxweş) û zeftkirina serpoşa (Mîdyaya Xemgîn) ku destnivîsên wê tê de ne destpê dike.

Her di vî beşî de (Xendan) bi rêya Masûm (Nesredînê Bêhnxweş) dibîne û serpoşa Mîdyayê jî jê werdigre, ji xeynî hevkarî kirina Nesredîn di vegotinê û xilaskirina hîkayetê de. Ev yekemîn binyata têhelkêş e ku di (Êvara Perwaneyê) de, di navbera sê beşên romanê de derdikeve û ne binyata dawîn e jî, lê careke din jî di beşên (8 û 9 û 10) de, ev şêweya binyata têhelkêş dubare dibe û xwîner jî bi hêsanî dikare têbînî bike.

**“Bajar rengek ji dorpêçê ye, lewma jî derçûna ji ti bajarekî vê dinyayê ne hêsan e, gava di êvara roja dîtir de nameya Perwaneyê gihîşte min, beriya ez namê vekim têgihîştim ku Perwane hêj li vir e û nikarîbû wê dropêçê bişkîne…** Her wê rojê heta êvarê kesî li malê nizanîbû ku Perwane çûye.**“Bav” wek hertim li**

[189]. Îbrahîm Cendray, Fezayê romankî li ba Cebra Îbrahîm Cebra, Weşanxana Karûbarên çandî yê giştî, Bexda2001, r. 84.

**bazara zêrîngeran mijûlî bazin û gustîlk û xişlên xwe bû, birayên min sibehê cilên xwe li xwe kirin û derketin. Kesî nepirsî kanî Perwane?....di êvarê de gava vegeriyan, yekemîn car bavê min pirsî Perwane li ku ye? Min got: Min ew îro nedîtiye, sibehê ez rabûm û ew ne di nav cihê xwe de bû, êdî min ew nedîtiye. Her wê şevê bav bi giriyê xwe hemû pencere şikandin…" (Êvara Perwaneyê, r. 22-23.)**

Diyar e di dawiya beşê çaran de vebêjer behsa reva (Perwane û Ferîdûnê Melek) dike ku di êvareke hînika rojeke biharê de direvin. Ev mînaka jor jî ku me wergirtji destpêka beşê pêncem ê romanê ye ku vebêjer behsa wê yekê dike ku di êvara roja dîtir de nameyeke (Perwane) digihîjiyê û wê agehdar dike ku ew hêj li bajar in û derneketine. Lê hewl didin di siberojê de derkevin. Dubare vedigere bo vegotina bûyerên roja pêştir ku di êvara wê rojê de reva (Perwane) eşkere dibe, çi rû dide? Diyar e weke Xendan ji me re vedibêje, qiyametek di mala wan de rabûye ku wê êvarê bavê wê dizane (Perwane) reviyaye, bi neçarî hawara xwe digihîne xwîşka xwe û ew jî bi rêya wan hejmarên zêde ku li ba wê hene, di tora sîxuran de ku di nav bajêr de belav kirine, (Xendan) didin pêşiya xwe û sê şev û sê rojan bi dû (Perwane û Ferîdûnê Melek) de hemû seranserê bajêr teftîş dikin, lê wan nabînin.

Yanî (Xendan) heta êvara wê roja ku (Perwane û Ferîdûnê Melek) reviyan, her li malê bû û dûre ku reva wan eşkere bû weke ew bixwe amaje pê dide. Ew hemû lêgerîn û teftîşa wan bi dû (Perwane û Ferîdûnê Melek) de, bi beşdariya wê bû û sê şev û sê rojan domand weke ew bixwe dibêje: **"…piştî sê şevan ji neraketinê min dixwest bimirim…." (Êvara Perwaneyê, r. 32.)** Êdî çawa û kengî derfet ji bo (Xendanê) peyda bûye ku bikare nameyeke (Perwane) werbigre, yan gelo bi rastî (Perwane) ew name jê re şandibû? Çimkî ne birayên wê û ne jinên defbidest bo saniyekê jî çavên xwe ji ser (Xendanê) ranekirine û bi berdewamî çavdêriya wê kirine, piştî bêhêvîbûna wan ji dîtina (Perwane û Ferîdûnê Melek) jî, yekser (Xendan) bo mala metê tê birin. Bi rastî têhelkêşeke hunerî ya bedew di zincîreya dema bûyeran de heye û xwîner heta radeyekê ji bêzariyê rizgar dike.

### 3.1.3 Binyata Hevseng:

Binyata hevseng bi heman şêweya binyata têhelkêş destpêka derketina wê di janreya romanê de vedigere destpêkên sedsala borî, dema hinek ji nûseran li şûna bikaranîna binyata têhelkêş pişta xwe bi vê binyatê girêdan bo dariştin û rêxistina bûyerên romanên xwe, çimkî ew taybetmendiyên ku di vê binyatê de hene alîkarekî baş e bo nuximandina rûberekî berfirehtir ê wan bûyerên ku romannûs armanc dike vebêje, herwiha di aliyê hunerî de teşeyeke estîtektir dide metnê, çimkî ev binyat wek ji navê wê xuya dibe (vegotina du çîrokan an zêdetir e, ku bûyerên wan di heman demê de yan di du demên wekhev de rû didin)([190]) û (vebêjer bi dorê beşekî ji çîroka yekem vedibêje, dûre vegotina wê radiwestîne û dest bi vegotina çîroka duyem dike, piştre vegotina wê jî disekinîne û beşekî ji çîroka sêyem vedibêje heta digihe dawî.)([191])

Yanî romannivîs di dema vegotina bûyeran de bi dorê û bi çend caran ronahiyê dide ser çîrokên di romana xwe de, bi cureyekî di çarçoveya çend birran de bûyeran dabeş dike û bi şêweya bi dorê wan ji xala destpêkê digihîne xala dawî, çimkî ew bûyerên ku wan vedibêje di eynî demê de yan di du demên hevseng û nêzîkî hev de diqewimin, ev jî wî neçar dike ku bide ser rêyeke bi dorê da behsa wan bike.

Lê bi nerîna me bikaranîna peyva (hevseng) ji peyva (bi dorê) rastir e bo binavkirina proseyeke bi vî rengî. Çimkî dibe ku teoriya bi dorê di vegotinekê de bê bikaranîn bêyî ku binyat bixwe hevseng be, li gor vê nerînê jî em dikarin (binyata têhelkêş) wek nimûne werbigrin, çimkî di vê binyatê de û li tenişta proseya têhelkêşkirina bûyeran, vebêjer bi dorê beşekî ji bûyera sereke vedibêje û dûre wê bicî dihêle û beşekî bûyera nesereke vedibêje, lê bi rastî ew binyat weke xwe û bi binyata têhelkêş dimîne li beramber(binyata hevseng jî di vegotina bûyeran de

[190]. Binyata Hunerî ya Romanê li Iraqê, r. 55.
[191]. Ferhenga Têgehên Rexneya Romanê, r. 65.

vebêjer divê bi dorê ronahiyê bide ser bûyerên vegotî, lê ev nabe sedemê guhertina bûyeran, ku binyateke hevseng e)([192]).

Bi baweriya hinek rexnegiran, binyata hevseng ji hunera sînemayê derbasî nav romanê bûye, çimkî di sînemayê de, ti dîmenek nikare heta demeke dirêj berdewam be, lê vegotina film pişta xwe bi (tewlîf)a navbera girteyên cuda yên nav dîmenên cuda girêdide. Heman tişt jî di vegotina romanê de rû dide û jê re tê gotin (tewlîfa romanê), lewma ev nav jî lê hatiye kirin, çimkî ji romanê hatiye wergirtin û yekem car di romanê de bikar hatiye û piştre bo nav hunera sînemayê hatiye veguhastin.

Em dikarin du cureyên binyata hevseng destnîşan bikin:

1. Binyata Hevseng a Cih- Mekan.

2. Binyata Hevseng a Demê.

Li gorderketina holê ya çend (cihên)dîtir di binyata romanê de ku dibin mekanê beşekî zêde yê bûyerên romanê, wek (daristan, dibistana xwîşkên tobekar, ew gundê ku Perwane û Mîdyaya Xemgîn tê de tên kuştin) bûyer şax û liq ji wan vedibin û berbelav û belawela dibin, ev jî wiha dike ku di proseya vegotinê de binyatên dîtir derkevin holê wek (binyata hevseng)([193]).

Lewma êdî vebêjer ji beşê 15an û heta dawiya romanê, li gor vê binyatê bûyeran vedibêje.Beşên **(11 û 13 û 15 û 17 û 18 û 20)** bo vegotina bûyerên nav daristanê û dûre bajar û pêkhatina koma îmandaran bo wêrankirina daristanê hatine terxankirin. Beşên **(12 û 14 û 16 û 19 û 21),** vegotina bûyerên mala (Xendan) û Dibistana Xwîşkên Tobekar lixwe digrin. Di beşê **(22)an**de heman bûyer digihin hev û vedigerin Dibistana Xwîşkên Tobekar û ji wir ber bi dawî diçin.

---

[192]. Muna el Seban, Hunera Montajê, Mamoste li peymangeha sînemayê- Akademyaya huneran li Qahîreyê, Rêvebera dibistana erebî ya sînema û Televîzyonê li ser tora internetê,www.arabfilmtvschool.edu.eg.

[193]. Celal Enwer Seîd, Teknîka Vegotinê di romana (Êvara Perwaneyê) ya Bextiyar Elî de, Rêvebriya çap û belavkirina Silêmaniyê, 2009, r. 68.

Di beşê 11an de, vebêjer gihîştina (Perwane û Ferîdûnê Melek) bo daristanê vedibêje û careke dîtir bi (Govend) re digihin hev, lê hîn zû (Ferîdûn) hest bi wê guherîna ruhî dike ku bi ser (Govend) de hatiye.

Piştre di beşê 12 de, vebêjer me ji daristanê dibe mala xwe û behsa wê serdemê ji me re dike ku şêniyên bajêr tûşî nearamiyeke bêsînor hatibûn û herçî serwet û samanên wan hene mezat dikin û hewl didin xwe ji wî bajarê genî xilas bikin. Anku demsala koçkirinê destpê kiriye ku oldar û zilamên dewletê hewl didin rûbirûyî vê diyardeyê bibin.

Her di encama vê yekê de ye jî ku (Dibistana Xwîşkên Tobekar) dirust dibe û (Xendan) û gelekên dîtir yên hevawayê wê li ser çewtî yan tawaneke ku nekirine, di wê dibistanê de tên civandin daku di qonaxên pakbûn û paqijiya ruhî de derbas bibin û û pak bibin.

### 3.1.4 : Binyata Bazineyî

Mebest ji binyata bazineyî di encama wê guherîn û nûbûnê de derketiye holê ku di destpêkên sedsala bîstan de tevahiya aliyên binyata hunerî ya romanê bi xwe ve dîtin, ku "Bûyer di xaleke diyarkirî de dest pê dikin û di dawî de jî vedigerin ser heman xala destpêkirinê."[194] Ev jîtê wê wateyê ku vebêjer di dema vegotina bûyeran de xala dawî ya bûyeran di destpêka vegotinê de nîşan dide. Piştre vedigere bo vegotina bûyerên destpêkê û ji wir ve dest pê dike.Herwiha amaje bi wan hokaran dide ku bûne sedemê gihîştina bûyeran bi encam an xala dawî ya bûyeran û di wê xalê de jî ku dawiya bûyeran û destpêka vegotinê bû, dawî li romanê tê. Yan bi awayekî din em dikarin bêjin vebêjer di rengê bazinekî de bûyeran birêk dixe û wan vedibêje, bi awayekî ku xala destpêkirina zincîra bûyeran dibe dawiya heman zincîrê. Destpêka bikaranîna binyata bazineyî di janra romanê de vedigere bo destpêka sedsala bîstan.

Şêweya binyata bazineyî di çîrok û romanê de tê wateya vegotina wan bûyeran ku "vebêjer di destpêkê de bi vegotina wan bûyerên ku rû dane û bidawî hatine dest pê dike. Piştre vedigere bo xala destpêkê û bûyeran di zincîrekê de birêk dixe, heta wan digihîne bi heman wê xala ku ji wê ve dest pê kiriye." [195]

Yanî di vê cureya romanê de vebêjer di destpêkê de encama bûyeran nîşan dide, herwiha vebêjer di destpêka vegotinê de xala dawî ya bûyeran nîşan dide û dûre

---

194. Fadya Merwan Ehmed el Wense, Vegotin li Cem Jahiz (El Bûxelaa Weke Mînak), Têza Doktorayê, Koleja Edebiyatê – Zanîngeha Mûsilê, 2004, r 134.
195. Ebdilfetah Îbrahîm, Elbunye weldelale fî mecmûet Heyder Heyder elqîsesiye, Eldar eltûnisiye, 1986, r 21.

vedigere bo bûyerên destpêkê û ji wir ve dest bi vegotinê dike. Piştre amaje dide wan hokaran ku bûne sedema gihandina bûyeran bi encam an xala dawî ya bûyeran û di wê xalê de ku dawiya bûyer û destpêka vegotinê bû, dawî li tekstê tîne.

Bi nerîna rexnegir û lêkolînvanan "Şêweya binyata bazineyî wê çaxê hêmaya xwe werdigire dema her bûyerek di romanê de di yek demê de destpêk û dawiya romanê pêk tîne. Bi wateyeke din bûyereke diyarkirî di çarçoveya zincîra bûyeran de pêwist e ku di dawiya romanê de be, lêbelê em dibînin di destpêkê de hatiye behskirin." [196]

Di aliyê dariştin û rêkxistina bûyeran de, ev binyat bêhtir ji binyata şûnketinê nêzîk e. Çimkî di binyata şûnketinê de bûyer her ji destpêkê ve di zincîreke yek li dû yek de têne rêzkirin heta digihin dawî û encamekê. Di vê binyatê de jî piştî pêşkêşkirina bûyeran di destpêka vegotinê de, vebêjer rasterast vedigere bo destpêka derketina bûyeran û ji wê xalê ve ûdi zincîreke yek li dû yekê de bûyeran birêk dixe heta digihe dawî. Binyata bazineyî "Bêhtir di çîrokên polîsî û hîkayetên gelêrî de tê dîtin. Em dibînin her ji destpêka romanê ve em rûbirûyî tawaneke kuştin an diziyeke mezin dibin. Êdî em ligel vebêjer an karakterê sereke yê romanê beşdariyê dikin li lêgerîna bi dû tawanbar de, heta em digihin wan hokarên ku tawanbar teşwîqî encamdana wê tawanê kirine." [197] Ango vebêjer di destpêka vegotinê de dawiya çîrokê nîşan dide, ku tawaneke kuştinê ye yan dizî ye, piştre me vedigerîne bo xalekê ku destpêka derketina bûyeran e û ji wir ve bi şêweya zincîreyî bûyeran vedibêje, heta digihe encamekê û wê xala ku ji wê ve dest bi vegotinê kiriye, bi kurtî em dikarin bêjin di binyata bazineyî de, di destpêkê de encama bûyeran tê pêşkêşkirin û dûre sedem û hokarên bûyeran têne diyarkirin û proseya vegotinê vedigere xala destpêkê.

---

** ((Bûyerên vê romanê behsa bûyerekê dikin ku li gundekî biçûk ê Îngiltereyê rû dane û li ser zimanê doktorekî tên vegotin:

Rêya lêkolînvanê polîs "Hercule Poirot" dikeve wî gundî ji bo bêhnvedanê, piştî ku biryara xanenişîniyê dide. Lê hîn zû bi tawaneke kuştinê re rûbirû dimîne ku kesê herî navdar û zengîn ê wî gundî "Roger Ackroyd" qurbaniya wê tawanê ye. Dûre di nava lêkolînê de "Poirot" kifş dike ku "Ackroyd" ji jinebiyekê hez kiriye û xwestiye wê bixwaze, lê jinebî ji nişkê ve xwe dikuje û di nameyekê de ku di pey xwe re hîştiye, mikur hatiye ku mêrê xwe kuştiye û ji ber kesekî ku bi wê tawana wê zanîbû û berdewam ew bêzar kiriye biryara xwekuştinê daye. Di heman nameyê de jî daxwazê ji Ackroyd dike wî kesî ceza bike, lê Ackroyd ji nişkê ve tê kuştin û name jî winda dibe. Ev dibe sedemê zehmetbûna gihîştin û dîtina wî kesî.Bi vî awayî bûyer dest pê dikin û di dawî de "Poirot" wî kesî dibîne û wî ceza dike.Lêkolînvanê xanenişîn "Hercule Poirot" kesayetiya sereke ya romana polîsî ya "Agatha Christie" ye)).

196. Celal Enwer Seîd, Teknîka Vegotinê di Romana (Êvara Perwaneyê) ya (Bextiyar Elî) de, r 52.
197. Zahir Rojbeyanî, Çîroka Hunerî ya Kurdî, (Şêwe û Şêwaz û Bunyad), Çapxaneya Xanî, Çapa Duyem, Dihok, 2008, r 145.

Ne merc e hertim xala destpêkirina bûyeran di dawî de be û vegeredestpêkê û cardin vegere dawî. Lê ya girîng ew e ku divê ew xala ku bûyer ji wê ve dest pê dikin û di pêşvebirina rêveçûna proseya vegotinê de di dawî de bigihe heman xala destpêkirinê. Êdî ne girîng e ku ew xal di destpêk an navend an dawî de be. Wek mînak romannivîsa brîtanî(Agatha Christie 1890 – 1976)di romana (Kuştina Roger Ackroyd – 1926 The Murder of Roger Ackroyd) ku romaneke polîsî ye, bi vî awayî sûd ji binyata bazineyî hatiye wergirtin ji bo vegotina bûyeran. Di romanên kurdî de jî (Pêdeştî Karmamize Kujrawekan) a (Şêrzad Hesen), bi vî awayî sûd ji binyata bazineyî wergirtiye.Lê naveroka bûyerên vê romanê behsa kelem û kêşeyên civakî yên civaka kurdî dikin.

Du şêwe di binyata bazineyî de tên bikaranîn: **(Sade, Awîte)**

**1. Sade:** Di vê şêwazê de vebêjer sûdê ji tevlîhevkirina herdu binyatên (Şûnketin û bazineyî) werdigire, ku binyata bazineyî bi xwe di bingeh de bi vî awayî tê avakirin, bi şêweyekê dawiya bûyerê nîşan dide, dûre vedigere destpêkê û di zincîreke yek li dû yekê de bûyeran birêk dixe, heta wan digihîne dawî, bêyî piştgirêdana bi kirdeyên qut qutîkirin an pêş û paşxistin û têkilîhevkirina bûyeran.

**2. Awîte:** Di vê şêwazê de vebêjer di proseya vegotina bûyeran de tevî bikaranîna binyata bazineyî, pena dibe ber bikaranîna binyatên din jî, wek (binyata têkilîhevkirin “pêş û paşxistina bûyeran”, binaya hevseng), wek em di romana “Êvara Perwaneyê” de dibînin.

Taybetmendiyeke din a binyata bazineyî girêdayî zelalî û nezelaliya encama dawî ya bûyeran e, çimkî di vê binyatê de vebêjer di destpêka proseya vegotinê de ronahiyê diavêje ser wê xala ku tê de dawî li bûyeran hatiye anîn. Ev jî wiha li xwîner dike bi awayekî ji awayan serwextî çarenivîsa bûyeran be û her ji destpêkê ve bizane bûyer bi çi encamekê dawî li wan hatiye anîn. Ji ber vê pêwist e romannivîs celebekî nezelaliyê di destpêka romana xwe de bikar bîne û rê nede xwîner serwextî temamiya encama bûyeran û hurdekariyên hinek diyarde û bûyeran be û çend aliyekî veşartî bihêle, da berhema wî çêja xwe ji dest nede. Çimkî eger her ji destpêkê ve xwîner agehdarî çarenûsa bûyeran bû, êdî ew arezûya wî ji bo şopandina zincîra bûyeran û çawaniya rûdan û bi encam gihîştina wan namîne.

Li gor vê riwangeyê jî, û li gor siruşta destpêka romanên kurdî, em dikarin du celebên destpêkê destnîşan bikin:

**1. Destpêka Ron (Zelal):** Destpêkeke ku tê de vebêjer encama dawî ya bûyeran nîşan daye, her ji destpêkê ve xwîner dibîne ku çarenûsa bûyeran çi ye û ber bi kû ve diçin.

**2. Destpêka Neron (Nezelal):** Destpêkeke ku tê de vebêjer hinek alî neeşkereû nihênî hîştine û di destpêkê de behsa wan nekiriye û xwîner neçar dike, heta kêliya dawî ya çîrokan bi pey bûyeran bikeve. Ji bo vê xalê jî romana (Êvara Perwaneyê) ya

(Bextiyar Elî) [198] mînakeke bisûd e û hem mijara lêkolîna me ye jî. Di vê romanê de vebêjer binyata bazineyî di birêkxistin û dariştina bûyeran de bikar aniye, ku destpêka romanê ne destpêkeke ron (zelal) e.

Wek siruşteke binyata bazineyî vebêjer di vê romanê de karaktera sereke ye. (Xendana Biçûçik) di destpêkê de hinek têgihîştin derbarê naverok û taybetmendiya wê çîrokê nîşan dide, ku dixwaze vebêje, lê li wê yekê mikur tê ku zanyariya wê derbarê hertiştî nîne û gumana wê heye ew çîroka ku vedibêje çîrokeke temam be û bi vî rengî dest pê dike "Ez Xendana Biçûçik berî niha bi çend salan di wan hemû bûyerên ecêb de, ku di dawî de dijwar bû heya hinekî mezin nebim bikarim ji hemû wateyên wan têbigihim û wan binivîsim jiyam; ew bûyerên ku vêga weke yekeyeke hevdûgirtî li wan dinerim, ne ku tenê ji ber ku pêwendiyeke mezin di navbera wan hemû tiştên ku qewimîn de hebû; lê ji ber wiha têdigihim ku qeder û çarenivîsên mirovan jî bi hêsanî ji hevdu nayên cudakirin." (Êvara Perwaneyê, r 5) Vebêjer ji destpêkê ve amaje dide wê yekê ku, ew bûyerên ku wan vedibêje di rabirdû de rû dane û wan di kêliya siberojê de vedibêje.

Lê em têbînî dikin ku vebêjer di vê xalê de ranaweste û pêşwext ji me re radigihîne ku, mumkin e ew bûyerên ku wan vedibêje ne temam bin û çend aliyên wan bi nihênî mabin, **"Nesredînê Bêhnxweş vêga jî ji min re dibêje `Lezê neke.` Fetane jî di wê baweriyê de ye ku em hê jî nikarin ji rastiya wan roj û bûyeran têbigihin. Gumana herduyan heye ev çîrok çîrokeke bidawîhatî be, ne ku tenê ji ber wê yekê ku ewên di wan rojên ecêb de jiyan, îro mirî ne yan bar kirine yan jî di quncikeke vî welatê westiyayî de wendayî ne; lê dibe ji ber wê yekê ku şûnşopa piraniya cihên ku min û Perwane, her yek bi awayekî cuda, ew heyam li wan birin serî, nemaye."**(Êvara Perwaneyê, r 5) Ev hokar xwîner teşwîq dike ku bide pey bûyeran, da ku bizane çima (Xendana Biçûçik) ku vebêjera sereke ya bûyeran e, haya wê ji hemû nihêniyên wan çîrokan tune ku wan vedibêje û çi wiha lê kiriye çîrokekê vebêje ku ew bi xwe negihîştiye nihêniya hinek aliyên wê? Ev jî çêjeke zêdetir diyarî tekstê dike û amajeyeke jî bo jêhatîbûna nivîskar, çimkî her ji destpêkê ve ji xwîner re radigihîne, li hember tekstekê ye ku hinek aliyên wê bi nihênî û nezelalî mane û mumkin e ti carî bi wan negihe. Bêguman ev xal jî dibe sedemê handana xwîner bo şopandina bûyeran û eşkerekirina wan aliyên ku bûne sedema xuliqandina wê nezelaliyê.

Tevî wê mikurhatina vebêjer ku bi nekamilî û nîvcomayî wê çîrokê vedibêje, lê amaje dide wan hokaran ku ew han dane bo jinûve zindîkirina wê çîrok û serpêhatiyê **"Pêre jî tasewaseke tarî û gumandar min dehf dide ez vê çîrokê vebêjim, heye ku ev tasewasa têfikirîna mirov be di wan cîhanên ku di wan de jiyaye û nekariye wan fam bike; tasewasa têfikirîna mirov be di wan rojên ku me li pey xwe dihêlin û di dawî de ne bi riya çîrokan be li me nayên vegerandin."** (Êvara Perwaneyê, r 5) Herwiha **"Dîtinawê serpêça spî ya Mîdyaya Xemgîn, ew serpêça ku bi hemû destnivîsên Mîdyayê di wê daristana bêhêvîtiyê de tije bû, motîveke balkêş bû da ku ji nûve bi vegotina çarenivîsa me bifikirim."** (Êvara Perwaneyê, r 6)

[198]. Êvara Perwaneyê, (Roman), Bextiyar Elî, Çapxaneya Renc, Silêmanî, 2007.

Ji vê xalê ve ku destpêka proseya vegotinê û dawiya bûyer û serpêhatiyên vegotî ye, me vedigerîne destpêka bûyeran û ji wir ve dest bi vegotin û behskirina bûyerên wan rojan dike ku wan bixwe (Xendana Biçûçik) û (Perwane) goştê qurbaniyan belav kirine **“Wê rojê gava me dest bi dabeşkirina beşên qurbaniyan kir, dixuya ji hemû rojên dî bêhtir qurbanî hatibin şerjêkirin, wê êvarê min got xwîn wê bajar li ber xwe bibe, min got ga li ser rûyê erdê nehiştine…”** (Êvara Perwaneyê, r 7) û ji ber wê dabeşkirina goşt ew bi “Ferîdunê Melek” re dibe nas “. **Li wir me li deriyekî qubedar û mezin da, deriyekî ku seranser bi mîroyan nuxumandî bû. Çend caran me li xelekekekevin û li zengilê li ba derî da, piştî bîstekê ciwanekî zirav derî li me vekir, nîv behitî û heyirî got: Ez li benda we bûm…Ew(Ferîdunê Melek) bû ku piştre ez tenê wî di şevên tarî, berbangan û toz û xwelî û icacokên spî de dibînim.”** (Êvara Perwaneyê, r 8-9)

Piştî aşnakirina xwîner bi destpêka destpêkirina bûyeran, vebêjer ji nişkê ve vebirînekê di demê de diafirîne û vedigere dawiya bûyeran û di beşa duyem de behsa derçûna xwe û (Fetane û Masûm) ji dibistana xwîşkên tobekar dike û dibêje ku ev bûyer piştî mirina metê û piştî wan guherînan bûn ku di wê serdemê de jiyan û welat hejandin, piştre berdewamiyê dide bûyeran û behsa awayê jiyan û debara xwe dike piştî koçkirina birayên wê ji bo Ewropayê û mirina dê û bavê wê: **“Wê çaxê birayên min bar kiribûn, bav û diya min jî ji mêjve bû miribûn, divabû bi tenê di wê mala vikî vala û mezin de bijîm û wan jiyan û serpêhatiyên ecêb bi hev ve bikim ku di salên tirs û tenahiya min de, bi awayekî balkêş hemû berbi tarîtî û bextreşiyê dageriyan.”** (Êvara Perwaneyê, r 9)

Tevî hewldanên wê jibo zindîkirina Perwane, bi rêya nivîsandina çîrokên wê, çimkî bi baweriya wê nivîsandina çîroka Perwane **“Ji min re ev çîrok ne çîrokeke û hew, lê anîna Perwane bo nav cîhanê ye.”** (Êvara Perwaneyê, r 9) Lewra jî planê datîne ji bo dîtina (Nesredînê Bêhnxweş wênegirekî ahengan û yek ji girîngtirîn çavkaniyên bidestxistina zanyariyan ji bo Xendanê) û bidestxistina serpoşa (Mîdyaya Xemgîn), ku destnivîsên Perwaneyê tê de ne, lê piştî ku Xendan Nesredîn dibîne ew naxwaze tiştekî bêje **“Xendana Biçûçik ji min bigere, ez êdî bi dema buhurî de nafikirim.”** (Êvara Perwaneyê, r 12) û hewl dide ji rabirdûyê bireve, çimkî wek Xendan behs dike **“Ez dereng pê hesiyam ku ew di bin êşeke wîjdanî ya kûr de dinaland. Ez dereng têgihiştim ji sîbera xemeke çawa direve. Bi dirêjiya wan salan ew di bin zexta wan hestên ecêb de jiyabû ku mirina Perwane di stûyê wê de ye, guneha wê ye ku Ferîdun rastî wê newalê hat, guneha wî ye eşq kal bûn…”** (Êvara Perwaneyê, r 13) Ligel vê yekê jî Xendan dev jê bernade û doza deftera bîranînê Mîdyaya Xemgîn jê dike, ku Ferîdun wek deryayeke nihêniyên bixof wesf dike.

Piştî encamdana vê vebirîna demê, vebêjer careke din vedigere bo destpêka bûyeran û destpêka çîrokên Perwaneyê, ku di demsalekê de dest pê dikin vebêjer navê wê dike (Demsala xeyalan) û tê de behsa têkiliyên bêhejmar ên Perwaneyê dike, ku Ferîdunê Melek yê herî dawîn e **“Di dawiya wê demsalê de gava Ferîdunê Melek nameya xwe ya yekem ji Perwane re nivîsand `tevî ku destpêka demsala**

**xeyalan bû`, lê diltengiyeke kujer baskê xwe li ser me herduyan vedabû."**(Êvara Perwaneyê, r 15) Piştre behsa xwestek û xewna berdewam a Perwaneyê bo rêwîtî û terikandina malê dike **"Carna nîvê şevan radibûm û min didît bi komkirina tiştên xwe ve mijûl e, awirek dida û digot: Xendan li min bibore dibe ku herim, divê ez xwe amade bikim."**(Êvara Perwaneyê, r 18) ku di encamê de, di nîveşeveke biharê de xewna reva wê dibe rastî û di berbangekê de diçe.

Di birrê pêncan de vebêjer behsa êvara piştî reva Perwaneyê dike, ku çawa çûna wê li malê eşkere dibe û ew (vebêjer) dibe qurbaniya wê kirdeyê ye **"Wê rojê heya êvarê kesî li mal nizanibû Perwane çûye. Bav wek hergav li sûka zêrîngeran bi bazin, gustîlk û rîşiyên xwe ve mijûl bû. Birayên min sibehê xwe guherandin û çûne derve, kesî nepirsî `Kanî Perwane?`...Êvarê gava vegeriyan, cara pêşî bavê min pirsî `Perwane li kuderê ye?`, min got `Min îro ew nedîtiye, ez sibehê rabûm û ew ne di cihê xwe de bû, êdî min ew nedîtiye`. Heman şevê bavê min bi girî hemû pencere şikênandin, derî şikênandin, hemû tiştên xweşik û antîke yên malê parçe parçe, piç û parî kirin. Birayên min, min ji pora min xişikandin û birin jêrzemînê, bi pêpilokan de kişkişandim û weke dînan dest bi lêdan û wêrankirina min kirin..."** (Êvara Perwaneyê, r 26-27)Herwiha amaje dide wê yekê ku xizm û kesûkar li kuçe û kolanên bajêr geriyane bi armanca dîtina Perwane û Ferîdun û cezakirina wan, çimkî bi baweriya wan (ew du ciwan zinêkar in û divê bêne kuştin), lê wan nabînin, piştre bavê wê ji meta wê (ku miroveke îmandar e ) re dibêje: wê bibe cem xwe û jê re dibêje: **"Vê keçê ji xwe re bibe, bi keçên xwe re mezin bike û wê fêrî hemû tiştên ku divê jineke baş bizanibe, bike."** (Êvara Perwaneyê, r 41)Û Xendan jî gava dibîne derfeta xilasbûn û felata wê tune, bi neçarî biryar dide stûyê xwe li hember wê rastiyê biçemîne**"Min biryar dabû hemû tiştê ku ew dispêre min, bicih bînim. Em bi wan jinên defbidest re diçûn şînan, diçûn xetiman, di wan de min tevahiya memleketên birîndar yên lûbandin, lixwedan, û bi cizbeketinê dîtin. "**(Êvara Perwaneyê, r 46)

Her di wê demê de jî bi cîhana metê û jinên defbidest û wan mêrên ku metê ew vedişartin re dibe nas**"Êdî bi awayekî berdewam yek li pey yekî ew mêrên şevnişîn yên ecêb derdiketin û çend şevan li wir diman û piştî demekê diçûn û êdî şûnşopa wan nedima. Hinekan ji wan jinên xwe kuştibûn, hinekan xuşkên xwe gurandibûn, hinekan asît avêtibûn ser keçên xwendingehan, yan fitûyeke meleyekî ya kuştina zindîqekî yan zinêkarekî bicih kiribûn."**(Êvara Perwaneyê, r 48) Lê piştî derbasbûna dema sê mehan li mala metê û raketina Xendanê bi yekî ji wan mêrên nenaskirî yên mala metê re "di şeveke pir tarî de"rojekê metê wê dide pêşiya xwe û wê dibe mala wê. Piştî derbaskirina demekê li malê jî, rojekê yek ji hevrêyên Perwaneyê tê ba wê û nûçeya Perwaneyê pê radigihîne û jê re dibêje ku Perwane sax e û bi Ferîdun re li daristaneke himbiz a dûrîdest dijîn, peykerek jî ji Xendanê re şandiye û di bin de bi hûrbînî navê xwe li ser kolaye.

Em têbînî dikin di van çend paragrafên borî de vebêjer bi şêweya zincîreyî bûyer vegotine û birêk xistine. Ev pratîzekirina binyata zincîreyî ye. Lê di beşa nehem de gava bûyeran vedibire û vedigere dema beriya destpêkirina bûyerên sereke yên çîrokê, yanî beriya destpêkirina (demsala xeyalan) û ji wir ve destpêkeke kûrtir a bûyeran nîşan dide û di para nehem de behsa çawaniya bihevgihîştin û hevdunasîna Ferîdunê Melek û Nesredînê Bêhnxweş dike, ku bi rasthatin di yek ji wêneyên Nesredîn de derdikeve û dûre ew û Nesredîn û Govendê Peykersaz ku Ferîdun pê dinasîne dibine sê hevrêyên nêzîkî hevdu,**"Di êvarekê de sê muzîkvanên nûgihiştî ku hersêyan bi awayê semfonîstên bi nav û deng porên xwe berdabûn ser çavên xwe, rica ji Nesredîn kirin wêneyekî wan bigire, bi tesaduf di wî wêneyî de Ferîdun, weke sîberekî cilreş jî bi sîmayeke hinekî xemgîn derketibû."**(Êvara Perwaneyê, r 68-69)

Piştre rêveçûna bûyeran digihîne destpêka çîroka asayî û ronahiyê diavêje ser yekem bihevgihîştina Ferîdun û Perwane di demsala xeyalan de û di dawî de behsa plan û hewldanên wan dike bo rêwîtîkirin û terikandina bajêr û çûna bo cihekî ku azadî û eşq lê hebe, ku di encamê de bi hevkariya Nesredîn hewldanên wî serî digirin û diçin. Nemaze piştî ku Nesredîn bixwe bajar diterikîne û berê xwe dide siruşt û daristan û cihên asê, ji bona dîtina cihekî, ku wî bike memleketa wan aşiqên ku ji ber zor û kotekiyê ji bajêr **direvin "Di wê heftiyê de bû ku hemû jiyana me guherî û Perwane çû...çû û li cîhaneke dî, di nav daristanên dûr de, Nesredînê Bêhnxweş weke hejmareke dî ji dildaran berbi binê newaleke kûr birin."**(Êvara Perwaneyê, r 99)

Herwiha tevî ku vebêjer bixwe yek ji karakterên romanê ye, hemû bûyer bi rêya wê yan li ser zimanê wê nayên vegotin, lê proseya vegotinê ji hêla bêhtirî karakterekî ve tê encamdan. Ango vegotin pirdengî ye. Ev jî mecalê ji bo karakteran diafirîne da helwest û nerînên xwe li hember diyarde û bûyeran nîşan bidin. Wek mînak Nesredîn di behsa wan hokarên ku ew han dane bajar biterikîne û berê xwe bide cihên asê de dibêje: **"Ez niha xebatkarekî naskirî me bo welatê xwe, lê va ye ev welat ji evînên bêsûd û kuştî dirust bûye, ez hatime ser xeyaleke ecêb, hatime ser wê baweriyê ku li cihekî hinek işqan azad bikim, hatime ser wê xeyalê ku parçe zeviyeke asê bikim navenda hinek aşiqên ku cihekî wan tune tê de bi hevre bijîn...."**(Êvara Perwaneyê, r 83)Herwiha Ferîdun jî li ser çawaniya dirustbûn û jidayikbûna eşqa Perwane di dilê wî de ji Perwane re dibêje: **"Min her êvareke hînik te didît, lê min ji te hez nedikir, heya êvarekê min hest kir hewa seranser tije bûye ji xweliya perperîkan, min hest kir cilên min, destê min, rûyê min, birihê min hemû toza nazik ya perperîkan e, tozeke nerm ku ti kesê dî nedidît ji min pêvetir, ez ne di wê baweriyê de bûm mirovek hebe wekî perperîkan xubar û tozeke wiha nazik hilgirtibe."** (Êvara Perwaneyê, r 87) Her ev helwest derbirîn li cem karakterên din jî dubare dibe derbarê bûyeran, ku vebêjer neçar dibe bo amaje pê kirina wan bêhtirî carekê zincîra asayî ya bûyeran têkbişkîne, ev jî pêrewkirina binyata têkilîhevkirinê di birêkxistina bûyeran de ye.

Heta vê demê vebêjer di vegotina bûyeran de rexmî bikaranîna binyata bazineyî, binyata têkilîhevkirinêjî bikar aniye, lê di xwendina parên dahatû yên romanê de derdikeve, ku ne tenê ev herdu binyat hatine bikaranîn, lê binyata hevseng jî hatiye birêkxistin û vegotin, bi vî rengî:

Wek me amaje pê kir di binyata bazineyî de ku bûyerên tewera yekem di parên "11, 13, 15, 17, 18, 20" pêkhatine, tewera duyem jî parên"12, 14, 16, 19, 21" lixwe girtiye.

Vebêjer di para 11an de behsa seferkirin û gihîştina Perwane û Ferîdun bo daristanê dike û piştre aşnabûna wan bi Siyamendê Balinde û Mesûme re, ku yekem kes bûn hatine vê daristanê**"Siyamendê Balinde kesê yekê bû ku hate vê dehlê, piştre jî hinek dildarên şermîn û bêxeyal yên dî berê xwe dan vê herêmê, hinek ji wan aşiqên bêmiraz ku Nesredîn ji demekê ve ew nas dikirin, piraniya wan ew keç û xortên bêmirad bûn ku berê di şikeft û bin keviran de xwe veşartibûn."**(Êvara Perwaneyê, r 105)

Di para 13an de jî berdewamiyê dide bûyeran û di destpêka parê de behsa jiyana nav daristanê dike, ku aşiqên niştecî kepir tê de vedane û jiyanê derbas dikin, piştre vebirînekê di demê de diafirîne û vedigeredawiya çîrokan û bi rêya guftûgoyeke di navbera xwe û Nesredîn de hinek bûyeran ji me re vedibêje, di dawî de jî careke din vedigere ser çîroka nav daristanê û serpêhatiya karaktera (Şehlaya Xudanas) vedibêje, yekem kes e Perwane wê nas dike û pê re dibe nas.

Bûyer di para 15an de rengek ji guherîn û pêşketinê lixwe digirin, çimkî ew rewşa ku welat tê werbûye û ew şer û kavilkariya ku lixwe digire, kar kiriye ser şêweya jiyana daristanê û rengek ji bêhêvîtî û îzolebûnê afirandiye ku vebêjer navê wê kiriye (demsala îzolebûnê), çimkî ew peykerên ku dirust dikirin dişandin bo bajêr da debara jiyana xwe pê dabîn bikin, êdî nedihatin firotin**"Xirab pê re bû. Wî hemû mêrên cingalê kom kirin û got `Êdî sazkirina peykerê wan aşiqan bê sûde, şer li hemû cihan derketiye, agir girtiye erdê, di zemanekî wiha de kes ne amade ye peykerê aşiqan bikire, ez çend û çend rojan tevî van tûrikan digerim, demeke dirêj e bajar bi bajar digerim, lê êdî kes li van peykeran nanêre..."**(Êvara Perwaneyê, r 168) Herwiha di heman demê de celebek ji dûrketin û bi hevdu xerîbbûn di navbera aşiqan de derdikeve û berfireh dibe, çimkî hest dikin ew xewn û xeyalên ku li ba wan hebûn, ji çend wehm û xeyalên hizrkirî yên wan derbas nekiriye û vebêjer ji zimanê Mesûme ve dibêje:**"Wê demsalê roj û heyameke seyr bi xwe re anî, me hemûçkan wiha hest dikir dinya ji hev dikeve, dinya parçe parçe dibe û em jî her yek ji me dibe giraveke belawela û îzole. Me hemûçkan zanibû wateyeke jiyana me nîne. "**(Êvara Perwaneyê, r 167), her lewma di rojên dahatû de**"Bablîsoka xemeke bixof tê nav daristanê. Demsaleke çilmisîn û xemê, ku demsala girî û hêsirên Perwane ye."** (Êvara Perwaneyê, r 180), herwiha Mesûme jî ji ber wan azarên ku bi destê Siyamend rastî wan tê ji daristanê direve û vedigere.

Vebêjer para 17an taybet kiriye bi behskirina çîroka rev û vegera Mesûme bo bajêr, ku dikeve destê (Mela Kewser) û piştre temamiya çîroka xwe û daristan û keç û xortên aşiq ên nişteciyê daristanê ji xelkê re vedibêje, ev jî mela û çend îmandaran han dide biryara dîtin û nehîştina wê herêmê bidin ku bawer dikin şeytan nişteciyê wê ye û wê birêve dibe. Di para 18an de jî vedigere cem serpêhatiya Siyamend ku **"piştî reva Mesûm, êvarekê Siyamendê Balinde jî hemû tiştên xwe pêçan û bêyî ku xatirê xwe ji kesî bixwaze, daristan terikand...êdî kes jî dûre nûçeya rasteqîn derbarê çarenûsa wî nebihîst.** "(Êvara Perwaneyê, r 203), herwiha Perwane jî bi derbasbûna demê re bêhtir bi çûna xelwetê ya Ferîdun hest dike **"Em ji dinyayekê reviyan ku hemû tiştên wê berê hatibûn diyarkirin"**(Êvara Perwaneyê, r 207)

Di para bîstan de vebêjer behsa temamkerê bûyerên daristan û terikandina wê herêmê dike ji aliyê Perwane û Mîdyaya Xemgîn ve, çimkî piştî ku Nesredîn nûçeya êrişkirina artêşa îmandaran bo nehîştina daristanê dibihîze, diçe daristanê û hewla rizgarkirina aşiqên nişteciyê wê dide, lê Govend û Ferîdun pê re naçin û dimînin. Ew jî bi neçarî Perwane û Mîdyayê bi xwe re dibe û di maleke gundekî de ku xwediyê wê navê wî (Pîr Mûsayê Xezannas) e û dostekî Nesredîn ê kevin e wan vedişêre, piştre hewl dide vegere eşqistanê û Ferîdun û Govend rizgar bike lê têk diçe, vebêjer di vê astê de bûyerên tewera yekem diterikîne û berê xwe dide vegotina bûyerên tewera duyem, ku di dawî de di para (22)an de wan bi hev ve girê dide û diçe ser wê xala ku dawiya bûyerên vegotî û destpêka proseya vegotinê pêk tîne.

Di para 12an de vebêjer behsa rewşa pir nearam û têkdayî ya bajêr dike, ku şêniyên wî bi her hawî hewl didin jê xilas bibin û xeyala sefer û terikandinê di mejiyê hemû nişteciyan de şîn hatibû, Xendan jî wek yek ji nişteciyê wê bêpar nebû ji bandorên wê yên neyînî, çimkî îmandaran ew lêmişta seferê wek guneheke mezin didîtin û hewl didan rûbirûyî wê bibin û dibistana xwîşkên tobekar damezrînin, da bi rêya wê keçan ji wan gunehan paqij bikin, ku kesûkarên wan kirine û Xendanê jî ji ber reva Perwane dibe yek ji qurbaniyan û ji bo wê dibistanê tê şandin**"Ez Xendana Biçûçik, `esreke hînik cîhana min serobinî hev bû; `esreke hînik berovajî hemû bendewariyên min, bavê min zû ji bazara zêrîngeran vegeriya û bi hêminî ji min re got `Xwe biguhere, kirasekî reşî dirêj lixwe bike, û çarikekê bide serê xwe û were em herin."**(Êvara Perwaneyê, r 115)

Di para 14an de vebêjer berdewamiya çîroka çûna xwe ji bo dibistana xwîşkên tobekar vedibêje, ku ew sê jinên ku wê dibin jê re dibêjin **"Em ê te bibin buhiştê"**(Êvara Perwaneyê, r 146), her li wir (Fetaneya Xemgîn) nas dike, ku xwîşka Mîdyayê ye. Piştre di para 16an de, behsa waneyên pakbûnê dike ku mamoste (Zeyneba Kwêstanî) ji wan re dibêje û hewl dide bi şîret û gotinên xwe yên balkêş li ser jiyana nû ya dibistanê wan rahênan bike. Ev jî wiha li Xendanê û tevahiya keçên din dike **"Di ruhê me hemûyan de hesteke seyr dirust kiribû, me hemûyan hest bi pîsîtiyê dikir, em ewqasî pîs in, divê di nav bi dehan rêyên aloz û sirûdên seyr**

**de derbas bibin da em pak bibin".**(Êvara Perwaneyê, r 187) Her di wê demê de Xendan hest dike ew mêrê ku di mala metê de pê re raketiye vedigere jiyana wê, lê gava bo hevrêyên xwe û Zeynebê re vedibêje jê bawer nakin û Zeynebê jê re dibêje: **"Xendan, Xendana Biçûçik, (tobe) divê ji kûrahiya dil be, hêj wesweseya gunehan bi te dilîzin. Hêj arezûyên te te dilivînin."** (Êvara Perwaneyê, r 189)

Di para 19an de vebêjer behsa rewşa dibistanê dike, ku çawa bi asayî derbas dibe û ev jî ji ber wergirtina posta berpirsa pirtûkxaneya dibistanê û celebekî ji asûdehiyê jê re vedigere, lê her zû ev atmosfera siruştî ya dibistanê ji ber xweşewitandinaLeyla – yekê ji keçan" têk diçe. Ew girnijîna ku çend sal bû li ser lêva Xendanê bû têk diçe û winda dibe **"Piştî şewitîna Leylayê êdî ew girnijîn di jiyan û sîmaya min de hate qirkirin"**(Êvara Perwaneyê, r 229)

Di para 22an de vebêjer herdu tewerên bûyerên romanê bi hev ve girê dide, di destpêkê de behsa sefera xwe û metê û Fetane û bavê Fetane û çend kesayetiyên din dike bo wî gundê ku Nesredîn Perwane û Mîdyayê tê de veşartine. Piştre behsa bi hevdu şabûna xwe û Perwane di odeke mala (Pîr Mûsa) de dike, lê ji ber wî karwanî (karwanê mirinê – li gor navlêkirina Xendanê) ku ji hejmareke pir mezin a xelkê pêkhatibû xwe bo cezakirina Perwane û Mîdyayê amade kiribû, nikarin demeke zêde bi hev re bimînin û her zû xelk Perwane û Mîdyayê rapêç dikin û wan di bin darekê de dikujin. **"Yek ji mamosteyan hate pêş û bi çend fermanekê hemû agehdar kirin ku ji bilî bira û kesên keçan mafê kesê dî yê beşdarîkirinê tune. Heman mamosteyî bi hêdîka piştî arambûneke newext dest bi xwendina sirûdeke dirêj kir. Gava mamoste sirûda xwe xilas kir, vegeriya cihê xwe û îcar birayên min ligel temamiya koma gulebarankirinê çekên xwe bilind kirin. Di wê demê de ku Perwane rûbirû li mirina xwe dinihêrî, ku êvara mirina wê ji asoyan ve pêdikeve, ku em hemû bendewarê dengê bixof ê tifingan bû, bêdengiyeke seyr baskê xwe li ser dinyayê vegirt...dema dengê tifingan bilind bû, dinya di çirkeyekê de tije bû bi tozê, ez piştrast bûm ku Perwane dibe toz, dibe ew toza hevrîşmî ya birîqedar û nerm. Tifing bêdeng dibûn û Perwane hîn li ser piyan bû. Mîdya ket û Perwane her li ser piyan ma. Diyar bû nakeve, lê bi awayekî seyr belav dibû. "**(Êvara Perwaneyê, r 271-272) Di dawî de jî vebêjer behsa bidawîhatina „êvara perwanyê" dike ku êvareke xemgîn e û ew nav jî ew û Fetane wek kodekê di nav xwe de bikar tînin.

Di para dawî de vebêjer arasteya bûyeran ber bi wê xalê dibe, ku tê de dawî li bûyeran aniye û ji wê ve dest bi vegotinê kiriye. Destpêka vê parê jî, bi gihîştina Mesûme bo dibistanê dest pê dike, ku ji zarê wê ve em çîrokên eşqistanê dibihîzin. Dûre behsa vegera xwe û Fetane û Mesûm bo mala xwe dike, ew mala ku piştî mirina bavê wê û koçkirina birayên wê bo derveyî welêt jê re mabû. Piştre tê ser behsa çawaniya nivîsandina çîrokan, ku çawa qut qutî û netemam gihîştine destê wê **"Gava min dest bi çîroka xwe kir, tekane delîlê min Nesredînê Bêhnxweş bû"**(Êvara Perwaneyê, r 289) Di dawî de jî amaje dide wê kêlîka ku tê de mijûlî

nivîsandin û vegotina çîrokan e û dibêje: **"Ez qelema xwe datînim û dibêjim bes e"**(Êvara Perwaneyê, r 292)

Bi vî rengî vebêjer di wê xalê de ku dawiya bûyeran û destpêka proseya vegotinê pêk tîne, dawî li romanê tîne. Lê dawî dawiyeke vekirî ye, çimkî vebêjer bixwe mikur tê ku ne serwextî temamiya bûyeran e û mumkin e hinek bûyer ji wê araste û rêveçûnê cuda bin ku vê jê re kişandine. Herwiha paşeroj û çarenûsa xwe û çend karakterên din ên romanê (Mesûm û Fetane û Nesredîn) vekirî û nediyar mane û arasteya wan nediyar e.

Ji nîşandana diyartirîn bûyerên romana „Êvara Perwaneyê“ ve, ji me re derdikeve ku binyata bazineyî di vê romanê de binyateke awîte ye, çimkî nûser di birêkxistina bûyeran de tevî bikaranîna binyata bazineyî, her yek ji binyatên "têhellkêş û hawseng" jî bikar aniye. Wek mînak di para „1“ de praktîzeya binyata bazineyî kiriye û di wê parê de dawiya bûyeran nîşan daye, piştre ji wir ve vegeriyaye bo destpêka bûyeran û dest bi vegotinê kiriye. Lê di para „2“ de vebirînek di demê de afirandiye û vegeriyaye bo dawiya bûyeran. Di parên „3, 4, 5, 6, 7, 8“ de pêrewa binyata şêwnkewte kiriye û bi şêweya zincîreyî bûyer vegotine, lê di para „9“an de careke dinvebirînek di demê de afirandiye û bi şêweya vegera derveyî vegeriyaye bo xala beriya destpêkirina bûyeran. Careke din û di para „10“ de vegeriyaye ser zincîreya asayî ya bûyeran, dûre û ji para „11“an ve heta dawiya romanê binyata hawsengê bikar aniye. Herwiha bi dirêjiya tekstê jî ronahîxistin e ser nerîn û helwesta karakteran amade ye û bi awayekî berdewam diyar dibe. Li tenişta wê jî vebirîn û pêş û paşxistina bûyeran diyardeyeke hestpêkirî ye û di bêhtirî parekî de dubare bûye. Ev hemû binyatê diguherin ser binyateke bazineyî ya awîteyî.

Eger em têbînî bikin em ê bibînin ku nûser di bikaranîna binyatên vegotina bûyerê de jêhatîbûneke mezin nîşan daye. Ev jî bi rêya bikaranîna çar binyatên curbicur ên vegotina bûyerê di yek romanê de, lê di aliyê rêjeya zêdebûn û kêmbûnê di bikaranîna her yekê ji wan de cudahî heye. Wek me di destpêkê de amaje dayê, ku binyata giştî ya bûyeran binyateke bazineyî ye û hemû binyatên din di çarçoveya wê binyata bazineyî de hatine bikaranîn.

Binyata hevseng jî ji hemû binyatên din bêhtir hatiye bikaranîn. Ev jî ji ber wê yekê ye ku bi awayekî giştî her ji destpêkê ve heta dawî atmosfereke nearam baskê xwe li ser fezaya romanê de vedaye. Ev atmosfera nearam jî wiha kiriye ku bi şêweyeke berçav zincîreya dema bûyeran têkbişke û di heman demê de vegerandin û pêşketineke zêde di rêveçûna proseya vegotinê de rû bide. Binyata têkilîhevkirinê jî nîvê bûyerên romanê pê hatine vegotin. Piştî vê jî binyata zincîreyî ku kevinitrîn binyata vegotina bûyerê ye, li gor cureyên din ên binyatê beşekî bûyerên romanê pê hatine vegotin.

## Destpêkek derbarê fezaya giştî ya romanê

Pêkhateya romana Êvara Perwaneyê li ser hîm û binemaya berberî û nakokiya navbera du cîhan û cîhanbîniyên cuda de hatiye damezrandin. Ew cîhana ku bûye binema û çavkaniya cîhana serdest û eqlê civakî, çavkaniya xwe ji olê girtiye. Li hember serdestiya wê tekane hêza desthilatdar cîhaneke dîtir heye, ku çavkaniya bîrkirina wan berevajî cîhana serdest e. Ew rewt û cîhanbîniya nû bi piştgirêdana bi marîfeyeke diyarkirî ji aliyê wêneya rewşenîbran ve birêve diçe. Yan memleketa wan kesan e ku ji cura jiyana serdest bêzar in û xewn bi cîhaneke dîtir ve dibînin. Işq babeta sereke ya romanê ye. Cîhana yekem di wêneya kesên mirindost û duyem di wêneya kesên jiyandost û aşiq de hatiye wênekirin.

Aşiqên rewşenbîr bi piştgirêdana bi siyasetmedarekî rewşenbîr ku xewn bi dirustkirin û dîtina penageha aşiqan dibînin, cîhaneke dîtir ji temamiyta aşiqên nîvcomayî û bêcih û war dirust dikin, bi wê wateya ku aşiqên rewşenbîr û kesên dîtir ên sade yên aşiq û bawerî hebû bi dinyaya eşqê hino hino lê dihêwirin û şên dikin û yek ji aşiqan dibe împeratorê wê komara eşqê û wê birêve dibe, lê dûre hino hino dikevin wehma eşqê û cîhan û xewna aşiqan têk diçe û cîhana desthilatdar a oldarî, bi ser cîhana aşiqên rewşenbîr serdest dibe û bi girtin û kuştin û şikestin û veguherîna bo sîber û windabûna aşiqan roman bidawî tê.

Di encamê de karakterên romana Êvara Perwaneyê bi awayekî giştî digihin windabûn û mirinê. Şikestina xewnê û mirina karakteran, wek qurbanîdan û bûn bi qurbanî kesên dîtir hatiye nîşandan, bi wê wateya ku eger mirin û noqbûna karakterên sereke di mirinê de xilseteke diyar a romanê be, êdî wek Şaho Seîd bawer dike ku „qurbanîdan aliyekî romanan e, ev jî berfirehiya jiyanê ber bi mirinê nîne, lê berfirehiya ciwanî û jiyaniyan e, berfirehiya qurbanîdan e, ku divê mirovên jiyandost bimirin, berevajî mirindostiyê ku divê mirov bimire, daku mirov jî bijîn, divê hilgirê tiştên mezin bin.“ [199] Li vê gorê di (Êvara Perwaneyê) de, karakterê rewşenbîr di wêneya hilgirê tiştên mezin û ruhê qurbanîder tê wênekirin û her demê jî rewşenbîr bi wî ruhê qurbanîder hatiye wênekişandin. Ew bîr û baweriyên ku derbarê jiyan û mirov û cîhanê li ba rewşenbîran hene, di wêneya komeke aşiqan de hatine nîşandan.

Belavbûna romana (Êvara Perwaneyê) bû cihê sernic û gotûbêja rewşenbîran û nûserên warê rewşenbîrî û edebiyatê. Bi rêya bûyer û serpêhatiyên di romanê de axaftin li ser rewşa paşketî ya civakî û jiyana siyasî, oldarî û civakî ya civaka kurdî hatiye kirin û gelek pirsyar derbarê meseleya guherîn û azadî û mafan û civaka sivîl û metirsiyên îslama radîkal wek kelemekê li pêşiya vîn û xwestek û xewnên rewşenbîrên serdemê hatiye tevdan. Bi awayekî giştî temamiya binkeftin û

[199]. Şaho Seîd, Romanek di Guftûgoyê de, A: Enwer Husên, Wezareta Rewşenbîrî, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r 151.

aşiqên nîvcomayî yên (Êvara Perwaneyê) têne vegerandin bo krîz û paşketina rewşa civakî û serdestiya dogmaya oldarî di civaka kurdî de. [200]

Romana Êvara Perwaneyê bi şikestina xewn û desthilata aşiqan li hember desthilata oldarî û civakî bidawî tê. Bi wê wateya ku piştî dirustkirina dinyaya eşq û eşqistanê ev cih û penageh eşkere dibe. Ji hemû aliyan ve kesên şûrbidest ên dijî eşqê û misilman diçin nav karwanê îmandaran û ber bi daristana aşiqan û tarûmarkirin û kuştina aşiqan xwe dibexşin. Li gor dîtin û şîrovekirina me şikestina dinyayê biqasî dinyayê bixwe û hundirê dinyayê û aşiqan bend e, ewqasî bi dinyaya derve û desthilata oldarî û siyasî ve ne bend e. Bi awayekî giştî romannûs dixwaze bêhtir tekeziyê li ser wan hokarên derveyîn bike û wêneya paşketina eqlê civakî û siyasî û oldarî ya wê dinyayê bike ku eşq tê de tê kuştin.

**Nasandineke kurt a jiyana edebî ya Bextiyar Elî:**

Romannûs û şaîr û rewşenbîrê Kurd Bextiyar Elî di sala 1960 de li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê jidayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li dibistana "Şêx Selam" li Silêmaniyê xilas kiriye û piştre xwendina navendî li "Navendiya Ezme"r û xwendina amadeyî li amadeyiya "Helkewt" a kuran xilas kiriye. Piştre li herdu zanîngehên „Silêmanî û Selahedînê“ dibe xwendekarê koleja zanist, beşa" zevînasiyê". Lê di xwepêşandanên sala 1983an de li Hewlêrê birîndar dibe û dev ji xwendinê berdide û xwe bi temamî ji karê nivîsandin û edebiyatê re vala dike. Di heman salê de "Qesîdey Nîştiman – Helbesta Welat" dinivîse, ku kevintirîn berhema wî ya çapkirî ye. Dûre di dîwana „Gunah û Kerneval“ de tê weşandin, ku sala 1992an hat belavkirin. Dîsa di vê salê de yekemîn kome şiîra xwe bi awayekî pir sade û bi tîrajeke kêm tê çapkirin. Di payîze 1989an de yekem gotara xwe bi du beşan bi navnîşana "Qisekirdin Le Perawêzî Bêdeng" de di rojnameya "Paşkoy Êraq"ê de belav dibe. Di rojên destpêka serhildanê de ligel komek nûserên din hejmara yekê ya „Kovara Azad“ derdixin, ku dûre pênc hejmar jê belav dibin.

Di navbera salên 1992-1994an de çend panel û seîmner li Silêmanî û Hewlêrê pêşkêş dike û îşên wî li tenişta îşên çend nûser û rewşenbîrên din wek destpêka derketina cure nerîneke cuda bo edebiyar û civakê tên temaşekirin. Piştî destpêkirina şerê navxwe li Başûrê Kurdistanê di îlona 1994an de, ji Kurdistanê bar kir û çû Sûriyê. Neh mehan li Şamê ma û berê xwe da Almanyayê û ji sala 1999an ve li bajarê „Frankfort“ê niştecî dibe.

Di wê demê de ligel çend hevrêyên din dibe yek ji damezrêbnerên „Kovara Rehend“, di sala 1997an de jî dest bi nivîsandina romana "Êvara Perwaneyê" dike û di 06.10.1997an de xilas dike. Piştre di salên notî de hevawayê "Rêbîn Herdî, Rêbwar Sîweylî, Merîwan Wirya Qani, Aras Fetah û Helkewt Ebdula" grûpa

[200]. Bextiyar Elî, Tewerê Bextiyar Elî, Kovara Raman, Dezgeha Rewşenbîrî û Ragihandina Gulan derdixe, Hewlêr, hejmara (51), 2000, r 28-29.

"Rehend"ê dadmezîrînin, piştre çend hejmaran ji kovara Rehend belêav dikin ku kovareke edebî û fikrî bû.

## Berhemên Bextiyar Elî

### Berhemên Şiîrê

(Gunah û Kerneval), (Bohîmî û Estêrekan), (Koy Berheme Şiîriyekan 1983-1998), (Îşkirdin Le Daristanekanî Fîrdews da), (Ta Matemî Gul...ta xwênî firîşte – Koy berheme şiîriyekanî 1983-2004), (Ey benderî dost...ey keştî dujmin 2007.)

### Roman

(Mergî Taqaney Dûwem), (Êwarey Perwane), (Duwahemîn Henarî Dunya), (Cemşîd xanî mamim ke hemîşe ba legel xoyda deybird), (Şarî mosîqare spiyekan), (Xezelnûs û baxekanî xeyal), (Koşkî Balinde Xemgînekan), (Keştî Firîştekan – Cildê yekem „hatiye belavkirin di 10.02.2012“), (Keştî Firîştekan – Cildê duyem „hatiye belavkirin di 07.07.2013“), (Hewrekanî Danyal 2015.)

### Berhemên Hizrî

(Welam le rojgarî winbûnê pirsyarda – 13 hevpeyvîn ligel Bextiyar Elî), (Îman û cengawerên wê), (Xwînerê Kuşinde – Gotar), (Le Diyarewe bo nadiyar), (Çêjî Mergdostî), (Wek balindey naw cengele tirsnakekan), (Sêwî sêhem), (Awirekey Orfeus 2014), (Ciwaniyekanî Narêkî), (Ersîsî Kujraw.)

## Encam

Di encama lêkolîn û behskirina taybetmendiyên binyata bûyerê di romanê de û praktîzekirina wan li ser romana „Êvara Perwaneyê“ em digihin wê encamê ku em bêjin:

1. Navnîşana romanê demeke derûnî nîşan dide û tevahiya binyata bûyerên vegotinê di xwe de kom kiriye.

2. Derbarê dema vegotina bûyeran, nûser bi şêweyeke hunerî û di asteke bilind de, zincîreya bûyeran têkşikandiye, lê ligel vê yekê jî nûser çend caran di dema têkşikandina zincîreya bûyeran de ketiye şaştiyên hunerî û tevlîhevî di navbera deman de qewimiye û bi ser de derbas bûye. Lewma nûser bi awayekî pir berfireh pişta xwe bi bikaranîna herdu teknîkên vegerandin û pêşketina bûyeran girêdaye. Ji bilî ku tevahiya teknîkên din ên dema vegerandinê bikar aniye.

3. Êvara Perwane romaneke pir vebêjer û pir dîtin û pir deng e jî, her dengek jî hebûna xwe ya serbixwe heye û wê ji dengên dîtir cuda dike.

4. Siruşta dengên (Êvara Perwaneyê) pêk tên ji (Dengê aştîxwaz, dengê çewtkarî, dengê redker, dengê poşmaniyê, dengê guherînxwazî.)

5. Cih û şûn di (Êvara Perwaneyê) de heta radeyekê cihên xeyalî ne û di rastiyê de nînin. Lê eger xwîner bixwe hewl bide ku wan cih û şûnan di rastiyê de bibîne, ev nabe karekî giran û zehmet.

6. Proseya vegotinê di (Êvara Perwaneyê) de ji aliyê çend karakterên vebêjer ên şahidhal ve tê cîbicîkirin. Ligel vebêjerek sereke ku temamiya vegotina bûyeran çîrokê li stûyê xwe girtiye, ku bi cînavê ( ez – min) ê axêver diaxive. Dengê hemû karakterên vebêjer di nav dengê vebêjerê sereke de kom bûne.

7. Di bikaranîna binyatên bûyerê de nûser jêhatîbûneke zêde nîşan daye û her çar curên binyata (Şêwnkewte, têhellkêş, hawseng, bazineyî) bi awayekî pir hunerî bikar aniye.

8. Mebest ji van rêçikan yarîkirin ango lîstin e bi proseya vegotina tekstê bêyî ku kar bike ser naveroka bûyeran. Lê tenê ciwankariyeke hunerî diyarî şêweya binyatê dike.

9. Ji bilî ku roman dikare ji ber wan hurdekariyên ku di vegotina çîrok û serpêhatiyên taybet û veşartî nîşan dide, wan derzên ku dîrokê li şûn xwe hîştine tije bike; herwiha dikare bibe çavkaniyeke bisûd bo têgihîştin û vekolandina hinek dab û nerît û taybetmendiyên takekesan û wek encam tevahiya civak û neteweyê.

10. Bi awayekî giştî mebest ji bikaranîna van binyatan, hemerengkirin û yarîkirin e bi proseya vegotina tekst û hunerkariyeke di şêwaza nîşandana bûyeran de, bêyî ku kar

bike ser biha û naveroka bûyeran. Lê dibe tenê ciwankariyeke hunerî diyarî forma tekstê dike.

11. Di beşekî zêde yê romanê de vebêjer hem rola karakter hem rola vebêjer dilîze, lê sînorê zanyariyên vebêjer hatiye diyarkirin.

12. Ew monologên ku di vê romanê de hatine bikaranîn, têkildarî hundir û nava karakteran e û helwesta wan li hember bûyeran zelal dikin, herwiha xem, dudilî, hez û armancên wan bi awayekî şiprzeyî nîşan didin, ku ev jî yek ji taybetmendiyên monologê ye.

## Çavkanî

### Pertuk


1. Aristotle, Hunera Şiîrê (Şiîrnasî), Wergerandina ji Ingilîzî û Pêşgotin: Ezîz Gerdî, Weşanxaneya Rênima, Çapxaneya Kemal, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004.
2. Amîne Yûsif, Teknîkên Vegotinê di Teorî û Pratîkê de, Weşanxaneya el Hîwar, Çapa Yekem, Sûriyê 1997.
3. Angram Bay Water, Kitêba Aristotle (Hunera Şiîrê), W: Îbrahîm Hemade, Çapxaneya Hela, Çapa Yekem, 1999.
4. A.A.Mendelaw, Dem û Roman, Wergerandina: Bekir Ebas, Serastkirina: Ihsan Ebas, Weşanxaneya Sadir, Beyrût, Çapa Yekem, 1997.
5. Audîn Mwîr, Binyata Romanê, W: Îbrahîm el Seyrefî, Dezgeha Misrî ya Çap û Belavkirinê.
6. Aram Sidîq, Estetîka Vegotinê, Raman li ser Çîrok û Romanên Kurdî û Cîhanî, Rêzê Pirtûkên Yaneya Qelemê, Weşanxaneya Yad, Çapa Yekem, Silêmanî, 2009.
7. Azad Berzencî, Çend Rawestgehên Wêjeyî û Fikirî (Bihayê şêwe-formalîstên rûs), Weşanxaneya Murkiyan, Hewlêr, Çapa Duyem, 2006.
8. Arî Osman Xeyat, Binyata Bûyerê di Romana (Paşa Kuştin) a (Xusrew Caf) û (Beriya Ku Başoke Bifirre) ya (Ebdilxaliq Rikabî), Lêkolîneke Danberhevkarî ye, Weşanxaneya Narîn, 2011.
9. Antonio Butrs, Edebiyat (Tarîfa wê, Janrên wê, Ekolên wê), Dezgeha Nûjen a Pirtûkê, Çapa Yekem, Libnan, 2005.
10. Antonio Butrs, Edebiyat (Tarîfa wê, Janrên wê, Ekolên wê), Dezgeha Nûjen a Pirtûkê, Çapa Yekem, Libnan, 2005.
11. Austin Warrin û Rene Welk, Teoriya Edebiyatê, W: Mihêdîn Subhî, Dezgeha Erebî ya Lêkolîn û Belavkirinê, Çapa Duyem, Beyrût, 1987.
12. Azad Heme, Rehenda Têraman û Cesteya Witara Roşinbîrî ya Hevçax, çapa 1, Swêd, 1995.
13. Bextiyar Secadî û Mihemed Mehmûdî, Ferhenga Şîrovekar a Têgehên Wêjeyî, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2004.
14. Bakiz B. Trawpik, Dîroka Edebiyata Cîhanî, W: Heme Kerîm Arif, Çapxaneya Rojhelat – Hewlêr, Çapa Yekem, 2008.
15. Besam Quts, Derbasgehek bo rêbazên rexneya hevçax, Weşanxana Wefa, çapa 1, Misr 2006.
16. Bextiyar Elî, Êvara Perwaneyê, (Roman), Çapxaneya Renc, Silêmanî, 2007.
17. Boris Ikhnbawum Derbarê Teoriya pexşanê, w: Îbrahîm el Xetîb, Dezgeha lêkolînên erebî, çapa 1, Beyrût, 1982.
18. Celal Enwer Seîd, Teknîka Vegotinê di Romana Êvara Perwaneyê ya Bextiyar Elî de, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapxaneya Kemal, 2009.

19. Cewad Mistefa, Roman çi ye? Çend Nivîskar, Serastkirina: Hejar Rehîmî, Dezgeha Lêkolîn û Belavkirinê ya Mukiryanî, Weşanxaneya Xanî, Dihok, Çapa Yekem, 2008.

20. Çend hevpeyvînên neweşandî ligel Romannivîs (Şêrzad Hesen), ev berhem hatiye amadekirin ji bo çap û belavkirinê ji aliyê Weşanxaneya (Renc) ve.

21. David Pellauer, Hebûn, Dem û Vegotin (Fîlosofiya Paul Ricœur), W: Seîd el Xanimî, Navenda Çanda Erebî, Beyrût, Casablanca, 1999.

22. Edward Blishen, Roman û Pîşeya Nivîsandina Romanê, Ji erebî: Ejî Goran, Dezgeha Rewşenbîrî û Belavkirina Kurdî, Bexda, 1982.

23. Ebdulla Rehman, Binyata Vegotinê, Çend lêkolînên edebî derbarê çîrok û romana helbestvanî, Çapxaneya Mukiryanî, Hewlêr, 2014.

24. Ebdula Serac, Ber bi Istana Romanê û Nerîngehan, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, 2007.

25. Ednan Xalid Ebdulah, El Neqd el Tetbîqî el Tehlîlî,Desteya Karûbarên Giştî, Çapa Yekem, Bexda, 1986.

26. Ebdula Îbrahîm, Binyata Hunerî ya Romana Şer a Erebî li Iraqê, Weşanxaneya Karûbarên Çandî, Çapa Yekem, 1987.

27. Elî Ebdilrezaq Mehmûd, Rexneya Edebî ya Nûjen, Bexda, (Navê weşanxaneyê li ser nîne.) 1991.

28. Ehmed Hemed el Neîmî, Rîtma demê di romana erebî ya hevçax de, Dezgeha Erebî ya Lêkolînan, Çapa Yekem, Oman, 2004.

29. Enwer Hisên, Romanek di Guftûgoyê de, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapa Yekem, Silêmanî, 2006.

30. Ebdilrehman Munîf, Ronahiyek li ser Romanê, W: Şîrîn. K, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2006.

31. Ehmed Ziyad Mehbek, Lêkolînên Rexneyî (Ji Dastanê heta Kurteçîrokê), Weşanxaneya Aladîn a Çap, Belavkirin û Wergerandinê, Çapa Yekem, Şam, 2001.

32. Ebdilmelîk Mertaz, Derbarê Teoriya Romanê (Xwendinek di Teknîkên Vegotinê de), Encûmena Niştimanî ya Çand, Huner û Edebiyatê, Çapa Yekem, Kuwêt, 1998.

33. Edward Blishen, Roman û Pîşeya Nivîsandina Romanê, Ji erebî: Ejî Goran, Dezgeha Rewşenbîrî û Belavkirina Kurdî, Bexda, 1982.

34. Fayiq Mistefa - Ebdilreda Elî, Derbarê rexneya edebî ya nûjen (rwangeh û tetbîq), Dar el Kutub bo çap û belavkirinê, çapa 2, Mûsil, 2000.

35. F.F.Kuzînuf, Roman Dastana Serdema Nû, Dezgeha Nû ya Kitêbê, Çapa Yekem, Libnan, 2006.

36. Fûad Reşîd, Hevpeyvîn, Kovara Raman, Hejmara (125) gera sêyem, Cotmeha 2007.

37. Ferhad Pîrbal, Rêbazên Edebî, Wergera ji Fransî: Ferhad Pîrbal, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2004.

38. Gerald Prince, Têgeha Vegotinê (Ferhenga Têrman), W: Abid Xeznedar, Desteya Giştî ya Karûbarên Çapxaneyan, Qahîre, Çapa Yekem, 2005.

39. GérardGenette, Derbasgehek bo Teksta Berfireh, W: Ebdilezîz Şibêl, Desteya Giştî ya Karûbarên Çapxaneyên Mîrî, Bexda, 1999.

40. G. Hernshow, Zanista Dîrokê, W: Ebdilhemîd el Ebadî, Weşanxaneya el Hedase, Çapa Duyem, Libnan – Beyrût, 1982.
41. Haskell Block – Herman Salinger, Dîtina Afirîner, W: Esed Helîm, Pirtûkxaneya Misrê, Misr 1966.
42. Hisên Arif, Çîroka Hunera Kurdî, Weşanxaneya el Huriye, Bexda, 1997.
43. Horace, Hunera Şiîrê, W: Hemîd Ezîz, Çapxaneya Zeman, Çapa Yekem, Bexda, 1979.
44. Henan Xalid Ebdula, El Neqid el Tetbîqî el Tehlîlî (Mûqedîme lîdîraset el Edeb we Enasirh fî Dewi el Menhec el Neqdiye), Dar el Şiûn el Seqafiye, Çapa Yekem, Bexda, 1986.
45. Hadî Mihemedî, Felsefe û Metod, Çend Nivîskar, W: Hadî Mihemedî, Weşanxaneya Şivan, Çapa Yekem, Silêmanî, 2007.
46. Hesen Behrawî, Binyata Forma Romanê (Feza, Zeman û Karakter), Navenda Çanda Erebî, Çapa Yekem, Beyrût, 1995.
47. Hikmet Sebax Xetîb Derbarê naskirina tekstê, lêkolînên rexneya edebî, Weşanxana Afaq Cedîde, çapa 2, Beyrût 1984.
48. Ian Watt, Derketina Romana Ingilîzî, W: Reûf Bêgerd, Weşanxaneya Serdem, Çapa Duyem, Silêmanî, 2009.
49. Îbrahîm Mehmûd Xelîl, Rexneya Wêjeyî ya Nûjen ji Çavlêkirinê heta Texlîdê, Weşanxaneya el Mesîre, Çapa Yekem, Libnan, 1993.
50. Îbrahîm Cendray, Fezayê romankî li ba Cebra Îbrahîm Cebra, Weşanxana Karûbarên çandî yê giştî, Bexda2001.
51. Kamil Hesen Besîr, Rexnesazî (pêrewkirina dîrokê), Çapxaneya Korrî Zanyarî Iraq, Çapa Duyem, Bexda, 1983.
52. Kemal Mezher Ehmed, Dîrok, Kurtebehseke zanistî ya dîrokî – Kurd û Dîrok, bi alîkariya emîndariya giştî ya lawan hatiye çapkirin, bêyî dîrok û cihê cape.
53. L.M,Abbeci. Vincent, Teoriya Cureyên Edebî, W: Dr. Hesnun, Dezgeha el Mearif – Iskenderiye – 1978.
54. Letîf Zeytûnî, Ferhenga Têgehên rexneya romanê (Erebî-ingilîzî-fransî), Weşanxana Nehar, Beyrût 2002.
55. M. H. Abrams û yên din, Roman çi ye, W: Cewad Mistefa, Weşanxaneya Mukiryanî, Hewlêr, 2008.
56. Mihemed Kerîm, Teoriya Romanê, Çend Nivîskar, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2002.
57. Mihemed Riyad, Tewzîfkirina Mîratê di Romana Erebî ya Hevçax de, Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Ereb, Çapa Yekem, Şam, 2002.
58. Mîcan el Rulî – Seid el Baziî, Delîl el Naqid el Edebî, Navenda Çanda Erebî, Çapa Yekem, Bexda, 2004.
59. Mihemed Mehwî û Nermîn Omer Ehmed, Modela Rêzimana Kurdî, Weşanxaneya Jîr, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004.
60. Necm Xalid Elwenî, Bînaya Demê di Sê Mînakên Romanên Kurdî de (Jana Gel, Şar û Raz) de, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2004.
61. Newzad Ehmed Eswed, Ferhenga Zaravayên Edebî û Rexneyî, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Çapa Yekem, 2011.
62. Paul Byron, Vegotin Sînorê Têgihîştinê, W: Ebdula Îbrahîm, Kultûra Biyanî, Çapa Yekem, Bexda, 1992.
63. Perîz Sabir, Bînaya Hunerî ya Çîroka Kurdî, Weşanxaneya Serdem, Silêmanî, 2000.

64. Plato, Komar, W: Soran Umer Heme û Mehdî Hesen Çomanî û Rêbwar Qaremanî, Çapxaneya Wezareta Perwerdeyê, Çapa Yekem, Hewlêr, 2006.
65. Plato, Ziyafet (Felsefeya Evînê), W: Wîlyam el Mîrî, Weşanxaneya Mearif li Misrê, Çapa Yekem, Qahîre, 1970.
66. R.M.Alberes, Dîroka Romana Nû, W: Coric Salim, Weşanên Behr Miteweset, Beyrût – Parîs, Çapa Duyem, 1982.
67. Rolan Bernof, Cîhana Romanê, W: Nîhad el Turkî, Çapa Duyem, Weşanxaneya Karûbarên Çandî ya Giştî, Iraq – Bexda, Çapa Yekem, 1991.
68. Reşad Ruşdî, Hunera Kurteçîrokê, Pirtûkxaneya Ango ya Misrî, Çapa Yekem, 1997.
69. Rêzan Osman Mistefa, Binyata Cureyên Bûyerê di Romana Kurdî ya Başûrê Kurdistanê de, Weşanxaneya Spîrêz, Çapa Yekem, Dihok, 2010.
70. Roland Barthes, Çêja Tekstê, W: Îsmaîl Zeraî, Weşanxaneya Menare, Çapa Yekem, Hewlêr, 2007.
71. Robert Humphry, Zêhişî di Romana nû dew: Mehmûd el Rebî, Weşanxana Mearifa Misrê, Qahîre 1975.
72. Siyamend Hadî, Dîroka Derketina Romanê, Bê dezgeha çapê, Weşanxaneya Tîşk, Silêmanî, 2004.
73. Semer Ruhî Feysel, Romana Erebî – Binyat û Rûya, Yekîtiya Nivîskarên Ereb, Çapa Yekem, Şam, 2003.
74. Selîm Reşîd Salih, Şêwaz di Kurteçîroka Kurdî de, Rêveberiya Giştî ya Çap û belavkirinê, Çapa Yekem, Silêmanî, 2005.
75. Selah Fezil, Teoriya binyatî di rexneya edebî de, Weşanxana Karûbarên Çandî ya Giştî, çapa 2, Bexda 1987.
76. S. Rafindran, Binyat û veçirîn (pêşveçûnên rexneya edebî), w: Xalide Hamid, Weşanxana Çandî ya Giştî, çapa 1, Bexda, 2002.
77. Şaho Seîd, Romanek di Guftûgoyê de, A: Enwer Husên, Wezareta Rewşenbîrî, Rêveberiya Çap û Belavkirina Silêmaniyê, Silêmanî, 2006.
78. Şukrya Resûl, Edebiyata Kurdî û Hunerên Edebiyatê, Çapxaneya Wezareta Xwendina Bilind, Çapa Yekem, Hewlêr, 1989.
79. Şukrî Ezîz el Madî, Derbarê Teoriya Edebiyatê, Weşanxaneya el Hedase, Libnan, Beyrût, 1985.
80. Todorof, Neqd el Neqd (Riwayet Teelim), W: Samî Swêdan, Weşanxaneya Karûbarên Çandî ya Giştî, Çapa Duyem, Bexda, 1986.
81. Tenya Esied Mihemed Salih, Binyata Cih di Du Nimûneyên Romanên Kurdî de, Weşanxaneya Serdem, Çapa Yekem, Silêmanî, 2011.
82. Wail Berekat, Têgehên di binyata tekstê de, Weşanxana Maehd, çapa 1, Şam, 1996.
83. Yasîn Nesîr, girîngiya cih di teksta Wêjeyî de, weşanxaneya Karûbarên çandî yên Giştî, çapa yekem, Bexda, 1986.
84. Zekeriya Îbrahîm, kêşeya bunyatê yan ravekirina bunyadgeriyê, weşanxaneya Misr,
85. Zahir Rojbeyanî, çîroka hunerî ya Kurdî, (Şêwe û Şêwaz û Bunyad), çapxaneya Xanî, çapa Duyem, Dihok, 2008.

**Namey ekadîmî**

1. Adil Mecîd Germiyanî, Realîzm di romana Kurdî ya hevçax de li Iraqê, nameya masterê, zanîngeha Bexdayê, 1996.

2. Ebdilqadir Heme Emîn, binyata karnameyî di teksta nû ya kurdî de, Têza doktorayê, zanîngeha Silêmanî, koleja ziman, 2007.

3. Fadya Merwan Ehmed el Wense, Vegotin li Cem Jahiz (El Bûxelaa Weke Mînak), Têza Doktorayê, Koleja Edebiyatê – Zanîngeha Mûsilê, 2004.

4. Mîran Celal Mihemed, Binyata Bûyerê di Romana Kurdî de, Nameya Masterê, Koleja Ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Weşanxaneya Renc, Silêmanî, 2009.

5. Mihemed Emîn Ebdila, Şakes di Romana Kurdî de, Nameya Masterê, Koleja Edebiyatê – Zanîngeha Selahedînê, 2000.

6. Mihemed Emîn Ebdula, Hebûn di Helbestên Mehwî de, Nameya Doktorayê, Koleja Ziman – Kurdî, Zanîngeha Koye, 2008.

7. Senger Qadir Mihemed Hacî, Binyata Vegotinê di Dastana (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî û romana (Şarî Mosîqare Spiyekan - Bajarê Muzîkvanên Spî) ya Bextiyar Elî de, Nameya Masterê, Koleja Selahedîn, Hewlêr 2009.

8. Sirûr Ebdilrehman Ebdila, Binyata Kesayetiyan di Romanên Xesan Kenefanî de, Nameya Masterê, Koleja Edebiyatê, Zanîngeha Selahedînê, 1994.

9. Şûca Muslim Dexîm el Anî, Binyata Hunerî ya Romana Erebî li Iraqê, Têza Doktora, Koleja Edebiyatê – Zanîngeha Bexdayê, 1987.

**Kovar**

1. Adil Germiyanî, Çend Cudahiyên Navbera Romanê û Janrên din ên Edebiyatê de, Kovara Newşefeq, Hejmar (62), Mijdara 2008.

2. Bextiyar Elî, Tewerê Bextiyar Elî, Kovara Raman, Dezgeha Rewşenbîrî û Ragihandina Gulan derdixe, Hewlêr, hejmara (51), 2000.

3. Ebdula Serac, Tewera Romanê, Kovara Karwanê, hejmar (108), 1997. Hêjayî gotinê ye ku Ebdula Serac bîr û baweriyên çend kesan derbarê romanê wergirtiye û yek ji beşdaran Dr. Şukrya Resûl e.

4. Elî Lefte Seîd, Binemayên Pêkhateyên Romanê di navbera Nûgerî û Çavlêkirinê de, w : Mihemed Kesas, Kovara Raman, xula duyem, Hejmar (99), Tebaxa 2005.

5. Eta Qeredaxî, Rola Jibîrçûna Nediyar – Hevawakirina Dîrokkirina Rabirdûya Kurd, Kovara (Karwan), Hejmar (121).

6. Hevpeyvînek bi Bextiyar Elî re, Kovara Raman, www.ramn-media.net

7. Herêm Osman, Teknîk di Sê Çîrokên Aram Kakey Felah de, Kovara Henar, j (44), 2009.

8. Hisên Arif, Çîroka Hunera Kurdî, Dezgeha Rewşenbîrî û Belavkirina Kurdî, Bexda, 1997. Ji (Mihemed Ehmed Hesen, Bînaya bûyerê di çîrokê de, Kovara Raman, hejmara 115, Xula Sêyem, Kanûna Yekem a 2006, Rêveberiya Rewşenbîrî ya Raman.

9. Husên Sabir Elî, Bînaya Bûyerê di Romana Muzîka Merga Nawext a Selah Celal Ebdula de, Kovara Raman, Hejmara 125, 05.10.2007.

10. Mihemed Ehmed Hesen, Bînaya Bûyerê di Çîrokê de, Kovara Raman, hejmara (115), 05.12.2006.
11. Milan Kundera, Galte û Romana Nivîsandî li jêr hêla pehniyê ya 35 de, W: Awat Ehmed, Kovara Gelawêja Nû, j (26), 2001.
12. Nîhad Camî, Daristan di (Êvara Perwaneyê) de, Beşê Duyem, Kovara Raman, Hewlêr, Hejmar (52), Dezgeha Rewşenbîrî û Ragihandina Gulan, 2000.
13. Şukir Silêman Hemed, Qehreman di Romana Niha ya Kurdî de, Kovara Karwan, hejmar (172), Nisana 2003.
14. Şêrko Bêkes, Çend peyvek derbarê çîroka kurdî, Kovara Ayînde, hejmar (49), 2003.
15. Twana Emîn, Menfa û Xwendin, Çend Gotûbêjên Wêjeyî, Weşanên Paşkoya Rexeney Çawdêr, Silêmanî, hejmar (15), 2008.

**Malper**

1. http://en.wikipedia.org/wiki/Flashforward3/2/2016

2. Ehmed Talib, Sematîzm ji teoriya çavlêkirinê heta teoria formalîstî, (mamosteyê edebiyata nûjen û hevçax e, koleja edebiyatê, zanîngeha Tilmesan), www.ahmed-talib.com.
3. Letîf Zeytûnî, Ferhenga Têrmên Rexneya Romanê, http://lzeitouni.lau.edu.lb/PDF/23.pdf
4. Http://www.britannica.com/EBchecked/topic/478607/prolepsis
5. Cemal Mehmûd Hecer, Derbarê Romana Dîrokî û Vegotina Dîrokê, 20.01.2016, www.forum.egypt.com
6. Ebdula el Xetîb, Derbasgeha Romana Dîrokî, www.odabasham.net.
7. Eşref Selîm, Romana Dîrokî, Mahiyet û Pêwnedî, www.formus.moheet.com
8. Mihemed Ezam, Helbestvaniya Gotara Vegotinbend, Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Ereb, Şam, 2005.www.awu-dam.org
9. Hesan Reşad el Şamî, Jin di Romana Filistînê 1965-1985 de, Yekîtiya Nivîskarên Ereb li Şamê, 1998, http://www.awu-dam.org/book/98/study98/169-r-s/book98-sd014.htm
10.Sadiq el Selmî, Yekîtî di Romana Yemenî de "Binyata Romanê bo Bûyera Dîrokî." www.anaween.net.
11. Bunyadgerî, Amadekirina sîmpozyoma cîhanî yan ciwanên musilman, r. 1, www.saaid.net